



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ



DERGİSİ

ISSN: 2147-5679



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

Yıl/Year: 2022 Cilt/Volume: 8 Sayı/Issue:15

ISSN: 2147-5679

Sahibi / Owner

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Adına
Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA

Editör / Editor

Dr. Öğr. Üyesi Zafer AÇAR

Editör Kurulu / Editorial Board

Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY
Dr. Öğr. Üyesi Muhammed Bilal TOLAN
Dr. Öğr. Üyesi Ayetullah KARABEYESER
Dr. Ömer DELİKAYA
Arş. Gör. Adnan AYDINTÜRK

Dergi Sekreteryası ve İletişim/

Secretary of Journal and Communication:

Enstitü Sekreteri Sadrettin BEKİ

Dergi Yazışma Adresi / Correspondence Address

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğü, 12100-Bingöl

Telefon: 0426 216 00 42

Faks: 0426 216 00 42

Enstitü e-posta: yasayandillerenst@bingol.edu.tr

Dergi e-posta: bingolyasayandiller@gmail.com

Dergi Tasarım ve Uygulama / Magazine Design

Mahmut ERZİNCAN

Zafer AÇAR

Yayın Kurulu ve Danışma Kurulu

Editorial Board and Advisory Board

- Prof. Dr. Abdulaziz HATİP, Marmara Üniversitesi
Prof. Dr. Abdullah KIRAN, Muş Alparslan Üniversitesi
Prof. Dr. Abdullah ÖNALAN, Siirt Üniversitesi
Prof. Dr. Celilê Celil, Instut für Kurdologie, Awisturya
Prof. Dr. Edip ÇAĞMAR, Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ, Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet BARCA, Ankara Sosyal Bilimler Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet BİLEN, Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet Mahfuz SÖYLEMEZ, İstanbul Üniversitesi
Prof. Dr. Metin YİĞİT, Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. Mustafa AGAH, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Mychael CHYET, Washington Library, USA
Prof. Dr. Nesim DORU, Mardin Artuklu Üniversitesi
Prof. Dr. Nusrettin BOLELLİ, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Orhan BAŞARAN, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Salih AKIN, Rouen University, France
Prof. Dr. Seyid Ahmed PARSA, Kurdistan University, İran
Prof. Dr. Yadgar Rasool, Selaheddin University, Iraq
Doç. Dr. Abdulcebbar KAVAK, Karabük Üniversitesi
Doç. Dr. Abdurrahim ALKIŞ, Dicle Üniversitesi
Doç. Dr. Abdülhadi TİMURTAŞ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Doç. Dr. Ahmet KAYINTU, Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Ayhan TEK, Muş Alparslan Üniversitesi
Doç. Dr. Canser KARDAŞ, Muş Alparslan Üniversitesi
Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY, Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Ercan ÇAĞLAYAN, Muş Alparslan Üniversitesi
Doç. Dr. Hayrettin KIZIL, Dicle Üniversitesi
Doç. Dr. İbrahim USTA, Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN, Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Mehmet YAZICI, Bingöl Üniversitesi
Doç. Dr. Mustafa GÜNERİGÖK, Sakarya Üniversitesi
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK, Mardin Artuklu Üniversitesi
Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ, Dicle Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Asoss M. Qader, Lehrstuhl für Altorientalistik, Universität Würzburg, Almanya
Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD, Bingöl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Mustafa ASLAN, Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Yusuf AYDOĞDU, Bingöl Üniversitesi

- Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi yılda 2 kez yayımlanan, ulusal hakemli bilimsel bir dergidir.
- Yayımlanan yazıların her türlü hukukî ve bilimsel sorumluluğu yazarlarına aittir.
- Derginin her hakkı saklıdır. Dergide yayımlanan yazılar kaynak gösterilmeksizin kullanılamaz.

Bu Sayının Hakemleri / Reviewers of the This Issue

Prof. Dr. Salih Akın, Rouen Üniversitesi
Doç. Dr. Abdulcebbar Kavak, Karabük Üniversitesi
Doç. Dr. İlyas Akman, Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Mustafa Aslan, Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Yusuf Aydoğdu , Bingöl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Şeymus Orkin, Muş Alparslan Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi İlyas Suvağcı, Hakkari Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Şirin Filiz, Mardin Artuklu Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi İbrahim Dağılma, Bingöl Üniversitesi
Dr. Öğr. Üyesi Ömer Faruk Elaltuntaş, Bingöl Üniversitesi
Nurettin Ertekin, Hakkari Üniversitesi
Cafer Açar, MEB

İÇİNDEKİLER

EDİTÖRDEN.....5

ESTETİK Ü ÇAVKANIYA WÊ DI NÊRÎNA HUNERÎ YA MELAYÊ CIZÎRÎ DE7-21
Nevzat EMİNOĞLU - Hemin Omar AHMAD

KİTABO VERİN Ê HİKÂYEYANÊ ZAZAKÎ CER HARD COR ASMEN SER YO
ETUD..... 22-39
İbrahim DAĞILMA – Elif AVCI

MEKÂN DI ROMANÊN KURDÎ YÊN SOVYETÊ DE: MÎNAKÊN *FINCANA FERFÛRÎ* Ü
XATÊ XANIM.....40-53
Bahar ENÇ

ÇOLIG DI KULTURÊ ZEWAC U VEYVEYÎ54-72
Abdülkerim BOR

نامه‌ی ۱۲۳ نفر از درویشان و منسوبان شیخ علی خالص طالبانی در شهرسندج به دولت عثمانی
.....73-78
Hemin Omar AHMAD

Değerli okurlar!

14 sayıyı geride bırakan Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi 15. sayısında biri Farsça olmak üzere ikisi Kurmanci ikisi de Zazaca olan beş değerli çalışmayı yayınlamış bulunmaktadır.

Dergimizin birinci yazısı, Nevzat Eminoğlu'ya ait olan *Estetik û Çavkaniya Wê di Nêrîna Hunerî ya Melayê Cizîrî de* adlı yazısıdır. Yazar Mela'nın lirik şiirinde ihtişam, duyarlılık, özgüven, güzellik ve dikkat gibi ruh unsurlarını öne çıkarmakta ve güzellik ile güzelliğin kaynağını onun şiiri ışığında incelemeyi amaçlamaktadır.

İkinci yazı, İbrahim Dağılma ve Elif Avcı'nın kaleme aldıkları *Kitabo Verin Ê Hikâyeyanê Zazaki Cer Hard Cor Asmen Ser Yo Etud* adlı çalışmalarıdır. Araştırmacılar modern Zaza edebiyatında önemli bir yer tutan hikâye kitaplarından Zazaca olarak yazılan ilk hikâye kitabı Kemal Astore'nin *Cer Hard Cor Asmen* adlı kitabını metin inceleme yöntemiyle ele almışlardır.

Bahar Enç'in *Mekan di Romanên Kurdî yên Sovyetê de: Mînakên Fincana Ferfûrî û Xatê Xanim* adlı dergimizin üçüncü çalışması Kafkas Kürt Edebiyatından Elîyê Evdilrehman'ın *Xatê Xanim* ile Ezîzê Gerdenzerî'nin *Fincana Ferfûrî* romanlarında mekan unsurunu karşılaştırmalı olarak incelemiştir.

Abdülkerim Bor, *Çolig dî Kulturê Zewac u Veyveyi* adlı çalışmasıyla Zazaların evlilik ve düğün adetlerini ele almış, Bingöl özelinde evlilik ve düğün kültürü tanıtmış, evlilik zamanı, âşık olma, söz alma, kız kaçırma, kız isteme, başlık parası, nişan, çeyiz, kına gecesi, nikâh kıyma ve düğün gecesi gibi konular hakkında bilgiler vermiştir.

Dergimizin son makalesi de Hemin Omar Ahmad'ın *Senendenc Şehrinden Osmanlıya Şeyh Ali Halis Talabani'nin 123 Derviş ve Mensubunun Mektubu* adlı belge incelemesidir. 1911 yılına dayanan bu Osmanlı arşiv belgesi, Kerkük'lü Şeyh Abdulrahman Talabani'nin ailesi tarafından yönetilen Sine'deki (Senendec) şehrin müftüsü ve Şeyh Ali Halis dahil olmak üzere derviş ve mensuplarının imzasını taşıyan mektubu incelemektedir.

Konu ve dil-diyalekt çeşitliliğini artırmayı planladığımız bir sonraki yazıda görüşmek temennisiyle...



ESTETİK Ü ÇAVKANIYA WÊ DI NÊRÎNA HUNERÎ YA MELAYÊ CİZİRÎ DE*

Nevzat EMİNOĞLU**
Hemin OMAR AHMAD ***

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi/Research Article
Makale Geliş Tarihi/Received: 24.05.2022
Kabul Tarihi/Accepted/: 21.06.2022
Atf: Eminoglu N., Omar Ahmad H. (2022).
“Estetik ü Çavkaniya Wê di Nêrîna Hunerî ya Melayê Cizîrî de”,
Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 15, 7-21.
DOI: 10.56491/buydd.1120922

Kurte

Estetik di dirêjahiya sedsalên serdema edebiyata klasîk de, yek ji wan mijarên bingehîn e ku edîb û şair li ser rawestiyane, li dor vê babetê nêrîn û hestên xwe anîne ziman. Ev têgeh bedewbûn û xweşikahiyê îfade dike û ji bedewbûna terkîbên maddeyê bigre heta xweşikahiya raser yanî Wacîbul Wucûd diçe û beşeke kiriyara dîtîne ya însan e. Ciwanî ji hêla piraniya şairên serdema navîn ve li ser hêmanên hevpar û bi heman şeweyî hatiye teswîrkirin. Digel vê yekê ew ciwaniya ku bi uslûbeke standart ve dihate ziman, bi rêya vegotinên alegorîk, girîft û pir-mane ya her şairekî, rewş û rehendeke mukemel û xweser wergirtiye. Şairan diyardeya ciwaniyê bi xeyalên pir dewlemend ve sêwirandine, di form û kirasên ciyawaz de ji nû ve saz kirine û bi temsîl, teşbîh û gotinên klîşe yê curbecur ên ciwannasiyê ve anîne ziman. Ciwanî di vehonandina hunerî û estetîkî ya Melayê Cizîrî de jî cihekî taybet û girîng digre. Di şîra wî ya lîrik û coşîş de hêmanên ruh ên wek îhtîşam, hessasiyet, xwebawerî, ciwanî û baldarî derdikevin pêş. Di vê xebatê de armanca me ew e ku em ciwanî û çavkaniya ciwaniyê ya li gorî Melayê Cizîrî di ronahiya helbestên wî de lêbikolin û binirxînin.

Peyvên Sereke: Edebiyat, edebiyata klasîk, helbest, estetik, Melayê Cizîrî

* Ev gotar ji teza xwendevan ya *Estetik di Helbestên Melayê Cizîrî de* hatiye hilberandin.

** Xwendevanê Doktorayê yê Zanîngeha Bingölê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, n.eminoglu@alparslan.edu.tr,
orcid: 0000-0002-4980-7556

*** Dr. Öğr. Üyesi, Zanîngeha Bingölê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, heminahmad40@gmail.com,
orcid: 0000-0003-1985-9512

Melayê Cizîrî'nin Sanatsal Anlayışında Estetik ve Kaynağı

Özet

Estetik, klasik edebiyatta yüzyıllar boyunca edebiyat ve şairlerin bu konudaki görüş ve duygularını dile getirdikleri temel konulardan biri olmuştur. Bu kavram, güzel ve güzelliği ifade eder. Maddenin bileşiminin güzelliğinden yüce güzellik olarak nitelendirilen Wacib'ül-Vücûd'a kadar geniş bir anlam içerir ve insanın görsel eyleminin bir parçasıdır. Güzellik, çoğu ortaçağ şairi tarafından ortak unsurlar üzerinde ve aynı şekilde tasvir edilmiştir. Bunun yanı sıra standart bir üslupla dile getirilen güzellik, her şairin alegorik, karmaşık ve çoğulcu anlatıları aracılığıyla mükemmel bir boyut kazanmıştır. Şairler, güzelliğin anlatımını çok zengin fikirlerle yeniden tanımlamışlar, onu çeşitli biçim ve kılıklarda yeniden kurgulamışlar ve güzelliği farklı teşbih, temsil, kıssa ve klişe sözleriyle dile getirmişlerdir. Klasik dönem Kürt edebiyatının önde gelen temsilcilerinden olan Melayê Cizîrî'nin lirik ve coşkun şiirinde de estetik başlıca tema olarak yer almaktadır. Onun şiirinde öne çıkan özellik, ihtişam, duyarlılık, özgüven, güzellik ve dikkat gibi ruh unsurlarıdır. Bu çalışmamızda amacımız Melayê Cizîrî'ye göre güzel ve güzelliğin kaynağını onun şiirleri ışığında incelemek ve değerlendirmektir.

Anahtar Kelimeler: Edebiyat, klasik edebiyat, şiir, estetik, Melayê Cizîrî

Aesthetics and Its Source in Melayê Cizîrî's Artistic Understanding

Absract

Aesthetics has been one of the main subjects in classical literature for centuries in which literature and poets have expressed their views and feelings on this subject. This concept denotes beauty and beauty. It has a wide meaning from the beauty of the composition of matter to the sublime beauty or Wajib al-Wujud and is part of the visual act of man. Beauty was portrayed by most medieval poets on common elements and in the same way. In addition, the beauty expressed in a standard style has gained a perfect dimension through the allegorical, complex and pluralistic narratives of each poet. Poets have redefined the expression of beauty with very rich ideas, reconstructed it in various forms and disguises, and expressed beauty with different similes, representations, parables and cliches. The esthetic also occupies a special and important place in the artistic and aesthetic expression of the Melayê Cizîrî. He is the spirit elements such as magnificence, sensitivity, self-confidence, beauty and attention that appear prominently in his lyrical and exuberant poetry. Our aim in this study is to examine and evaluate the beauty and the source of beauty according to Melayê Cizîrî in the light of her poems.

Keywords: Literature, classical literature, poetry, aesthetics, Melayê Cizîrî

1. Destpêk

Estetîk wek problemeke felsefî, cara pêşîn di serdema Yûnana antîk de li ser hatiye qisekirin û bûye mijara nîrxandinan. Di serdema Yûnana antîk de îlaheyeke bi navê Afrodît heye ku temsîla ciwaniyê dike. Lêbelê di serê wê serdema tarîxî de û di dewrana ewil a felsefeya Yûnan de ciwanî wek qadeke serbixwe û xas, nehatiye dîtin û lêkolînkirin. Zanyar û filosofên wek Eflatûn, Arîsto û Plotinos li ser vê babetê rawestiyane û mijara estetîkê nîrxandine. Ev

tehlîl û lêkolîn, wek destpêk û bingeha qada estetîkê, bûne xwedî bandoreke berdewam (Dedeler, 2012: 5).

Têgeha estetîkê di zimanê Grekî de ji peyva “aisthesis” hatiye dariştin ku di maneya hestpêkirin, hisîn, bihîstin û hestiyariyê de ye. Ev têgeh di hizr û nêrîna Yunaniyên berê de estetîk û tesewira ciwaniyê tîne ziman. Ev peyv, wek bingeha têgeha estetîk û sêwirîna ciwaniyê ketiye lîteratûrê. Zanyarên Yûnana antîk ev têgeh di maneya epîstemolojîk de bi kar anîne. Li gor wan ew zanîna ku meriv bi aqilê xwe digihêjê û ya ku meriv bi hestên xwe bi dest dixê, ji hev cuda ne. Ji ber vê qasê di nêrîna van filozofan de têgeha “estetîk” ew zanîn e ku bi rêya hestên meriv pêk hatiye. Lewma “estetîk” di vê hêlê de xwedî maneyeke epîstemolojîk e jî (Taşdelen, 2012: 3).

Têgeha “ciwan” digel têgehên “baş” û “rast”ê, yek ji babet û pirsgerêkên bingehîn ê felsefeyê ye. Digel vê yekê bêyî ku kirdeyê ku wê têbigihê, meriv nikare nêzîkî vê pirsgerêkê bibe. Kirde yanî sêje, hiş e. Di vir de zerûrî ye ku hiş yanî bîrewerî, digel problema pêkanîna xwe û lixwegerîna xwe ya wek nesne yanî obje, bête nixandî. Estetîk her çiqas di maneya xwe ya felsefîk de bi gelemperî wek doktrîn yan jî zanista ciwannasiyê hatibe pênasîkirin jî, bi bandora kevneşopîya romantîk û îdealîzma Alman, wek “felsefeya hunerê” hatiye fêmkirin. Di felsefeya piştî Hegel de jî têgehên estetîk û felsefeya hunerê bi piranî di dewsa hev de hatine bikaranîn (Cevizci, 2014: 37).

Ciwanî ew e ku daneyên hestên meriv ên wek dîtin, pelandinê, ji ber şêkil, şemal, pîvan, nîzam, aheng, mukemelî, tenasub, yekawatî û zelaliyê, heyranî, ecibandî û kêfxweşiyê his dîke. Bi gotineke din ew ecibandî û heza însan e ku bi balkêşîya deng, reng û ahenga di tiştêkî de tê hestpêkirin. Derdikeve holê ku ciwanî nixdaraziyeke takekesî ye, pêvajoyeke peyitîna şexsî ye. Ciwanî şewq û şemaleke di tiştan/objeyan de ku di hiş de întibah çêdike, hiş hişyar dîke. (Afşar, 2004: 244). Wihareng di serdema modern a Rojavayê de Baumgarten û şopînerên wî ev qada mijara ciwan û ciwaniyê bi navê estetîkê veguherandine zanistekê. Di vê qada zanistê de problema ciwaniyê di bin têgeheke taybet de hatiye lêkolînkirin. Her wiha wek dsîplîneke îlmî derketiye holê û li ser têgehên tîkildarî bi hest û hestiyariyan hûr dibe. Hasil, estetîk êdî wek navê zanista ciwaniyê ketiye nav lîteratûra zanistî.

Tê zanîn ku çavkanî û jêdera estetîkê heta bi serdema antîkîteyê dirêj dibe. Piştî wexta her cure pêşketin û nîqaşên bi eleqedarê vê qadê li erdnîgariya Ewrûpayê hatin xuyanê. Lewma ev yek bû sebeb ku her wekî ev têgeh tenê xasê bi Ewrûpayê ye. Hal ew hal e di serî de di medeniyeta Îslamê de û di medeniyetên qedîm ên wek Hînd, Misir, Mezopotamya de jî fêhmdariyêke estetîk heye. Her wiha di vê dawiyê de di vê hêlê de gelek xebat hatine kirin û hê jî berdewam in. Di dîroka me ya rojhilatê de xasma sedema Îslamî de ku wek dewrana edebiyata

klasîk tê binavkirin, estetîk babeteke girîng a îlmê kelimê û hikmetê ye. Mijareke sereke ya tesewwuf û îrfanê ye. Her wiha qadeke esasî ya şîr û edebiyatê ye jî. Estetîk di zimanên me yê rojhilatî de bi terkîbên wek “îlmê bedayî, îlmê hîs û îlmê husn, îlmê cemal, îlmê cemaşînasî” dihatê îfadekirin. Lewma estetîk jî hêla mijarê ve di medeniyeta me de xwedî raboriyêke qedîm e (Koç, 2018: 45).

Şairên serdema klasîk diyardeya ciwanîyê bi xeyalên pir dewlemend ve sêwirandine, di form û kirasên ciyawaz de jî nû ve saz kirine û bi temsîl, teşbîh û gotinên klîşe yê curbecur ên ciwannasîyê ve anîne ziman. Fêhm û feraseta helbesta klasîk bi teşegirtin û terakuma sedan salan pêk hatiye û di nav hevaheng û hevrengeyê berdeyam de ye.

Ev qada zanistî di dîroka fikrîyata Kurdî de li gorî hizir û tesewwura klasîk jî hêla zanyar û mutesewwufên Kurd ve him bi nêrîna hikemî him jî bi nezera îrfanî di berhemên wan de hatiye behskirin. Her wiha di zimanê Kurdî de jî di nêrîn û perspektîfa klasîk de jî hêla şair û edebiyatnasên Kurd ve bi rêya helbest û dîwanan mewzûbehs bûye (Izady, 2005: 312). Di serdema modern de jî cara ewil bi perspektîfa modern bi Kurdiya Soranî ketiye nav dîroka edebiyat û fikrîyata Kurdî û di lîteratûrê de cih girtiye. Estetîk di xebatên bi Kurdiya Soranî de wek “Ciwani”, “Ciwannas”, “Êstatîka” hatiye îfadekirin. Her wiha navê zanista estetîk di zimanê Erebi de wek “îlmê cemal”, di Osmaniyan de wek “bediyat”, di Fransî de wek “esthétique”, di Almanî de wek “aesthetik”, di Îngilîzî de wek “aesthetics”, di Farisî de wek “cemaşînasî/zîbaşînasî”, di Tirkî de jî wek “estetik/güzellik bilimi” derbas dibe.

Di vê xebatê de armanca me ew e ku em ciwanî û çavkaniya ciwanîyê ya li gorî Mela di ronahiya helbestên wî de lêbikolin û binirxînin.

2. Nêrîneke Gelemperî li Fêmdariya Estetîk ya Şîra Klasîk

Yek jî mijarên sereke ku şairan her dem li ser terenum kirine, hest û nêrînên xwe anîne ziman, bêguman meseleya husn û cemalê ye, yanî ciwan û ciwanî ye. Ji serê serdema Îslamî bigire, heta hemû demajoya serdema navîn, ev babet bûye mewzûbehs di navbera şairên vê serdemê de û bala wan kêşaye.

Meriv dibîne ku şairan ciwanî bi xeyalên gelek rewnaq, rengîn û zengîn sêwirandine û saz kirine. Her wisa bi vegotinên klîşe, bi temsîl û teşbêhên balkêş anîne ziman. Digel vê uslûb û nêrîna hevpar, her şairekî bi vegotinên girîft, bi destnîşankirina têkiliyên balkêş a di navbera tiştan de, li ser ciwanîyê kûr û hûr bûne. Ciwanî di dev û dezgehê her şairekî de geraye tabloyêke nûwaze û xweser (Metin, 2016: 78).

Edebîyatnasên serdema klasîk, ne ku bi tevahî/kull, bilakis wek parî/cuz li ser ciwanîyê sekinîne û tesewir kirine. Ev jî dide nîşandan ku şairan ne ku husn û cemalê rojane, bilekis

husn û cemalê bi xwe, îdeaya ciwaniyê ji xwe re kirine mijar. Nêzîktayiya bi vî rengî ya şairan a bi bal ciwaniyê, yanî ne li ciwanan, bilakis lêhûrbûna şairan a li ciwaniyê û li cuz û pariyên ku bi awayekî mukemmel ciwaniyê rave dikin, ji ber nemumkunbûna teswîra rasterast a tiştê ku îlahî ye. Lewra bi fermana Hedîsa “Ew kesên ku dê rastî ezabê herî dijwar bîn, ehlê teswîrê ne” teswîr, wek îddiaya xulqiyetê, bi kufîrê re yek hatiye dîtin (Grabar, 2010: 76).

Nêrîna li ciwan û ciwaniyê ya serdema klasîk her çiqas bi gelemperî li ser hizra dînê Îslamê geş bûbe jî, ji nêrîn û nêzîktahiyên felsefî yên dêrîn/antîk û ceribîn û pratîkên mîstîzma sofigeriyê jî bêpar nîne. Ev paşxaneya dêrîn bi hêl, nêrîn û tesewirên xwe yên ontolojîk ên nêzî nêrînên Îslamî, tevlî muktesebata dînî ya serdemê bûne. Di helbesta klasîk de helbest ne tenê pesnê ciwaniyê û lava û dexaleta ji bo dildar û dîlbera xwedî husn e. Bilekis anîna ziman a hebûn û yekbûna Xweda ye. Keşfa heqîqeta wî ya veşartî ye ya di eşya de pînhan e. Lewma di vê helbestê de her çiqas tema û mijûlayî li ser ciwanî û evînê be jî, armanca esasî ya şair ew e ku ji heqîqeta ku hîkmeta îlahî rave dike, xeber bide û qasidiya wê bike.

Felsefeya klasîk a Îslamî, digel nas û esasên Îslamî û referansên xwe yên otantîk, nêrînên Arîstoteles û Platonîstên Nû ên nêzî tewhîdê jî wergirtiye. Îbnî Sîna di nav vê mîras û paşxaneya zanyarî de xwedî rol û bandoreke girîng e. Têgehên wî yên bingeşîn ên wek “Wacîb, Wacîbul Wucûd” û “îmkan” di helbestên Mela de jî cihekî girîng digrin. Muhyeddînê Îbnî Erebî ku bi leqeba Şêxê Ekber tête nasîn di rêza pêşîn a wan zanyar û mutesewwufan de tê ku di mijara estetîk û nêrîna ciwanî de bandoreke domdar li şair, sofî û arifên serdema klasîk a Îslamî kiriye. Fîkr û nêrîna wî ya estetîk li ser hizra “wehdeta wucûdê” ava bûye (Bozkurt, 2016: 47). Digel gelek hêlên ciwaniyê, xasma di hêlên wek çavkaniya ciwaniyê, cureyên îşq û ciwaniyê, sirra îqşê û hwd. de bandor li ser Cizîrî û şopînerên wî jî kiriye.

Şair û edebiyatnasên Kurd ên serdema klasîk jî digel hembûşeyên xwe yên ji milletên erdnîgariya Rojhilata navîn, ciwan û ciwanî bi heman nêrîn û nêzîkatiyê şîrove kirine. Ev nêrîn di zimanê wan ê Kurdî de û di berhemên wan ên bijarte de bi awayên herî rewnaq û herî xweser derdikeve pêşiya me. Lewma şairan di şî'rê xwe de ev nêrîna estetîk a bingeşîn a Îslamî ya serdema klasîk ji xwe re kirine esasekî sereke. Di berhemên şairên me yên wek Elî Herîrî, Şeyx Şemsedînê Exlatî, Xanî, Siwadî, Feqiyê Teyran û hwd. de babeteke sereke ye (Orkin, 2015: 56). Ji ber vê qasê ye ku Feqiyê Teyran di şî'ra xwe de dibêje:

Secdeya şukrê carek me ferz e di wîsalê

Ne perde bêstarek li ber wechê hîlalê

Ehsenellahû tebarek ji sirra vê cemalê (Teyran, 2021: 74).

Li gor fêmdariya estetîk a serdema klasîk a dînî, ciwaniya alemê ne bi xwe ye. Yanî ne nefîsî ye, bilakis derveyî ye. Lewma Muhyeddîn Îbnî Erebi ku mutesewufê ku nêrîna wî ya dînî-tesewufî bandor li gelek şair û zanyarên serdemê kiriye, dibêje:

“Xwedê Teala kâinat di sûretê xwe afrandiye. Ew (Xweda) bi xwe ciwan e, delal e. Lewma hemû kâinat jî ciwan e. Ciwaniya li kâinatê lutuf, rehmet, şefqet, îhsan, bereket, keremê îfade dike.” (Cemil, 2008: 89).

Di dab û nêrîta helbesta klasîk a Kurdî de heman awayê nêrîna estetîk di şîrên Ehmedê Xanî de jî tê xuyan. Xanî di serê mesnewiya xwe ya meşhûr a bi navê *Mem û Zînê* de di beşa *Tewhîdê* de nêrîna xwe ya ku li ser paşxaneya hevpar a fikra estetîk a serdema klasîk ava bûye tîne ziman. Wiha dibêje:

Ey metleê husnê îşqebazî

Mehbûbê heqîqî û mecazî (Cîhanî, 2000: 90).

Di nêrîna hunerî ya şairên wek Xanî û hemçaxên wî de metle, memba û çavkaniya husn û cemalê her Xweda ye. Her wisa jî ew husn îşqebaz e. Yanî ew ciwanî bêyî îşqê nabe û naxwuyê, îşqê dixwaze û îcab dike. Husn û cemal bi îşqê re hevdeng e, hevaheng e, hevalbend e. Her du lazim û melzûmên hev in û bêyî hev nabin.

3. Ciwan û Ciwanî di Nêrîna Hunerî ya Melayê Cizîrî de

Di vê beşê de em dê li ser poetîkaya helbesta Melayê Cizîrî ya di derbarê nêrîna wî ya estetîk de rawestin. Sekna wî û nêzîktayîya wî ya li hember ciwan û ciwaniyê binirxînin. Binaxeya ku Melayê Cizîrî huwiyeta şîra xwe li ser ava kiriye, xwe dispêre paşxaneya hizra dînî, edebî û tesewufî ya hevpar a serdema klasîk. Mela jî wek şairekî Kurd ê vê serdemê ku ji vê çavkaniyê behremend bûye, ciwan û ciwaniyê di tesewira vê muktesebatê de dinirxîne û di helbestên xwe de terenum dike. Lê li gor hêza xwe ya îfadeyê û qabiliyeta ziman û kariheya xwe bi form û awayekî xweser dirêse. Di vir de tişt a giring a ku divê em ji bîr nekin ew e ku helwesta şair ya li hember ciwan û ciwaniyê ye. Di vê tradîsyonê de şair yan jî hunermend ne afirînerê ciwaniyê ye, keşşafê wê ye, raveker e (Ayvazoğlu, 2016: 79).

Mela gava ciwaniya ku bi têgehên husn û cemalê îfade dike, pênase dike, digihêje terîfeke ji terîfên herî kûr a hizra sofîgeriyê û husn û cemalê wek sifetek ji sifetê Xwedê Teala diwesifîne. Li gor wî husn sifetek e ku di zatê Xwedê Teala de bi muşahedeya bi awayekî îlmî tête dîtin. Lewra Xwedê Teala xwestiye ku cemala xwe bi muşahedeyeke eynî bibîne. Lewma alem wek eynik afirandiye û cemala xwe temaşe kiriye. Noqteya hereketa Cizîrî li ser vê fikra sofîgeriyê peyda bûye. Ew têkiliya rastiya husnê ya bi celal, lezet û seadetê re, li ser vê xalê vedihûne (Cemil, 2008: 157). Lewma Mela dibêje:

*Di istiwayê ku ji husna te veda lamiekê
 Nezere şemse mine şerqî îla xerbî delek
 Afitabê ku ne teswîr ji husan te bitin
 Nûrha fî nezerî zulmetû dac û helek (Cezirî, 2012: 98).*

Kifş e Melayê Cizîrî ciwaniyê ne ku di huwiyeteke erzî û maddî de bilakis wek teceliyeke îlahî dibîne ku husn û cemala li alemê jî wek şewq û şemaleke biçûk a ji wê pertewê diwesifîne. Lewma dibêje ku çirûskeke wê husna îlahî roj û ronahiya alemê digêrîne tarîti û şevreşiyê. Yanî roj û ronahiya alemê li hember wê cemala sermedî wek çirûsk û tarîtiyekê ye.

Li gor Mela ciwaniya ku li alemê hatiye parvekirin û li ser wan ciwanên alemê ku hûr û perî û îns û wildan in û bûne tîmsala husnê, hemû cîlweya wê cemala mutleq in. Lewma dibêje:

*Ew latê husn û eynê nûr suret bi suret tèn zuhûr
 Îns û perî wildan û hûr cî cî di wan da cîlwe da (Cezirî, 2012: 132).*

Di nêrîna Mela de ji ber ku hemû hebûn, mukewenat û mewcûdat ji Xweda ne, eserê senetê wî ne, teceliya îsmê wî ne, ciwanî bi tena serê xwe hebûn û qîmeteke wê tune. Lewma Mela wek ehlê hikmet û tesewufê yên beriya xwe ciwaniyê wek diyarde û mefhûmeke ser bixwe nabîne û wek zuhura sifet û esmayê îlahî û nîşane û îcaba kemala Îlahî dinirxîne. Lewma dibêje:

*Her heyet û her cîsmekî her ferd û new û qîsmekî
 Ruh wî di destê îsmekî mayî di qebze û pençe da (Cezirî, 2012: 102).*

Di tesewira ontolojîk a Mela de ciwanî û îşqa ciwaniyê ku wek lazimê ciwaniyê dibîne, wek sifetekî ezeli yê îlahî di destpêka her tiştî de ye. Lewma dibêje.

*Husn û mehebet her hebû Heq aşiqê zatê xwe bû
 Muhtacê husnek dî nebû neql û rîwayet pê we da (Cezirî, 2012: 67).*

Li gor poetîkaya Mela armanca şair ew e ku li husna di alemê de temaşe bike û ji wê sûretê derbas bibe û li husna heqîqî û mutleq bigere, keşf bike. Sebebê lêbarkirina mane û wezîfeyêke bi vî rengî ya li ciwaniyê ev e ku ciwanî ne xwedî wesfekî objektîf e, ne zatî ye, yanî bi serê xwe tu hebûneke wê tune. Husna di alemê de tê xuyan bi tena serê xwe tiştêkî îfade nake, yan jî dîtin û teswîra wê, meriv nagihîne husnê. Şair bes dikare bi îşareta husna vê alema zahir xwe bighîne çavkaniya husna heqîqî. Li gor Mela însan ger bixwaze bigihîje heqîqetê, divê ew ji husna mecazî dest pê bike:

Ev hûr û perîçehre bût û latê cemalê

Der sûretê tehqîqî Mela eynê mecaz in

Lamia husn û cemala dê ji îlmê bête eyn

Eşqi da jê hilbitin kî dî heqîqet bêmecaz

Salik kî ye hatî ji mecazê bi heqîqet

Sûretnesûnasî û bi mena ne fena girt (Cezirî, 2012: 142).

Li gor Mela ji hêla dîtbariyê ve hemû ciwaniyên li alemê mecazî ne. Lê di heqîqetê de her ciwanî cemala îlahî bi xwe ye. Yanî ev alema ku bi hemû ciwaniya xwe li ber çavan e, neynika cemala Mutleq e. Cizîrî di vê mijarê de metoda Muhyedînê Îbnî Erebi şopandiye. Lewra Îbnî Erebi dibêje ku:

“Xeynî alemê ciyekî dinê ku Xwedê Teala lê tecellî kiriye tune. Yê ku alem li ser sûretê xwe, yanî di sûretê xwe de aniye wucûdê, Ew e. Hemû ciwaniya alemê ji zatê Eqdes e û ciwaniya alemê ciwaniya Xwedê Teala bi xwe ye. Di encamê de yê ku ev alem xuliqandiye, di sûretê xwe de xuliqandiye.” (Doru, 2015: 99)

Di beyteke xwe da Mela di meqamê fexriye û îftixarê de bi awayê telmîheke ser girtî îşaret dîke ku ew bi xwe şopînerê sadiq û pispor ê Îbnî Erebi ye. Melûm e ku Erebi di alema Îslamê de û her wiha di nav ehlê tesewufê de wek “Şêxê Ekber” yanî “Pîrê herî Mezin” tê binavkirin. Di fikra Mela ya estetîk de û her wiha di nêrîna gelek edîb û sofî û hukemayên di Alema Îslamê de bandora Erebi tê xuyanê. Mela di vê beyta xwe de bi qenaeta me îşaretî bi vî leqebê wî yê bi terkîba “Şêx” dîke û dibêje ku:

Di işqê Şêxê Sanî me bi dil behra meanî me

Lî zî hîcrîn we zî qelbîn şifaûn fî îşaratî (Cezirî, 2012: 95).

Di vê beyta xwe de Mela bi awayekî eyan û eşkere nabêje ku qesta min bi îşareta “Şêxê ewel” Îbnî Erebi ye. Lê gelo wisa ye? Lewra li gor hin şarih û şîrovekerên dîwana Mela ew kesê ku Mela wek “Şêxê Ewel” di meqamê ustadê xwe de îşaret kiriye, ne Îbnî Erebi ye, li gor wan ew kes Şêxê Senan e. Li gor hin ji wan lêkolîneran jî ew kes Îbnî Sîna ye. Belê Îbnî Sîna di alema Îslamê de ji wan hukeman e ku cara ewil li ser ciwaniyê û her wiha li ser işqê fikr û nêrînen xwe aniye ziman. Lê wek “Şêx” yan “Şêxê eşqê” nayê zanîn.

Her wiha Şêxê Senan wek qehremanekî di *Mantiq’u’ t Teyr* a Ferîduddîn Ettar de derbas dibe û wesfêkî wî yê wek “Şêxê Ewel, Şêxê Mezin” tune. Lewma bi qenaeta me qesta Mela ne Îbnî Sîna ye û ne jî Şêxê Senan e. Li gor me qesta wî Îbnî Erebi’ye ku leqeba wî “Şêxê Ekber” e. Lewra Erebi di tesewufa Îslamî de û di warê “işqê” de wek “Şêxê Ekber” wek “pîrê işqê” tê zanîn. Her wiha mesleg û meşrebê Mela yê işqê pir dişibihe yê Erebi. Ji xwe di vê hêlê de Mela

şopînerêkî Îbnî Erebi yê serkeftî ye. Xwendin û nirxandina fikr û nêrîna Mela, bêyî liberçavgirtina Erebi, zaf ne pêkan e (Doru, 2015: 212).

Melayê Cizîrî di helbestên xwe yê tenesewufî de ku tê de bi giranî şopa felsefeyê ajotiye, bangî wehdeta mutleq dike û dixwaze wê heqîqetê bi awayekî şênber rave bike. Ciwan û ciwaniya ku dixê mijar û mijûlayiya berhemên xwe jî wek eynik û wesîle, wek amûr û lebateke wê meqsedê ye di destê wî de. Ev ciwanî hezkî bila ciwaniya şexsî be hezkî ciwaniya mekanî yan jî ya tabî be ferq nake. Lewra dibêje:

Muhbeta mehbûb û latan pur vekir zîver sifatan

Daye qelb û ruh û zatan roj li miratê xuya ye (Cezîrî, 2012: 78).

4. Çavkaniya Ciwaniyê Li Gor Melayê Cizîrî

Pênasekirin û nîşandana ciwaniya li alemê her çiqas hêsan be jî, destnîşankirin û fêmkirina heqîqeta ciwaniyê, yanî tesbîta çavkaniya ciwaniyê ewqas ne hêsan e. Çawa ku îdraqa bi awayekî objektîf a ciwaniyê ya ji teref her kesî ve zehmet e. Lewra ciwanî li gor nêrîn û heştêkirina her kesekî diguhere. Lewma ji serdema Antîk vir ve filozofan çawa li ser terîfa ciwaniyê ketine îxtilafê, her wisa di derbarê çavkanî û esl û esasê ciwaniyê de jî li hev nekirine.

Qasî ku em ji jêderên dîroka zanistê hîn dibin fikra çavkaniya ciwaniyê cara ewil di felsefeya Yûnan de hatiye nîqaşkirin. Xasma filozof û zanyarên Yûnan ê navdar Eflatûn bi awayekî berfireh li ser vê mijarê hûr bûye. Wî ciwanî veqetandîye du qîsman. Yek, ciwaniya ku wek wesfekî li ser mexlûqat tê temaşekirin. Ya din jî ya heqîqî û eslî ye. Ew tiştê ku ji serdema antîk vir ve di derheq çavkaniya ciwaniyê de dihate nîqaşkirin ew bû ku gelo ciwanî ji maddeyê bi xwe ye yan jî dervayê maddeyê ye. Nîqaşên estetîk li gor nêrîna filozofan ya ontolojîk û metafîzîk bûne du qîsim. Yek, estetîka alemê dispêre maddeyê. Wek wesfekî zatî dibîne di maddeyê de. Ya din ciwaniyê wek îdeyeyeke xarîcî, teceliyeyeke dervayî û şewq û şemaldaneke li ser objeyê dibîne (Bozkurt, 2016: 95).

Eflatûn ciwaniyê wek îdea ji derveyî alemê dibîne û estetîka vê alemê jî wek sih û ekseke zeîf a wê îdeaya estetîkê dinirxîne. Plotinius wek şagirt û peyrewê Eflatûn ekola ideaya estetîkê berdewam kiriye û teoriya sudûrê derpêş kiriye. Li gor wî estetîka alemê ya di eşya de estetîkeke xarîcî ya ji îdeayê ye ku kelijiyê û daye der. Yanî herwekî ji ser re avêtiye, rijiyaye. Ev estetîka li dunyayê ya li eşya, ev dayîna wê ya der û kelçûna wê estetîka îdeayî ye. Lê heçî Arîsto ye, ew çavkaniya estetîkê madde bi xwe, yanî ji zatê maddeyê dibîne. Li gor wî ciwaniya eşya ji wesfên eşya bixwe ye. Îcab nake ku meriv li alema xarîcî çavkaniya estetîkê bigere. Çi heye li ber çavan e û tiştê li ber çavan jî çavkanî ye (Bozkurt, 2016: 156).

Di dîroka zanista felsefeyê de ev her du nêrînên cuda wek du ekolên dijber bandor li nêrînên serdema klasîk û modern ên di derbarê çavkaniya estetîkê kirine.

Melayê Cizîrî nêrîna Arîsto ya ku ciwaniyê bi maddeye re zatî dibine red dike û ciwaniyê wek şewq û şemaldaneke ji cemaleke mutleq dibine. Lewma dibêje:

Me ji bil husn û cemalê çi xered

Bê cemalê ji pîyalê çi xered

Ne cemala te tecelli bikirit

Me bi xoban bi cemalê çi xered

Di şebê Qedrê tecella tu bikî

Me li pê mûm û şemalê çi xered (Cezerî, 2012: 328)

Li gor Mela eleqedariya wî ya bi xûban yanî ciwanên di alemê ku bûne mezher û mîr'ata cemala baqî, ji ber wê cemala sermedî ye. Lewra ew e çavkaniya husn û cemala van xûb û xwoşevîstên li dunyayê. Mijûlayiya wî ya bi van ciwanên dunyewî û bikaranîna wan wek mijar û mazmûnên edebî ya di helbestê de, hemû li se navê wê cemala serçeşm e. Ger ne, mijûluya bi husn û cemala li dunyayê, qal û behskirina rind, bedew û ciwanên dunyewî beyxûde û beredayî ye.

Mela wek pêşiyên xwe yên ji hûkema û ûdebayên serdema navîn ên alema Îslamê serçeşme û menbea husn û cemalê ne ji eşya û mexlûq, bîleks wek wesfekî ji xaliq û senetkarê alemê dibîne. Ew husna di dîlberan de ku dibe sebebê îşq û evînê, ew estetîka alemê ku şair û temaşevanan bi hewes û heyran dide gotin û dike bengîn, hemû ji wî Xaliqî ye. Lewma di vê derheqê de dibêje:

Rohniya çehvên Mela yî Xaliq e husna te dayî

Hub tenê da min gedayî husn û hub yek çeşme ye (Cezerî, 2015: 134).

Di nêrîna estetîk a Cizîrî de ciwanî ya ku cemala mutleq e hê di beriya afirandina kaînatê de hebû. Neynika ku ji mexlûqatê alemê pêk tê, hê tunebû, ew gencîneya cemalê veşartî bû. Yanî wek kenza mexfî hebû. Zatê îlahî ji cemala xwe hez kir. Zat xwest ku ji bo zatê xwe temaşeya cemala zatê xwe bike. Nêrîna li ciwaniyê ya Mela ya di vê babetê de hevahengê fikr û nêrîna hin filozof û sûfiyên Musulman e (Cemil, 2008: 162). Lewma Mela dibêje ku:

Ellah sehergeha ezel yelmûmê îşqê şu'le da

Nura cemala lemyezel zatê tecellaya xwe da

Zatê tecella bû li zat bê ism û asar û sîfat

Sirra hurûfên aliyat xef bû di sitr û perde da

Zatê muqeddes bû wucûd coşîş nedabû behra cûd

Wesf û îzafat û quyûd yek jî tecellayê neda (Cezerî, 2012: 26)

Melayê Cizîrî husn û ciwaniya li alemê û li rû erdê, xasma ya jîndaran ên wek gul, sunbul, çemen, dar, sî û qazan ku ji wê cemala mutleq a îlahî teisîne û şewq û şemal dane. Her yek ji wan wek nîgar, dilber, delalekê bo sêyr û temaşeya wê cemala sermedî, wê husna ezel û wê rindiya rewnaq ji her derê derketine û reviyane hatine pêşberî ciwaniya îlahî (Turan, 2010: 198).

Her zîheyat û jîndarek ji cemala neqşa îlahî kêfxweş û şad dibe û direqise, ji kemala seneta wî mest û sergerdan dibe, sewt û seda dide. Ew ji jêr û jor wek tellalan derdikevin û diqîrin. Her wekî ku şêrîniya wî dengî, wan jî tîne coş û xuroşê û dilgeş dike, dinazîne. Lewma ev dar û nebat, ev giha û kulîlk hatine reqs û semayê, ketine cezbeyê. Bi tesîra vê rehmeta îlahî ye ku her jîndar dersa tesbîh û nimêja xasê bi xwe digre (Nursi, 2010: 273). Mela vî deng û ahenga han a li dinê, vî reng û rewneqdariya alemê ku wek orkestrayeke îlahî kaînatê dilezîne, dibezîne û dilerizîne, awiha tîne ziman:

Sunbul bi sema tîn û gulan perde dirandin

Bişkiftine al al û hişî bûne terazin

Cobar di rewan in çemenan terhî ciwan in

Mestane bi ref ref li kinaran sî û qaz in

Her yek bi temaşagehê husna te ji her ca

Teşbihê nîgaran bi cemala te dinazin (Cezerî, 2012: 374).

Dîsa Mela di heman babetê de ferd bi ferd mînakên cemalê rêz dike û ew nimûneyên ciwaniyê ku li rû zemîn û her yek ji wan di kesayetî û çarçoveya neynika xweşikayiya xwe de temsîla wê roja ciwaniya sermedî dikin û bi ciwaniyê re dibin yek. Mela seyr û temaşeya wan ciwanan wek şahî û dixweşiya dil dibîne, bo kemala ruh jî wek pêpelûk û derence dike wesîleya wusûlê. Her wisa dibêje ku gelo ez dilê xwe bidim kîjanê ji van yarên ku dilan bendeyî xwe dikin û direvînin, rihan vedijînin û aşiqan mest û sergerdan dikin.

Şair wihareng bi rêya ciwankarî/hunerê edebiyê ku jê re tê gotin tecahulê arîf, heyreta xwe û heyranmayîna xwe ya li hemberî ciwanan tîne ziman û rêya keşfa ciwaniyê ku li gor şair maden û medarê teskîna ruh e, rave dike (Cizîrî, 2018: 339). Balkêş e ku Mela van ferdên ku wek nimûneyên sîfatê cemalê ne, ew bi xwe, bizzat wek “ciwananên çimen” binav dike û dibêje:

Wer dilo da çîn temaşeya ciwananên çimen

Wê hilanî ser bi naz û sayeban dayê niyaz

Zulf û simbil muşkî boy û bisk û sosin sirşirîn

*Serwî bala sebzî poş û kil nişan û xunçebaz
 Nêrfgizên qamet zimerred sergiran hatin xiram
 Çari etrafan bi ref ref lê bi meş tîn sî û qaz
 Dil bi kê dim ez ji wan her yek bi xencan dil dibin
 Dilrûbayên canfedayên dilberên aşiqgudaz
 Eqdê îhramê dema dilber xuyabî ferze eyn
 Secdeyek ber wan du birhan nagirit cih sed nimaz (Cezerî, 2012: 304).*

Li gor Mela, Xweda bi înayet û cemala di zatê xwe de mewcûdekî kamilê mutleq e. Yanî çavkaniya cemalê ew e. Cemala wî ji zatê wî sudur kiriye û ji ser ra avêtiye, daye der û tecelliyê alema mewcûd kiriye. Husn û ciwaniya vê alema afirandî ji wir tê. Hemû mexlûqatên di alema mewcûd de di hukmê neynikên cemala wî de ne.

Mela ser re avêtin û kelçûna cemala îlahî, bi gihîştina mîqtara nîsabê ya malê zekatê simbolîze dike. Li hemberî cemala ku gihîştîya mîqtara nîsabê, ew zekata ku sûfî teleb dike, wusleta bi zatê îlahî ye. Yanî di nêrîna Mela de zekat, daketin û tenezula zatê îlahî ye ya li alema şehadetê (Doru, 2012: 79). Bi gotineke din, muxatabiyeta aşiq û evîndarên cemala îlahî ya li cemala îlahî ya li rû dunyayê ye. Lewra qest û mebesta aşiqê sadiq her ew cemal e. Têrbûn û tetmîna wî her bi wê ye. Ev beyta ku yek nimûneyeke ji wuqûfiyet û pisporiya kûr a Mela ya di çanda tesewuf û şîrê de, vê rewşê şîrove dike û tîne ziman.

*Ji wisala xwe zekatê bide miskin û feqîran
 Ku cemala te ye kamil di kemala xwe nîsabê (Cezerî, 2012: 426).*

Encam

Mijara estetîkê û babeta ciwaniyê qadeke şîr û edebiyata klasîk e. Di heman demê de jî navê dîsîplîneke felsefî ye ku lêkolîna têgeha ciwaniyê dike û wek “estetîk” tîte binavkirin. Ciwanî jî têgehek e ku bedewbûn, delalî û xweşikahiyê îfade dike. Mefhûma ciwaniyê ji xweşikayî û sipehîtiya terkîbên maddeyê heta bi cindîtî û ciwaniya raser ku Wacîbul Wucûd e, diçe. Her wisa jî beş û babeteke kiriyara dîtin û hestpêkirinê ya însan e. Ciwan û ciwanî ji hêla exleb şair û edebiyatnasên serdema navîn ve li ser unsûrên hevpar û bi nêrîn û şeweyên muşterek ve hatiye nirxandin. Di berhemên wan de hatiye honandin, sêwirandin. Hizra ciwaniyê ku bi uslûbeke yekawa ve dihate îfadekirin, bi saya vegotinên cihêreng û bi zimanekî simbolîk, mecazî û mutesabîh ya her edebiyatnasekî ve rêgeh û rehendeke rewnaq wergirtiye.

Edîb û şairên serdema Îslamî ku wek serdema klasîk tê binavkirin, mefhûma ciwaniyê bi xeyalên rengîn ve anîne ziman. Her wisa ciwan û ciwaniyê di form û kirasên cihêreng de nûvejandine. Wihareng bi temsîl, teşbîh û prototîpên klîşe yê ciyawaz ên ciwannasiyê ve îfade kirine. Bêguman ev fêhm û feraseta helbesta klasîk di encama teşegirtin û terakuma bi dem û dewranên dûr û dirêj de derketiye holê. Ev tesewura estetîk di nav hevaheng û hevrengeyê berdewam de destedewr bûye, ji dewranên qedîm neqlî qern û serdemên paş xwe bûye.

Hizra ciwaniyê û nêrîna estetîk di şairên serdema klasîk de wek babeteke sereke hatiye bikaranîn. Ciwan û ciwanî, yanî husn û cemal, di vehonandina hunerî û estetîkî ya Melayê Cizîrî de jî xwedî cihekî taybet e. Mela di dawiya sedsala XVIan û serê sedsala VIIan de jiyaye û di helbesta xwe ya lîrik de îşq û evîna cemaleke mutleq û ciwaniyeke raser terennum dike. Di şîrên wî yê coşîş de hêmanên ruh ên wek îhtîşam, hessasiyet, xwebawerî, ciwanî û baldarî derdikevin pêş. Her helbesteke wî bi şekl û naveroka xwe tabloyeke estetîkê rave dike û ciwaniyeke bêqusûr nîşan dide.

Bingeha şî'ra Melayê Cizîrî hizra dînî, edebî û tesewîfî ya hevpar a serdema klasîk e. Cizîrî şairekî Kurd ê vê serdemê ye û ji vê çavkaniyê behremend buye. Lewma husn û cemalê, ango ciwan û ciwaniyê di tesewîra vê muktesebatê de dinirxîne û di helbestên xwe de terennum dike. Li gor nêrîna xwe ya estetîk bi form û awayên xweser dirêse û li gor qabiliyeta ziman ji îmkanên ziman ên ciwankariyê îstifade dike. Ciwaniyê û çavkaniya wê, bi termînolojiyê xas û mezmûmên mexsûs ve dihûne. Di vir de tiştê diyarker ku nêrîna şair destnîşan dike, helwesta şair ya li hember ciwan û ciwaniyê ye. Divê neyê jibîrkin ku di vê dab û nêrîtê de şair ne afirînerê ciwaniyê ye, keşşaf e, raveker e. Çavkanî û membaya ciwaniyê nîşan dide.

Cizîrî gava ciwan û ciwaniyê bi têgehên husn û cemalê îfade dike, pênase dike, digihêje terîfeke ji terîfên herî kûr a hizra sofîgeriyê. Lêbelê wê ciwaniyê û çavkaniya wê bi îmajên nûwaze û bi prototîpên balkêş ve disêwirîne. Wihareng husn û cemalê wek sifetek ji sifetê Xwedê Teala destnîşan dike. Di nêrîna wî de husn sifetek e ku di zatê Xwedê Teala de bi muşahedeya bi awayekî îlmî tête dîtin. Yanî bi çavê aqil û çeşme dil tête temaşekirin. Ne bi çavên serî. Ew husn û cemala mutleq jî destpêk û dendika wucûdê ye. Xwedê Teala jî xwestiye ku cemala xwe bi muşahedeyeke eynî bibîne. Yanî ciwanî û cemala xwe di neynîkekê de temaşe bike.

Cizîrî her wekî pêşiyên xwe yê ji hûkema û ûdebayên serdema navîn ên alema Îslamê, serçeşme û menbea husn û cemalê, ne ji eşya û mexlûq, bîleks ji xaliq û senetkarê alemê dibîne. Ew ciwanî û husna di dilberan de ku dibe sebebê îşq û evînê, ew estetîka alemê ku şair û

temaşevaran bi hewes û heyran dide gotin û dike bengîn, hemû ji wî Xaliqî ne, ji wî Saniê Mutleq in û ji wê cemala sermedî ne.

Çavkanî

1. Alkış, Abdurrahim (2014). *Melayê Cizîrî'nin Dîvânında Tasavvufî Mazmunlar*, Nûbihar, İstanbul.
2. Alkış, Abdurrahim (2012). “Di Dîwana Melayê Cizîrî de Mertebeyên Wucûdê”, *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Uluslararası Sempozyumu* (Ed. M. Nesim Doru), Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul. rr. 349-366.
3. Ayvazoğlu, B. (1999), *Aşk Estetiği*, (5. Baskı), Ötüken Yayınları, İstanbul.
4. Bozkurt, Kenan,(2016). *Fuzûlî'de Güzellik Tasavvuru*, İnönü Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı, Esk Türt Edebiyatı, Malatya.
5. Cemil, Muhammed, Halid, (2008). *El- Cezerî Şair'ul Hubbû We' Cemal (Melayê Cizîrî Sevgi ve Güzelliğın Şairi)*, çev. Ümit Demirhan, Hivda, İstanbul.
6. Cengiz, Metin, (2016). *Şiir Dili*, Şiirten Yayınları, İstanbul.
7. Cevizci, Ahmet, (1999). *Paradigma Felsefe Sözlüğü*, (7. Baskı), Paradigma Yayınları, İstanbul.
8. Cîhanî, Perwîz (2013), *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol.
9. Cezirî, Molla Ahmed-i, (2012). *Diwan*, latînîze. Selman Dilovan wer. bi Tirkî: Osman Tunç, T.C. Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara.
10. Cizîrî, Dîwan (nuxweya destnivîs), mustensix: Muhammed Teyar Paşayê Amêdiyê.
11. Dedeler, Sinan, (2012). “Grek Estetiği ve Sanat Felsefesinde Önemli Kavramlar”, *Farabi e-Dergi*, Yıl: 2, Şubat, r. 5.
12. Doru, M. Nesim, (2012). *Melayê Cizîrî Felsefi ve Tasavvufî Görüşleri*, Nûbihar, İstanbul.
13. Doru, M. Nesim, (2016). *Melayê Cizîrî Hakikat ve Mecaz Arasında Bir Sûfî'nin Portresi*, Nûbihar, İstanbul.
14. Erebi, Muhyeddînê, İbnî, (...). *El-Hubbu Wel Muhabbet-ul İlahiyye*.
15. Grabar Oleg, (2010). *İslam Sanatının Oluşumu* (Wer.: Nuran Yavuz), (2. Baskı), Kanat Kitap, İstanbul.
16. Turan, Koç, Turan, (2018). *İslam Estetiği*, İsam Yayınları, İstanbul.

17. Nursî, Bediüzzaman Said-i, (2010). *Sözler*, Weşanên Zehra, Stenbol.
18. Orkin, Şeyhmus, (2015). *Di Berhemên Feqiyê Teyran de Hêmanên Tesewifî*, Zanîngeha Mûş Alaparslanê, Enstîtuya Zanistên Cîvakî, Şaxa Makezanista Çand û Zimanê Kurdî, Teza Mastirê, Muş.
19. Taşdelen, Demet, (2012). *Estetik ve Sanat Felsefesi* (Ed. Ahmet İnam), (1. Baskı), Eskişehir Üniversitesi AÖF Yayınları, Eskişehir.
20. Teyran, Feqiyê, (2021). *Dîwan*, Wergêr: Ali Karadeniz, Weşanên Nûbihar, Stenbol.
21. Timuçin, A. (2009), *Sorularla Estetik El Kitabı*, (1. Baskı), Bulut Yayınları, İstanbul.
22. Turan, Abdalbaki, (2010). *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*, Nûbihar, İstanbul.



KİTABO VERİN Ê HİKÂYEYANÊ ZAZAKİ CER HARD COR ASMEN SER YO
ETUD

İbrahim Dağılma*
Elif Avcı**

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi/Research Article

Makale Geliş Tarihi/Received: 07.06.2022

Kabul Tarihi/Accepted/: 24.06.2022

Atf: Dağılma, İ., Avcı, E. (2022),

Kitabo Verin Ê Hikâyeyanê Zazaki Cer Hard Cor Asmen Ser Yo Etud”,
Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 15, 22-39.

DOI: 10.56491/buydd.1127333

KILMVATE

Hikâye, miyanê tewıranê modernan dı hesıbiyena u bı yo uslubo edebi kılmi ra vatışê ê hediseyan ki biyi ya zi beni yena daşmasnayış. Ino tewır, dewıranê klasikan ra dewamê tewıranê destan, menqıba, kısa, riwayet u meseleyan hesıbiyeno. İni tewırı behsê hediseyanê kılman keni u mo tewır eyro bı nameyê hikâye yeno zanayış. Edebiyatanê modernan dı nuştışê mocnakanê verinan dı hikâye, tewırêko tesirdar o. Edebiyato modern ê Zazaki dı mocnaki verini eğleb şeklê hikâye dı ameyi nuştış. Edebiyatê Zazaki seba zordariya siyasiyan u sebebanê cematkiyan misalanê xu yê verinan tarixêko erez dı dano. Edebiyatê Zazaki dı hikayeya verin serra 1963 dı rocnamêyê Roja Newe dı bı nameyê *Macera î Silêmonî Gince* neşır biya. Ino edebiyat serra 1979 ra pê eşkera beno u serranê verinan dı runayışê mo edebiyat dı keda şexısan ê diaspora muhim a. İni serran dı biyayış, zanayış, eraversiyayış u veciyayışê vitrin ê edebiyatê modern ê Zazaki dı pêseroki rolêka muhim geni. İna çarçewa dı zey Tirej, Çıra, Hevi, Kormışkan, Ayre, Piya, Vate, Şewçıla u Vir çend pêseroki xu dani ver. Edebiyato modern ê Zazaki serranê 1980'yan ra heta eyro zereyê çoras serr dı zey *şiiir, hikâye, roman, tiyatro, cerıbnayış, virameyiş, biyografi* u cıgêrayışi tewıranê modernan dı 200 ra zêd eseri nusiyayi. Miyanê ini eseran dı kitabê hikâyeyi cayêko muhim depışeni. Kitabê *Cer Hard Cor Asmen* edebiyato modern ê Zazaki dı kitabo verin ê hikâye yo. İna xebat dı mo eser ra bı metodê tedkikkerdişê metini behs beno.

Kelimeyi Mıfteyi: Zazaki, Edebiyato modern, Hikâye, Etudkerdiş

* Dr.Öğr. Üyesi, Bingöl Üniversitesi, FEF, Doğu Dilleri ve Edebiyatları Bölümü, idadgilma@bingol.edu.tr,

orcid: 0000 0001 6521 119X

** Elif Avcı, Yükses Lisans Öğrencisi, Bingöl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Zaza Dili ve Edebiyatı,

eavci12345@gmail.com, orcid: 0000 0001 9141 2390

Zazaca İlk Hikâye Kitabı Cer Hard Cor Asmen Üzerine Bir İnceleme

Özet

Hikâye, modern türler içinde sayılır ve ‘olmuş veya olması mümkün olan olayları edebi bir üslupla kısa anlatmak’ olarak tanımlanır. Günümüzde hikâye olarak bilinen kısa olay anlatılı bu tür, klasik dönemlerde ‘destan, menkıbe, kıssa, rivayet, menkıbe ve mesele’ gibi isimlerle bilinen olay anlatılı türlerin devamıdır. Modern edebiyatlarda ilk örneklerin verilmesinde hikâye, etkili bir tür olmuştur. Modern Zaza edebiyatında da ilk örnekler çoğunlukla hikâye şeklinde kaleme alınmıştır. Zaza edebiyatı siyasi baskılar ve toplumsal nedenlere bağlı ilk örneklerini geç bir tarihte verir. Zaza edebiyatında ilk hikâye örneği 1963’te Roja Newe adlı gazetede yayımlanan *Macera î Silêmonî Gince* adlı hikâyedir. 1979’tan itibaren belirgin olmaya başlayan bu edebiyatta diasporadaki kişilerin gayreti önemlidir. Bu dönemde dergiler, modern Zaza edebiyatının oluşum, ilerleme, bilinme ve vitrine çıkmasında önemli bir rol üstlenir. Tirej, Çıra, Hevi, Kormışkan, Ayre, Piya, Vate, Şewçıla ve Vir gibi dergiler bu bağlamda akla gelen birkaç dergidir. Modern Zaza edebiyatında *şiir, hikâye, roman, tiyatro, deneme, anı, biyografi* ve *mizah* gibi modern türlerde 1980’den bu yana 40 yıl gibi kısa bir sürede 200’den fazla eser yazılmıştır. Bu eserler içinde hikâye kitapları önemli bir yer tutmaktadır. Zazaca olarak yazılan ilk hikâye kitabı Kemal Astore’nin *Cer Hard Cor Asmen* adlı kitabıdır. Bu çalışmada bu hikâye kitabı metin inceleme yöntemiyle ele alınacaktır.

Anahtar Sözcükler: Zazaca, Modern edebiyat, Hikâye, İnceleme

A Review On The First Story Book In Zazaki: Cer Hard Cor Asmen

Summary

The story is counted among the modern genres and is defined as 'to tell the events that have happened or could happen in a short manner with a literary style'. This genre of short storytelling, known today as a story, is the continuation of the genres of storytelling known as 'epic, saga, tale, rumor, saga and affair' in classical times. The story has been an effective genre in giving the first examples in modern literatures. In modern Zaza literature, the first examples were mostly written in the form of stories. Zaza literature gives its first examples due to political pressures and social reasons at a late date. The first story example in Zaza literature is the story named *Macera î Silêmonî Gince*, published in the newspaper *Roja Newe* in 1963. The effort of people in the diaspora is important in this literature, which has started to be evident since 1979. During this period, magazines play an important role in the formation, progress, recognition and showcase of modern Zaza literature. Magazines such as *Tirej, Çıra, Hevi, Kormışkan, Ayre, Piya, Vate, Şewçıla* and *Vir* are a few that come to mind in this context. In modern Zaza literature, more than 200 works have been written in a short period of 30 years since 1990 in modern genres such as poetry, story, novel, drama, essay, memoir, biography and humor. Among these works, story books have an important place. The first storybook written in Zazaki is Kemal Astore's *Cer Hard Cor Asmen*. In this study, this storybook will be discussed with the method of analysis.

Keywords: Modern, Zazaki, Literature, Story, Analysis

DESTPÊK

Hikâye, edebiyato modern dı yo tewiro muhim a. Ino tewır, hediseyi ki yo wexto kılm dı biyi ê hediseyan ano zıwan. Ê his, fıkır, tigêrayış u tesiri ki besteyê ini hediseyani inan zi bı zıwanêko tesirdar dano nuştış. Hikâye, yo heyato derg ra yo hel a. Nuštoğ, bı nuştışê hikâye xeto tari ê heyatê dergi ri yo çıla fineno ta u ino heyat ano verê çıman. Hikâye kılm a; labelê yo tewiro tesirdar a. Ino sebeb ra hikâye, umışê heyatê insanê moderni u terzê wendışê ey bena. İnsano modern tesirê eraverşiyayışê teknoloji dı mendo u seba inay dunyaya tebiyi u tılsımın ra duri mendo. Wı, wazeno ki bıküwero dunyaya edebiyat a tılsımın. Seba inay zafyer tewirê hikâye tercih keno. Hikâye qıç u kılm a; labelê wendekarê modern ri berê yo dunyaya gırd, rengin kena a.

Hikâye, awurê xu teyna nidana şexısan. A hetêk ra awur dana cemat u şari. Çunki her edebiyat, şarê xu dır tekildar o. Her şar, bı raştıya xu ya cematki senet u edebiyatê xu weye keno. Hikâye, qey edebiyati kerraya koşe ya u qey edebiyatê yo şari unsurêka runayoğ a. Her cemat u şar ri yo hikâye esta. Hikâyekerdiş ya zi vaciyayışê hediseyan, her wext, her ca u her cemat dı estbı u beno. Riyê erdan dı tu cemat çino ki yo hikayeya ay çınbo.¹ Hikâyekerdiş ya zi vaciyayışê hediseyan miyanê cematê xu dı zil dano u miyanê ê cemat dı çı tekili, şeklê heyati u şiyayışo cematki esto bı hikâyekerdiş yeno verê çıman. Ino şeklê cuyışi u sistemê tekiliyan heta rıstımê edebiyati nezılıyeno u edebiyat eraver beno. Hikâye, hel bı hel qeydê cemati gena, bı cemat nefes gena u dana.²

Qewramê *hikayeya modern* vercu Rocawan dı, dıma sareyê seserra 20. dı welatê ma dı ameyo şıxulnayış. Qey hikayeya modern hına yo daşınasnayışi zi esto: “Ê çiyi ki eğleb hemı insani vineni ya zi sareyê inan ra viyereni labelê zaf pê ê çıyan tekildar nibeni hikâye ini çıyan bı yo vatışo tesirdar ana zıwan.” Tesirê Rocawanbiyışi peyniya seserra 19. dı wareyê sen’et u edebiyat dı zaf beno tesirdar. Seba mo tesirdari edebiyatê Tırkan dı hikâye zey tewıranê binan yo formo klasik dı nê bınê tesirê edebiyatê Rocawan dı eraver şıya. La ino tesir qey edebiyatê Zazaki yo çarçewaya teng dı maneno; çunki Zazaki biyê ini serranê peyinan yo edebiyato nuşteki ra behskerdiş zaf zor o. Ino sebeb ra hına yo tesir edebiyato modern dı xu zaf zıxm raniamocneno. Rına, goreyê tesbitanê ma ê Zazayi ki şiyi zobina welatan biyê inan Zazaki miyanê sınoranê Tırkiya dı teyna hetê Zazayan ra yena qalkerdış. Wextê Usmaniyan dı yo binaya zafzıwani u kulturi estbi. Çı wext dewleta Usmaniyan bena vıla, şiyena ra u herında ay yo dewleta milli niyena ru yo politikaya gıdar şaran u zıwananê binan ser yena ramıtış. Seba

¹ Roland Barthes, *Anlatıların Yapısal Çözümlemesine Giriş*, Gerçek Yayınları, İstanbul 1988, r. 101

² Köksal Alver, “Edebiyat, Sanat ve Toplum”, *İstanbul Üniversitesi UZEM Fakültesi*, İstanbul 2016, r. 86

may zey Zazaki zıwani bini kuweni binê telukaya vindbiyişi. Çendek politiqaya yozıwani zereyê famê dewleta mili dı meşru u mequl êsena u ina politiqâ hetê hemî dewletanê miliyan ra qebul biya qey şar u miletanê bindestan meşru u mequl niya. İni sebebi negatifi qey eraversiyayışê zıwan u edebiyatê Zazaki biyi mani. Politikayı inkâr, xuranivınayış, asimilasyonu u yasağkerdişê zıwani Zazayi bı serran yo nuştış u edebiyato Zazaki ra duri mendi. Labelê seni'g firsêt kuyayo dest u qanuni pozitifî qebul biyi u mekteban dı Zazaki ca gureto nuştış u edebiyatê Zazaki ri ber biyo a. Zazaki zereyê yo wexto kılm dı ramocna ki zereyê xu dı yo potansiyelê edebiyati kırışnena.³

Edebiyatê Zazaki, biyê çend mewlid, eqayidname u metinanê folklorikan heta sera 1963 hetê edebiyatê nuşteki ra zaf sıst o. Ina serr, 15 ê aşma Gulani dı rocnameyê Roja Newe dı hikayeya verin ê Zazaki *Maceraya Silemanê Gincî* neşır bena. Nuştogê ina hikâye belu niyo; la goreyê texminan ina hikâye Doğan Kılıç Şihhesenanlı nušta.⁴ Tırkiya dı verê edebiyatê Zazaki ê nuşteki dı maniyi ki tor pili politikayı siyasi u yasağı zıwani bi. Rına zi peyniya serranê 1970'yan ra pê zey Tirej tikê pêserokan dı ca diyeno nuşteyanê Zazaki. Humarê diyın ê ina pêserok dı bı destê Malmısaniji bı nameyê *Engiştê Kejê* yo hikâye neşır bena. Ina hikâye zi hikayeya diyın hesıbiyena. Biyê ina hikâye zobina nuşteyi moderni zi ini pêserokan dı ca geni. Labelê derba eskeriya ê 1980 verê ini xebatan dı bena yo dês u heta sareyê serranê 1990'yan hewayo negatif vıraziyeno.

Serra 1991 dı Qanunê 2932 '*Ê neşiri ki biye Tırki zobina zıwanan dı neşır beni derheqê inan dı*' bediliyeno. Ino bediliyayış ra dıma verê çapkerdiş u neşırkerdişi dı yo yasağo muhim weradiyeno.⁵ Inay sera roc bı roc xebat u neşiri Zazaki beni zêd. Pêserok, rocname u kitabi Zazakiyi ki Tırkiya dı neşır biyi zafıya inan bediliyayışê mo qanun ra dıma zereyê serranê 90'yan dı veciyayi u çap biyi. Ina çarçewa dı serra 1994 dı kitabo verin ê hikayeya Zazaki *Cer Hard Cor Asmên*⁶ neşır beno. A roc ra heta eyro 50 ra zêd kitabi hikayeyi neşır biyi. Ina xebat dı mo kitabo tor verin ê hikayeyanê Zazaki ser yo etudkerdiş o.

1. KITABO VERİN Ê HİKÂYEYANÊ ZAZAKİ

Edebiyatê Zazaki dı kitabo verin ê hikâye *Cer Hard Cor Asmen* o. Ino kitab, Kemal Astore serra 1994 dı nuştı. Nuştogê Astore, Erzingan ra yo u eka ho Almanya dı cuyeno. Ino kitab, 144 ripeli yo u zereyê kitabi dı ini 29 hikâyeyi ca geni: “Gaê Alişani, Bektes Axa, Merdımê Wextê

³ Nadire Güntaş Aldatmaz, “Kırmanccada (Zazacada) Modern Öykü”, *The Journal of Mesopotamian Studies, Special Issue on Zazaki and Zazas*, cilt: 5, Serr: 2020, r. 136-153.

⁴ İlyas Akman, *Modern Zaza Hikâyeciliği 1*, Gece Kitaplığı, İstanbul 2018, r. 11

⁵ Yaşar Salihpaşaoğlu, “Türkiye'nin Dil Politikaları ve TRT 6”, *Ankara Hacı Bayram Veli Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi*, Serr: 2007, cilt: 11/1, r. 1033-1048

⁶ Kemal Astore, *Cer Hard Cor Asmên*, Weşanxaneyê Doz, İstanbul 1994.

Vereni, Memed Sono Mekteb, Bonê Mirali, Eskıcı, Kutene, Teyera, Curonie u Perei, Hesên Dede, Koo Sipi u Koo Şaa, Yaranie, Dewic u Sawci, Sîlê Qıcı, Dewres Aliyê Manqılı, Her Çi Ju Sate De Bi, Xafî, Je Sanike, Herre, Sosine, Bi Ebe Xu Vece, Hetê Erotik Ra Serbestiyê Kırmoncu, Dermon, Kam Beno Muxtar, Merdîmi Ke Nêzanit u Nêzaneno, Wejir Axa, Çermê Gai, Hemed Axa, Saa ‘Kewie u Saa Sure.’”

Qapağê kitabî dı yo resim diqatê wendekaran anceno. Bênatayê resim u nameyê kitabî dı yo tekiliya zıxm esta. Hetê cêr dı ‘erd xet bî xet rengin o. Inay ra zi fam beno ki kitab dı yo reng nê her reng, rengê xu dano hikayeyan. Her mewsim u wext bî rengê xu mo qapağ dı ca geno. ‘Erd ca ca wuşk o, herr zuwa ya. ‘Erd ca ca zi zergun o. Seni’g payiz yeno dari pelanê xu rîşneni, wesar dı newe ra vıl kenî, ‘erd goreyê demserran xu newe ra xemılno. Verê yo banê herrın dı yo ciniya extiyar mangaya xu dita, satılê şiti ho destê ay do u hetê keyeyê xu ra şına. Serê boni dı yo loğ êsena. Asmen zi cor dı bî rengê xu yo kewe u gor heyatê dewıcan ê Zazayan ri beno yo sembol. Ge insani kêfweşi u asmeno kewe verard şino inan, ge insani tengzerri u asmeno gor bî derd u kederan inan pêşeno. Ze ku mo resim yeno zıwan u vano, ‘Ino kitab dı dew esta u cuyê dew esto.’ Wendekar eşkeno bî mo resim hişa xu dı wexto verin u cuyê dewan bîfıkırıyo.

Edebiyato modern ê Zazaki dı mo kitabo verin ê hikayeyan dı hema usulê eseranê klasikan u ‘urfıyan esto. Kitab dı her hikâye bî yo destpêk destpê kena u dıma goreyê usule hikayeyanê Maupassanti hediseyi vıla beni u bî yo netice qediyeni. Kitab dı zafyer hikâyeyi hediseyi esti. Ca ca zi ê çiyi ki sareyê nuştoği ra viyerti hewayê hikâye dı nusiyayi. Kitab dı bênatayê hikâyeyan dı ca u şexısan ser yo tekili u gıre esto. Ma vac, hikâyeyanê *Merdîmi Ke Nêzanit, Nêzaneno u Memed Sono Mekteb dı* qehreman Silemoni Ferati yo. Çend hikayeyan dı zi Kemal esto. İhtimal esto ki mo Kemal bî xu nuştoğ o. Xo ra zaf hikayeyan dı hewayê virameyişan esto. Rına çend hikayeyan dı Muxtar Ayiz esto. Hikayeyan dı ca u mekân egleb dormaleyê Erzingani yo. Çend hikayeyan dı Almanya, İstanbul u Diyarbekir zi beni mekan. Nuştoğ bî xu Erzingan ra yo u hikayeyanê xu dı bî taybet ca dano dewa xu. Ino sebab ra mo kitabo ê verin hikâye, hikayeyanê dewan ra muniyayo.⁷ Kitabê hikayeya *Cer Hard Cor Asmen* dı egleb zey dej u tengasiya insanan, zulimê hukmati, kerameti merdîmanê pılan, ciranti mexsarikerdiş, me’meleye ağayan⁸ u eşq ciya ciya mewzuyi ca geni. Ê hikâyeyi ki tede eşq ra behs beno peyni dı aşiqi nêreseni yobinan.⁹

⁷ Muhammed Çetkin & İbrahim Dağılma, “MODERN ZAZA EDEBİYATINDA ŞİİR, HİKÂYE VE ROMAN TÜRLERİNE DAİR TESPİT VE TAHLİLLER”, *Bingöl Araştırmalar Dergisi*, cilt: 6, humar; 2, serr: 2020, r. 7-41

⁸ Astare, e.n.v

⁹ E.n.v., r. 111-114

Kıtab, zey kıtabanê hikayeyan ê binan nameyê xu yo hikâye ra nigeno. Kıtab, nameyê xu yo şîir ra geno. Ino şîir hikayeya *Kam Beno Muxtar* dı viyerenoy:

Qesei amê qesu dıma,

Reşti çeunê dina.

Cer hard cor asmên o,

Dewa ma de ju qesê bio vıla.

Bierê bierê bvinê,

Hal u gumanê dewa ma.

Zeke hewri qılaşıayi ra,

Dewa ma tey bie via.

Cer hard cor asmen o,

Haq rie merdımê rındi de şe kero¹⁰

Kıtab dı hem zey *Bonê Mirali*, *Teyera* hikâyeyi derg¹¹ hem zi zey *Hemed Axa*, *Xafi*, *Koo Sipi* *Koo Sia*, *Merdımı ke Nêzanıt Nêzaneno* hikâyeyi kılmi¹² esti. Zereyê kıtabi dı biyê hikayeyan hot hebi resimi ca geni. Bênatayê ini resiman u hikayeya ki tede ca geno yo tekili esta. Ini resimi nuştogı bı xu vıraşti u bınê resiman dı tarixê vıraştışê resiman, nameyê nuştogı u resimi esto.¹³ Peyniyê hikâyeyan ê kıtabi zey hikayeyanê şari ders, şiret, lezvate u lawıki çiyi ca geni. İni unsuri u terzê virameyişi ino kıtab hetê terzê moderni ra keno sıst; labelê hikayeyan dı yo vıraştış u piardişo zıxm, tekiliya hedise, şexıs, ca u wextan, terzê hikayeyanê kılman ino kıtab hetê modern ra keno zıxm:

“Hên bi, her çi ju sate de bi: dostine, helalie, pêrodais u qewxa. Xo ra hêni o. Xuya merdımunê suke xuya yê dewu nêcena...¹⁴ “Hêni o, merdım ke nêzanıt nêzaneno.”¹⁵ “Dina de heştaye u dı millet esto. Dina taine rê herb u ‘çek o, taine rê haşt u delal o. Hawtae u dı millet esto, taine rê rındo, taine rê xırab o. Wa teke her kes rê dina wes u zelal bo, pêdima ke beno riê bêkes u feqiru de ki şe kero. Raunê xepixaneı ‘çali u çırpi ra giredo, hurinda inu de haştie pêda kero. ‘Cı ke se beno bibo diêso raşt nêrijino.”¹⁶

Ina çarçewa dı peyniyê hikâyeya *Saa ‘Kewie*, *Saa Sure* de yo lezvatê u hikâyeya *Gaê Alişani* dı lawıki ca geni:

¹⁰ E.n.v., r. 128

¹¹ İni wırdi hikâyeyi 12 ripeli yi.

¹² İni hikâyeyi teyna dı ripeli yi.

¹³ Astare, e.n.v., r. 15, 31, 46, 64, 102, 122 u 134.

¹⁴ E.n.v., r. 101

¹⁵ E.n.v., r. 131

¹⁶ E.n.v., r. 51, 52

“Cironu ke pers kerd, ni saê nianeni kam dê cı, vat: Lai ver, vai ver, vengê laşerê partiu ver, meydonê suke de heng u ceng, binê dare de tili vili, xo re bıwerê saune xu, kes rê mêvace, ‘çı ke lete kewe, lete sur.’”¹⁷

“Gaê mino gao xirt,
Çermê xu belek o,
‘Çarê xu sipi o,
Gaê mino gao altun,
Hangaje ver pêt sono,
Wa hegaê mı genım bo,
Dıme ra ambarê mı pırr bo.”¹⁸

Kıtab, bı alfabeye Latin ameyo nuştış; la tercihê herfan dı nuştog ca ca tercihê Bedirxan sera şıyo herfi *i*, *î*¹⁹ u *x* şıxulnayı, ca ca tercihê Piruşênê Tikmi²⁰ şıyo herfi *ü*, ‘ç’, ‘t’, ‘k’ şıxulnayı, ca ca zi diyalektê Dersimi sera şıyo diftong şıxulnayo u herfi gıredayê nişıxulnayı. Kıtab, sare ra heta peyni bı yo Zazakiya akerde u herikiyaye nusiyayo; labelê çend hikayeyan dı yo-dı ca dı cumleyi Tırki zi şıxuliyayı. İni cumleyi Tırki zi qey kitabi yo kêmi niyi. Goreyê şıyayışê hediseyan icab kerdo u nuştogı mo semed ra şıxulnayı. Ê cumleyi Tırki zi bêteyê hâkim u yo şexısı dı, inan ki zobina ca ra bar kerdo ameyi miyanê dewıcan bêteyê inan dı yan zi Wali u bêteyê şari suke dı viyerenı. İta ra yeno famkerdış wextê qewimiyayışê hikayeyan dı Zazayi xu miyan dı Zazaki qal keni, bêteyê memuranê hukmat u şari dı Tırki qal bena:

(Merdimo Tırk vano) “He gardaş, bana zarari yoxtur, gelsin burdan gitsin.”²¹

“Ben bilmez hakım beg.”²²

(Hâkim vat) “Ama sen hep dertli şarkı söylersin ve halkı duygulandırırın!... Böyle şarkıları söyleyenin suçu çok büyüktür, sen bölücülük yapıyorsun.”²³

“Marş, marş, ileri marş. / He yaşa, yaşa bizim paşa...”²⁴

Kıtab dı hikayeyanê *Memed Sono Mekteb*, *Bonê Mîralî*, *Her Çi Ju Sate De Bi*, *Hetê Erotik Ra Serbestiye Kırmıncu* dı ca ca zey ‘sere her, lacê kelpê kutikî, lacê kutikî u ha çüa mi, ha k... mi’ kelimeyi nengi u argoyi esti.²⁵ Rına hikayeyan dı idyomi, vateyê verinan u duayi viyereni.

¹⁷ E.n.v., r. 143

¹⁸ E.n.v., r. 10

¹⁹ Goreyê vervateyê kitabi, nuştog bıxu ‘î’ nişıxulnaya, editoran ina herf şıxulnaya.

²⁰ Piruşênê Tikmi, “Dilimiz Kırmınciki Nasıl Yazılır. Kırmıncikinin Alfabesi” (Dersim Zazacası), *Desmala Sure*, humar: 11/1 Mart 94 u humar: 12/2 Haziran 94.

²¹ Astare, e.n.v. r. 11

²² E.n.v., r. 38

²³ E.n.v. r. 92.

²⁴ E.n.v. r. 123 u 124.

²⁵ E.n.v. r. 28, 36, 101 u 119.

Hetê hokê onayışan ra hikayeyan dı hiri hokê onayışi zi xu ramocneni. Nuştoğ, tîkê hikâyeyi bı hokê onayışê temaşakeri nuşti. *Mordemî Wextê Kanî* ini hikayeyan ra ya:

“... Namê xu Memed Dede bî. Lesê ra zaf derg bi, ‘çimê xu u burîê xu girs u şa bî. Rîê xu endî qermeçîayî bî, rî rê’çu ra pîr bî. Bejnê de zimelê xu yê qolindî jê porrê xu endî bibî sipî...”²⁶

Nuştoğ tîkê hikâyeyi bı hokê onayışê qehremani nuşti. Hikayeya *Her Çî Ju Sate De Bî* ini hikayeyan ra ya:

“Ez u misaîbê mi şîmê ke xo rê restoran de non biwermê. Seke çeber de kotîme zerre, garson ama, ma guret bierd bostonê restorantî...”²⁷

Nuştoğ dı hikâyeyi zi bı hokê onayışê İlahî nuşti. Hikayeya *Wejir Axa* ini hikayeyan ra ya:

“Wejir Axa xu ver qal keno, pîlanê viraceno, vano ez se bikerî ke, destê nî zalimu ra bixeleşî, nî mi benê ‘çale de qerqesune nane ra mi, mi kîsene, ya kî bene meydane suke de darde kene...”²⁸

Hikayeyanê kitabî dı hetê wext, ca u şexîsî ra zey ‘rocun ra rocêk, ju roca omnon, zımiston, payiz, wesar, letê şew, sodır sîpê ra, wexto verin dı; Erzingan, dewa Erzingani, suke, kiye, teber, Estanbol u kê Axayî; domonî, cinikî, Bektes Axa, Eyiz Axa, cendermeyî, Kemal, aileyê Kemal, eskerî, Sîlemonê Feratî u merdîmêk...’ unsuri hikaye êsenî.

Nuştoğ, wazeno wendekar, bı ini hikayeyan heyat u cuyê Zazayan u mıntıqayê Erzingan ser hayidar bo. Seba may yo zıwano sen’etm nê yo zıwano zelal u herikiyaye şıxulnayo. Cumleyî zaf derg niyî. Labelê teswiran dı cumleyanê xu hola hol runeno. Hikâyeyî kitabî eğleb hikâyeyî qıcı yi u bı terzê Maupassanti nusiyayî. Heyatê dew, hal u weziyetê dewıcan bı teswiran u terzê Maupassanti weşa weş yeno verê çıman. Eger, etud u tehlilê hikayeyanê kitabî bı yo cumle biyo vıraştış ina cumle kâfî yena: “İnsananê verinan destê hukmat ra zaf eziyet diyu. Dewıcanê ina mıntıqa hem zıwanê xu ser hem zi cuyişê xu ser zaf tengi diya.”

2. KILMNUŞTEYÊ HİKÂYEYAN Ê KITABÎ

Kitabê Cer Hard Cor Asmen dı, terzêko realist şıxuliyayo. Kitab dı eğleb zey ‘dew, cuyê dewan, tekiliya insanan u hukmat, tada u zıwan’ temayî şıxuliyayî. Kitab dı 29 hikâyeyî estî. İni hikayeyan dı unsuri hikâyeyî bînatayê terzo klasik u modern dı şini yenî. Hikayeyan dı ge ge hewayê hikayeyanê şari, ge ge terzê hikayeyanê moderni xu ramocneno. Ino semed ra ino qısım dı çar hikâyeyî bı sernuşteyî, ê hikâyeyî bini kılmi ra ameyî daşınasnayış.

2.1. GAÊ ALİŞANÎ

²⁶ E.n.v. r. 18

²⁷ E.n.v., r. 99-102

²⁸ E.n.v., r. 133

Şexısı ma hikâye Alişani, Zeyne, Heseni (Lacê Alişani), domani, ciniyêk u merdımêko ğerib i. Hikâye dı wext formo bibelu dı zey ‘rocu ra ju roce, rocêk’ kelimeyi wexti şıxuliyayi. Hikâye dı zey ‘kiye, dew, verê axure, serê şemik, hega, bonê çe Ap Selmonu, serê gilê ko u Kakita Koê Muzır’i mekani esti. Bênatayê ini mekani u hediseyanê hikâye dı tekili esta. Hikâye dı serqehreman Alişan o. Alişan rocêk şıyo hega, vaşê xu çınayo u ameyo. Malê²⁹ herkesi ameyo; labelê malê Alişani niameyo. Alişan lacê xu Heseni ra vano: “*Lacê m’, gonîa mi to ra bo, reî bivoze so paga çe Hemê Hemeîzu de eke gaê ma uca o, uca nîo.*”³⁰ Heseni şino gêreno gêreno la nameyê heywani ra çik nivineno. Şino serê rayiri uca dı yo merdmo ğeribi vineno, ey ra perseno. La mo merdmo ğerib Tırk o u Zazaki nizano. Heseni ey ra Tırki perseno u miyerik Tırki cewab dano: ‘Burada yoxtır.’ Heseni şino şino, axir gayê xu vineno. Yeno babiyê xu Alişani ra vano: ‘Mı di, hê filun ca dı.’ Inay ra pê Alişan şino verê gayanê xu u heta şan inan ver vındeno u inan çerineneno.

2.2. BEKTES AXA

Şexısı ma hikâye Bektes Axa, dewıcı u xanıma Bektes Axa yi. Hediseyi hikâye Qelecuxe, Erzıngan u suk dı zey ‘ju raca amnani, payız, wısar u zimıstan’ wextanê nebeluyan dı viyereni. Serqehremanê hikâye Bektes Ağa ‘eşıra Asurici ra yo. Mal u mulkê ey zaf o, merdımêko dewlemend o. Bektes Ağa rocêk malê (heywan) xu roşeno. Pereyê xu geno erzeno pıstına xu. Şino keye u vano; ‘Ez mi peru ça dı weradi?’ Dıma pereyan beno erzeno zereyê soba, uca dı temırneno. Bênatayê ra yo wext viyereno, zimıstan yeno, hewa beno serd u Bektes Ağa soba fineno ta, zere beno zey hemum. Bektes Axa, heta hişa ey yena ca pereyi zereyê soba dı vêşeni beni wel. Bektes Ağa, merdımêko cihad o, xebıtiyeno pereyan rına keno zaf. Ina dor pereyan beno bınê yo telis(tore) dı temırneno. Ina dor merreyi yeni pereyan weni. Heta Bektes Ağa, şık fineno cı pereyi biyi werê merreyan. Bektes Ağa, rına xebıtiyeno u pereyan keno zaf. Ina dor pereyan beno qulıkê dêsi dı nımneno. Ina dor qılanciki yeni pereyanê ey beni xu ri halin vırazeni. Labelê ğemê Bektes Ağayı niya. Wı rına xebıtiyeno pereyi ey beni zaf. Ina dor pereyan dano xanıma xu. Xanıma ey zi pereyan bena cayêko mehkem dı nona ru. La ma dor cini çım akerdeyi kena u pereyan tay tay xerc kena, xu ri çi mi gena. Rocêk Ağa pereyan wazeno. A vana; ‘Perê qediyayi.’ Yo sandıq mocnena cı, zereyê a sandıq kinci minci dekerdeyi. Bektes Ağa, ma dor qerar dano, şino çarşu dı xu ri yo keseya asinin erineno. Pereyi ey rına beni zêd. Pereyanê xu dekeno zereyê ma kese. Meftı erzeno cewê xu. Ağa, rocêk şino hega, cit rameno. Miyanê araqi dı maneno u dest erzeno cewê xu destmal veceno pê araquê xu biestero. O wext

²⁹ Heywan, dıwar u pes

³⁰ E.n.v., r. 8

meftı cewê ey ra kuweno war u wı ferq nikeno. Bênete ra yo mudı viyerenno şino çarşu xu ri çi mi biyero; la çı bivino, meftı cewê ey dı niyo. Sekeno nikeno nieşkeno sandıq akero. Peyna peyin sandıq keno a la ina dor pereyi puyayi.³¹

2.3. MEMED SONO MEKTEB

Ina hikâye hetê şexısan ra hira ya. Hikâye dı ‘Eyiz Axa, Keke Selmonu, Nesemi Axa, Hesênê çê Ferati, Silemonê çê Ferati, Sadıqê Babai, Bıraê Baki, Hesên Usta, cinika Silemonê Anuxu, Memo, Muzır u Dadiyê Memi’ ca geni. Hikâye dı hedise zereyê şan u şew dı viyerenno. Seba inay hikaye dı zey ‘Verê bonê çê Yibrahimê Anuxu, verê bonê çê Eyiz Axa, u dewa Tekmecuge’ çend mekani ca geni.

Dewıcı her şew şiyên keyeyê Yibrahim Axa. Mergê Yibrahim Axayi ra dıma ina dor şini keyeyi Eyiz Axayi kunağ u diwan kenı. Wext dewıcı yeni tica dunya ra, heyatê xu ra, dew ra, heywanan ra u zobina meseleyan ser qısey kenı. A şew zi rına diwan nayo ru u vani: “*Ma şîme herb, şîme sefer, nêwes mendîmê, vêson mendîmê, bîme dirbetin, taê ma ginaî pîro merdî. Ma ‘çarix nêdîenê pira biguretenê, korek nêdî biwerdenê. Xortê ewru ‘tawai ra qaîl nêbenê. Vanê cebe ma peru ra pîrr bo, dîna se bena wa bibo.*” Ina dew dı Mem esto. Mem, serqehremanê hikâye yo u çarês serrê yo. Mem, şino mekteb. Ey qom eşta u biyo derg. Goreyê o wextan hem kar u gure kerdên, hem zi şiyên mekteb. Seba kar u gure Mem wendiş ra tepiya maneno u zaf erey kuweno wendiş. Mem ra perseni vani: “*Memo, mektebe tu key qedîno?*” Mem vano: “*Ma ez ‘çi zanon, maylim zaneno.*” Rocêk Mem ho honêko xori do. Dadiya ey şına vendena nivendena Mem’i Mem niwurzeno. Çend dor vendena, Mem vano: “*Meke daê, hewne mi wes yeno*” Dadi hini tera qalan vana. Mem zi vano: “*Oşyh, mi zaf wend, tene kî şîero Muzir hurînda mi de biwano.*” Dadi dona ra şına, Mem rına rakuweno, hon vineno. Tekmecuge de mekteb vıraziyeno. İta dı qıcı tena Tırki museni. Dadi babi qıcan qayili qıcı inan wa bıwani u heyati xu bixelesni. Gaya xu, hegayê xu, mali xu, rotenê qıcani xu şırawitên Enqara, Eistanbul semedê wendiş.³²

2.4. BONÊ MİRALİ

³¹ E.n.v., r. 13-17

³² E.n.v., r. 23-28

Ina hikâye zi hetê şexîs, wext u cayan hira ya. Hikâye dı ini şexîsi ca geni: Mirali, pi u maya Mirali, bira u waya Mirali, Apê Mirali, Wuşen Axa, Silemon, Muxtar Eyiz Axa, Gulezare, Zerwan, Hâkim, Memedê Çewayi, cendermeyi, piyê Kemal'i. Dew, Koe Munzuri, Derê Gelie, Doım(Dêsim), axur, oda Ap Pasai, kê Muxtari u suke hikâye dı cayi mehkemi.

Dewa ki hediseyi tede viyereni çar mehle ya. Wertê dew ra yo xet şına, dew kena dı lete. Hetê Koyê Munzuri ra vuni Doım. Serra 38 dı zaf merdımı ameyi kıştış. Ina mesela ser zaf insanan keyeyê xu bar kerdo u ameyi ina dew. Ê merdımman ra yo zi Mirali yo. Meseleyê Mirali zaf trajik a u wext wendekar ina mesele wuneno pê Mirali deceno. Pi u maya Miraliyi Çemê Munzuri dı xeneqiyeni u Mirali teyna maneno. Apê ey, ey ri vayirti keno. Mirali şewêk kiye ra veciyeno, teber dı kutik laweni. Piyê Kemal'i oniyeno teber, Mirali vineno, ey geno zere. Ey dı qalkeno, nan u wer dani Mirali, cıl mıl dani cı, her ehtiyaciya ey ani ca u axir ey xu ver dı vındarneni. Mirali her gure ra fam keno. Rocêk destanê piyê Kemalî dı vıring veciyeni. Piyê Kemal porê Mirali qesneno u Mirali sareyê xu şuweno. Dima şino verê Muxtar'i. Muxtar cı ra vano: *"Tu nîara têpîa îta vindena. Heto mino 'çep tuya. Qaitê dewe be. Ez ke dewe de nêbîo, rind muxaîtê dewe be. Şeke kam naxirê xu keno hegau, kam dar u birr birneno, mi rê vace."* Mirali zaf beno şa. Yo zemun hol hina viyarneno. Rocêk Mirali zerr kuweno yo keyna. Nameya ina keyna Gulezar a. Mirali şino yo ban u yo bexçe virazeno. Erdê xu keno hira. Wı u Gulezar zewıcyeni. İnan ri yo qic beno u nameyê ey Zerwan paneni. Wuşen Axa vineno ki Mirali ban viraştı, cayê xu kerdo hira. Çuwa xu geno şino verê berê ey. Vano: *"Ju heşt wextê sima esto, wertê ju heşt de ke bar nêkenê nêsonê, veng a cendermu dan, bon sima sero riznon."* Mirali fikiriyeno, wexto verin bı dar u ber, kemer u kuçê koyan, veyşani u teyşani, dec u derd yeno verê çımanê ey. Axa ca dı şino vendeno cendermeyan u Mirali dano mehkema. İni wırdı şini mehkema. Axa derdê xu vano. Hâkim, Mirali ra perseno, Mirali cewab dano. Axa vano: *'Hakîm beg, pasa, nu nêzaneno, nî caê dewe de bon viraştı, nu mekteb nêşîo, qe 'tawa nêzaneno. Bîlmez o, eke înam nêkena, reî ci ra pers ke, şikîno ke name asmu bimoro.'* Hâkim perseno, Mirali nameyi aşman leza lez humareno. Hâkim qerar dano u ê uca ra veciyeni. Axa şino hetê Mirali ra, ğar ano cı la Mirali goş panikuweno u keyfa xu nixeripneno. Dono ra şino nişeno qamyonetê xu u gıran gıran suk ra veciyeno şino.³³

2.5. HİKÂYİYİ BİNİ

Biyi ini çar hikayeyan kitab dı 25 hikâyeyi bini esti. Hikayeya *Mordemê Wextê Verenî* dı bı hewn u ğıyalanê Mahmud Dede'yi dı merdumanê verinan ra behs beno. Merdumi verini hol

³³ E.n.v., r. 29-40

u pit i. Karê xu dı zıxm u cihat i. Soz u qıseyê xu dı vındenı; la çı heyf ki hetê mal u mlk ra feqir i.³⁴ Hikayeya *Es'kîcî* dı Pirika Cewyir esta. Wext şına suk uca dı eskıcan u zobina çıyan ana. Eskıcan dona tutanê dewan.³⁵ Hikayeya *Kutene* dı meseleyi siyasi ca geni. Polosi, işkence u hepısxane qey yo wexto nızdı nişani. Qehremanê hikâye Kemal o, Kemal depişiyeno u kuweno zindan. Uca dı des dı mo nuşte nusiyayo: “İta dı Haq çino, pêxımbere şıyo izım” Polosi dani Kemali ri, awa serdın keni puri u ceryan nani bınê lınganê ey ra. Ey ra vani, ‘tı koministê, tı qarşiyê dewlet veciyeni.’³⁶ Hikayeya *Teyera* rına qehreman Kemal o. Kemal rocêk Almanya ra yeno Erzıngan u wext ageyreno teyare kuwena erey. Seba inay tıkê hediseyi yeni meydan. Ina hikâye dı zi zey niheqi, zur u ihmal çıyi veciyeni ver.³⁷ Hikayeya *Curonê u Pereî* dı ğurbet ra u heskerdışê pereyan ra behs beno. Serqehraman İsmail, şıno Almanya u yo mudı ra yeno dewa xu yo dıkan keno a; labelê dewıci ey ra gazumi keni u ey ra hini çı mi niermeni. İsmail zi hela wı pereyan ra heskeno ya zi dewıci heskeni inay tesel keno.³⁸ Hikayeya *Hesen Dede* dı meseleya Elewiti u Suniti ra behs beno. Suniyi u Elewiyi yobinan ra hes keni. Ino çarçewa dı Hesen Dede yo merdımı ‘Elewi yo u wayirê kerameti yo. Wı wazeno şıyero Hec; la merdumi Suniyi ey nigeni otobisa xu. Ino hal zaf zorê Hesen Dede’yi ra şıno wı kerameta xu ramoceno u cad şıno Mekke. İni heciyi Suniyi ey uca dı vıneni şaşmaneni u Hesen Dede ra uzır wazeni u ey xu ri keni reber.³⁹ Hikayeya *Koo Sipî, Koo Şaa* dı temayê eşq u heskerdışı esto. Ina hikâye dı motifi urfiyi esti. Dı merdumi yo keyna ra heskeni; la wırdi zi eşqê xu ra fek veranıdani. Pinikeni, koğe keni, kerrayan u qalan erzeni yobinan u mo hal heta extiyariya inan devam keno.⁴⁰ Hikayeya *Yaranê* dı nameya Celal Heyder u Kemal hiri embazi esti. İni piya şını veyve. Mırdê xu kay keni u piya ageyreni maseyan depişeni u yeni keyeyê Celali dı beni meyman. La Celal vercu nivano mo keyeyê mın o; o keye ri meyman nihevınayış ser hers beno u nengo çineno. Dıma fam bena ki o keye, keyeyê Celali yo u wı zi xu ri yâri keno u keno weş. Ina hikâye dı embazti, yâri u keyf u şayi sera yo mesaj esto.⁴¹ Hikayeya *Dewic u Sawcî* dı behsê eskeran u qıcanê dewıcan esto. Hedise dewa Mircan dı viyerenı. Eskeri biela bibela yo qıci ra maseyanê ey geni u lapat dani ey ri. Ino qıci zi no gerreyê eskeran babiyê xu ri keno. Babi, na sawci het; la sawci, eskeran nıdepişeno. Inay ser babiyê lacêki veciyeno teber u sawci ra qalanê gıranan vano.⁴² Hikayeya *Mesela Silê Qicî* dı yo merdumo lawıkdari ra behs esto. Ina hikâye dı

³⁴ E.n.v., r. 18-22

³⁵ E.n.v., r. 41-46

³⁶ E.n.v., r. 47-52

³⁷ E.n.v., r. 53-64

³⁸ E.n.v., r. 65-71

³⁹ E.n.v., r. 72-75

⁴⁰ E.n.v., r. 76-77

⁴¹ E.n.v., r. 78-85

⁴² E.n.v., r. 86-87

nuştoğ (Kemal) zi esto. Sîlê Qıcı, lacê xu Heyderi ser lawık vano. Lacê ey erdlerzê Pulumiri dı merdo. La esker yeno Sîlê Qıcı depışeno. Sewci ifadeye ey geno. Fam keno ki Sîlê Qıcı, merdumo siyasi niyo u lawıkan ideolojikan nivano, ey veradano. Ina hikâye dı nameya Molla Mustafa Barzani zi viyereneno.⁴³ Ina dunya dı tewır tewır insani esti. O ki usul ser şıno, o ki usul nizano u bîaqıl o, o ki gejo u o ki baqıl o. Hikayeya *Dewres Alîyê Manqilî* dı mo çarçewa dı yo merdumo dewreş ra behs beno u nameyê mo dewreşi Alî yo u Dersim dı herkes ey şınasneno. Ino Alî, wayirê kerameti yo, Heq ra nızdı yo, meleketan u Xızır dı qısey keno.⁴⁴ Hikayeya *Her Çî Ju Sate De Bî* nuştoğ (Kemal) hedise ri şahadi kerdo. Ina hikâye dı yo loqanta esto. Çend merdumi, bı yo laco feqır mexsari keni u reqi dani ey u ey keni serxoş. Dosti, meymani, yâri u koğe her çi zereyê ya seat dı beno u peyniya yâri bena tari. Peyni dı ini merdumi yobinan dır koğe keni.⁴⁵ Hikayeya *Xafî* dı Kal Hesên, wayirê kerameti yo u yo merdum zi yeno wazeno ey ra dursa kerameti biyero; la keramet bı musayiş nibeno. Kal Hesên mo merdum fetılreno.⁴⁶ Hikayeya *Je Sanike* dı mekân Diyarbekir o. İta dı yo waliyo zulımkar esto. Bı desta eskeran tewır tewır işkenceyan keno Kurmancan. Yo lacêk, semede heyfê babiyê xu inê waliyi kışeno. Hikâye dı, terzê vıstonikan dı yo vaciriyayış esto. Axir, mo lacêk tam hot waliyan kışeno u mıradê xu ano ca.⁴⁷ Hikayeya *Herre* dı, rına bı xu nuştoğ esto. Ina hikâye dı yo keyna esta, herr wena, pışkıl wena. Kemal zi inay ra eceb maneno u goya şıno inay dadiya xu ra vano. Dadiya ey wuyena; çunki Kemal zi qıctiya xu dı herr werdên.⁴⁸ Hikayeya *Sosine* dı serqehreman Sosine yo keynaya ‘ezab a. Dadiya ay wazena ay bırazayê xu dır bızewıcnı; la Sosine qebul nikena. A, yona lacêki ra heskena u wazena ey dır bızewıciyo. Sosine, nieşkena dadiya xu iqna bıkeru u şına xu alıqnena. Ina hikâye dı yo problemo cematki ri yo nişandayış esto. İni problemi miyanê şari dı esti u eğleb zey zewac tîkê probleman dı urf verê qeraranê insanan dı yo mani yo.⁴⁹ Hikayeya *Bî Ebe Xu Vece* dı mıntıqayê Mercane dı mezraya Gomike esta. Ina mezra dı teyna dı keyeyi esti. Yo keye dı Gozere u miyerdeya ay Wusif cuyeni. İni wırdi biyi extiyar. O keye bin dı Seyrane esta. Seyrane ciniya viya ya; la hema con a. İni wırdi keye gureyê xu piya keni, dest dani yobinan. Wusif, zaf wazeno yo qıcê inan bıbo. Homayi ri dua keni u Homa duayê inan qebul keno u pê a extiyariya inan, inan ri yo qıc beno. İni zaf beni şa u Homayi ri şıkır keni.⁵⁰ Hikayeya *Dermon* dı neweşiya Ciniya Wuşenê Selmonu Fadima ra behs esto. Çarçeweya ma neweşi dı baweriya şari ra, ziyaretan ra, dewreşan ra, doxtoran ra u kurme

⁴³ E.n.v., r. 88-93

⁴⁴ E.n.v., r. 94-98

⁴⁵ E.n.v., r. 99-102

⁴⁶ E.n.v., r. 103-104

⁴⁷ E.n.v., r. 105-107

⁴⁸ E.n.v., r. 108-110

⁴⁹ E.n.v., r. 111-113

⁵⁰ E.n.v., r. 114-116

insanan ra behs beno.⁵¹ Hikayeya *Kam Beno Muxtar dı* yo meseleya cematki ri çıla finiyena ta. Kıtab zi nameyê xu ina hikâye dı yo şiir ra geno. Dewan u mehleyanê Zazayan dı vicinayişê muxtaran muhim o u zey vicinayişê hukmati yo gureyêko pil viniyeno. Ina hikâye dı zi hına yo hedise yena verê çımanê wendekari. Hikâye dı hediseyi yo dew dı raviyereni. Dew dı 88 nıfus esto. Mınaqêşaya muxtari bêteyê Axa, şoneyê dıwari, malayê dew, maraba (xızımkar) u talebeyi dı bena. Ina mınaqêşa çarçeweya fetılınayış, koğe, dua, laser u qırban sarebırnayışi dı şına yena.⁵² Hikayeya *Mordem ke Nêzanit Nêzaneno* heywananê dewıcan ra behs beno. Dewan dı weyêkerdışê heywanan muhim o; çunki dewıci ini heywanan ra barkerdış dı, ramıtışê hegayan dı, cıtkerdış dı, doşenayışê şiti dı u zobina gure u ehtiyacanê xu dı istifade keni. Ina hikâye dı zi dewa Cencıga u mezrayi ay mekani hikâye yi. Nuştoğ, hına hikâye bı fekê qehremani dano vatış. Dew dı yo cayo sazın esto. Uca dı fetıl esta u rayır xırab a. Seba may, heywan u heri dew her tim uca dı zehmet vineni, lêr beni; la ço aqıl nikeno uca duzkeru, heta makineyi yeni keni duz.⁵³ Hikayeya *Wejîr Axa* dı serqehreman Wejîr Axa yo. Ino merdum wext 16 serri bı Oris erzeno dewa inan ser. Ino çarçewa dı qey wendekaran o wext ra u zulme Orisi ra yo pencıra bena a. Dewıci qırbeni, embazi Wejiri kışiyeni. Eskerê Orisi Wejir keno esir. Wejir, destê eskeri ra remeno, rına yeno depıştış u dora dıyın zi remeno şino yo gözer ser xu lımneno u hına xelisiyeno.⁵⁴ Hikayeya *Çermê Gaî* dı çımê qehremani ra yo meseleya dew ra behs esta. Şewêk dızd yeni, gayê piyê qehremane dızdneni. Piyê ey kuweno dızdan dıma, teqi reqi tıfingan veciyena; la cı feydı dızdo ga sare bınawa u werda. Teyna çermeyê gayi mendo. Dadiya ey bı nengan u zotan o çerme ana şuwena, sol kena u kena meşu u peyni dı ina qal ay fek ra veciyena: “*Ga merd, ‘çerme mend.*”⁵⁵ Hikayeya *Hemed Axa* dı, fekê qehremani ra hewayê virameyişi dı Hemed Axayi ra behs beno. Hemed Axa merdo. Wext wı heyat dı bı dewıcan ey ra vatên ‘Kolo’. Hemed Axa, extiyar o. Yo tuto qıç esto u nameye ey Ali Rıza yo u ino tuto nerehet bı loqmatikê ‘Ninga Şeytonî’ yeno şınyayış. Ino tut, her tim pê Hemed Axayi mexsari keno. Hemed Axa, rocêk bı feko nerm vendeno ey u goşanê Ali Rızayi kaş keno. Yo qeri u bari kuwena no tuti ser.⁵⁶ Hikayeya *Saa ‘Kewîe, Saa Sure* dı Nameyê Suralî dı yo merdumi ra behs beno. Ino merdum, qeşmerti keno u serê layi dı pay dı vındeno, hereketan akrobatikan keno. Merdumi ey ri çapıkan kuweni. Dora verin yo merdum yo saya sur u dora dıyın yo cini ya saya kewı dona Surali. Ey ê sayi werdi. Bı keyf newe ra veciyeno la ser. Yo o

⁵¹ E.n.v., r. 120-125

⁵² E.n.v., r. 126-129

⁵³ E.n.v., r. 130-131

⁵⁴ E.n.v., r. 132-134

⁵⁵ E.n.v., r. 135-138

⁵⁶ E.n.v., r. 139-140

heta, yo ino heta rına hereketanê akrobatikan keno. Heto bin ra sayani suran, ino het ra sayani keweyan doni Surali'yi...⁵⁷

3. HİKAYEYAN DI CA (MEKÂN)

Hikayeyanê Cer Hard Cor Asmen dı ca (mekân) xu dano ver. Hikayeyan dı cayi, raştikin i u wendekar eşkeno ini cayan biyaro verê çımanê xu dı bıkerro candar. Çend hikayeyan dı Almanya, İstanbul u Diyarbekir zi beni mekân. Nuştoğ bı xu Erzingan ra yo u hikayeyanê xu dı bı taybet ca dano dewa xu. Ino sebab ra ino kitabê hikâye yo verin hikayeyanê dewan ra muniyayo. Hikayeyan dı zey *çolê Kərbela, suk, deşt u koyi* cayi hirayi; zey *bon, axur, merak, sere şemik u binê dare tuyer* cayi tengi; zey *rayır, meydanê teyare, hega u dereyan* cayi akerdeyi; zey *keye, qehwe, hepîsxane, baxçe, otobis u wode* cayi gureteyi u zey *Erzingan, Qelencuk, Pulur, Koyê Munzuri, Almanya, İstanbul u Diyarbekir* cayi taybeti ca geni:

“Dewa ma de çar melaî bî. Wertê dewe ra Raa Virardîe şîenê u dewe werte de kerdenê di lete. Rae ra cor Mela çe Asuru bîe u na mela de di u hîre çe kî yê Mîrcuku ra bî...”, “A roce suke ra ke ama, tey ju nonê suke, di kiloî kîrajî, ju xiyar, nê m kilo kî es'kiçî ardbî.”, “**Suka Erzingonî** amnon de vêsena pêsena.”⁵⁸

Hikayeyan dı ca (mekân) eğleb dormaleyê Erzingani yo. Ê cayi ki hikâye tede viyereña bênateyê ê cayan u hediseya hikâye dı yo tekili xu ramocnena.

4. HİKAYEYAN DI WEXT

Ino kitab, terzê Maupassant dı ameyo nuştiş. Kitab dı eğleb hikâyeyi kılmi ca geni u ini hikâyeyi yo wexto verin dı viyereni. Hediseyi, zereyê yo wexto kilm dı destpê keni u qediyeni. Ino sebab ra hikayeyanê kitabi dı wexti zey *rocun ra rocêk, ju roca omnon, zimiston, payiz, wesar, şund, letê şew, sodır sipê ra, wexto verin, honikê şond dı* formanê dema viyerte u bibelu dı viyereni:

“Hên bi, her çi ju sate de bi: dostine, helalie, pêrodais u qewxa. Xo ra hêni o. Xuya merdımunê suke xuya yê dewu nêcena...”, “Suka Erzingonî **amnon de** vêsena pêsena. Hande ke germ o, mordem germ ver hurînda xo de nêvindeno, germ ra helmê mordemî birîno./ Zimiston kî hande zarf serd o”, “Alîşanî tumê hegaî çînit, vasê xu kerd girze...”, “...lete sewe ra hata sodır têe wende, hata ke fejrî eş. Lêle ra pêro pîa wuştî ra.”, “Teber sipî kerdenê. Pencereî cemedin bî. Zerre çêi handeke serd bî, helmê mordemî fekê mordem de bux dene.”, “Roce domonunê dewe vorekî guret bierdî ‘çiraînaene. Dormê ‘çemê gulu u ‘çicegu ra xemelîayî bî.”, “Dewa ma de wusar bî. Dormê dewe ‘çair u ‘çimen ra, gul u

⁵⁷ E.n.v., r. 141-143

⁵⁸ E.n.v., r. 29, 41 u 53

‘çi’çegu ra bereqîenê. Vialî, qewaxî, darê sae, yê murîe u hêrugu jîl dênê u vore ra sîpi çi’çegê xu bî.’, “Ju roca paiz bîe.”⁵⁹

Ca ca zi zey *wextê Derebegliu, des ser dîma, roca Çarşeme, pêroc ra tepya, sa’et hire, sa’etê nizdiyê new, nim serr, rocê Îmamu* wexti formêko belu dî veciyeni verê wendekaran.

5. HİKAYEYAN DI ZIWAN, USLUB U HOKÊ ONAYIŞI

Nuştoğ Astore, kitabê xu bî alfabeya Latinki nuşto. Kitab, sarê ra heta peyni Zazaki nusiyayo. Kitab dî diyalektê mîntıqayê Dêrsim u Erzingani xu ramocneno. Ma vac, nuştoği bêteyê dî herfanê vengınan dî herfî gıredayi nişixulnayı: “çel, Kemera Sipîe u wairê restorantî”⁶⁰

Hikâyeyi bî yo Zazakiya akerde, zelal u herikiyaye nusiyayi. Merdumo ki Zazaki zano, eşkeno hikayeyanê ey bîwano u fam bîkero. Cumleyi kılm i u tede zaf gıreyi çini. Ino kitab çendêk, kitabo verin ê hikayeyanê Zazaki bo hetê zıwan u uslub ra qasê xu xurt u zıxm o. Kitab dî ca ca zey ‘sere her, lacê kelpê kutikî, lacê kutikî u ha çüa mi, ha k... mi’ kelimeyi nengi u argoyi esti.⁶¹ Rına hikayeyan dî idyomi, vateyê verinan u duayi viyereni.

Çend hikayeyan dî yo-dî cayan dî cumleyi Tırki ameyi şıxulnayış. İni cumleyi goreyê şiyayışê hediseyanê hikayeyan yo kêmi niyi. Tıkê hikayeyan dî zey wali, hakım, esker u memur merdumi Tırki esti ya zi dewıcan barkerdo şiyi suk u sukan dî eğleb Tırki yena qalkerdiş. Ino semed ra nuştoği çend cumleyi Tırki şıxulnayı. Ino form ra yeno famkerdiş wextê qewımıyayışê hediseyan dî Zazayi xu miyan dî Zazaki qal keni, bêteyê memuranê hukmat u şari dî Tırki qalkeni:

(Merdimo Tırk vano) “He gardaş, bana zarari yoxtur, gelsin burdan gitsin.”⁶², “Ben bilmez hakım beg.”⁶³, (Hâkim vat) “Ama sen hep dertli şarki söylersin ve halkı duygulandırırın!... Böyle şarkıları söyleyenin suçu çok büyüktür, sen bölücülük yapıyorsun.”⁶⁴, “Marş, marş, ileri marş. / He yaşa, yaşa bizim paşa...”⁶⁵

Hikâyeyanê kitabi dî hetê hokê onayışan ra hiri hokê onayışi zi şıxuliyayi. Nuştoğ, zey *Mordemî Wextê Kanî* u *Bonê Miralî* tıkê hikâyeyan dî hokê onayışê temaşakeri, zey hikayeya *Her Çî Ju Sate De Bî* tıkê hikayeyan dî hokê onayışê qehremani, zey hikayeya *Wejir Axa* tıkê hikayeyan dî hokê onayışê İlahiyi şıxulnayo:

⁵⁹ E.n.v., r. 53, 7, 26, 47, 86, 108 u 135

⁶⁰ E.n.v., r. 13, 72 u 99

⁶¹ E.n.v. r. 28, 36, 101 u 119.

⁶² Astore, e.n.v. r. 11

⁶³ E.n.v., r. 38

⁶⁴ E.n.v. r. 92.

⁶⁵ E.n.v. r. 123 u 124.

“... Namê xu Memed Dede bî. Lesê ra zaf derg bi, ‘çimê xu u burîê xu girs u şa bî. Rîê xu endî qermeçâyî bî, rî rê’çu ra pîrr bî. Bejnê de zimelê xu yê qolindî jê porrê xu endî bibî sipî...”⁶⁶, “Mîralî ra veng nêvecîa, zaf nê’çar bî, bêkes bî, serm kerdenê.”, “Dorme, dugel, ca u meydonî pêro bine germe ticî de mend bî. Tic cor bereqienê u çeçer bîe ...”, “Alîê Manqîlî ke ‘tawa nêvat, ju polis şeweşîa ra, jukeke na dê pîro, pîrnika Alîê Manqîlî ra gon eşte.”⁶⁷

“Ez u misaîbê mi şîmê ke xo rê restoran de non biwermê. Seke çeber de kotîme zerre, garson ama, ma guret bîerd bostonê restorantî...”⁶⁸, “Mi namroce gurete, tey qait kerd.”, “Ma pêro sukît mendîme, veng nêkerd.”, “Di asmî îzina mi bîe. Ez şîo welat.”, “Roca ‘çarsemê mi bawula u çîê xu kerd hazir, pêroc ra têtîa sahate hîre de çe ma pêro pîa çe ra vecâyîmê teber.”⁶⁹

“Wejîr Axa xu ver qal keno, pîlanê viraceno, vano ez se bikerî ke, destê nî zalimu ra bixeleşî, nî mi benê ‘çale de qerqesune nane ra mi, mi kîsene, ya kî bene meydane suke de darde kene...”⁷⁰, “Îsmâîl nu qese guret zerrê xu, xora pers kerd vat: ‘Ez ‘ça mordemune xirabinê nîanenu ra rindîe bikerî ke, nî kî mi rê qesune gironu vacê.”, “Îsmâîl xo zerre de vatenê: Pîrnika xu berz a, berz a, berz a.”⁷¹

NETİCE

Wareyê edebiyatê modernî dî her mîlet ri yo proses esto. İni prosesi eğleb yobinan ra nızd yo xet dî eraver şîni. Edebiyatî modernî dî eseri verini zafyêr bêteyê klasik u modernî yo terz dî yenî nuştîş. İno sebeb ra nîmuneyanê verinan dî hetê terzê modernî ra yo sıstî u kemi esta. İno hal, edebiyatê Fransızan, Tırkan u Kurdan dî hîna bî, ê Zazayan dî zi hîna yo. Edebiyatî modernî ê Zazakî dî tewîranê şîir, hikâye u roman dî nîmuneyanê verinan dî ini kemi xu weşîa weşî ramocnenî; çunki edebiyatê Zazakî ri hîna yo tengî u zori estbî. Zazakî, yo wexto erey dî edebiyatî nuşteki dî eseranê xu verinan dona. Seba inay eseranê verinan ê modernan dî hetê tewîr, mewzu, teknik u tercihe alfabe eseri zaf zıxm niyî; labelê goreyê xu ini eseri hetê nîmuneyanê verinan u yo edebiyatî erêkote zıxm î. İna xebat dî eseranê Zazakî ê verinan ra kıtabo verin ê hikâye Cer Hard Cor Asmen metodê etudkerdîş ser ameyo daşinasnayîş. Kıtab dî verin dî 29 hikâyeyî esti. İni hikâyeyî heyato raştîkin ra bî yo çimo realist ameyî nuştîş. Kıtab, çendêk edebiyatî modernî ê Zazakî dî kıtabo verin ê hikâye bo rîna zi kıtab dî hewayê edebiyatê şari u materyalê edebiyatê şari xu ramocnenî.

ÇİMEYİ

Akman, İlyas, *Modern Zaza Hikâyeciliği 1*, Gece Kitaplığı, İstanbul 2018.

⁶⁶ E.n.v. r. 18

⁶⁷ E.n.v., 32, 73 u 96

⁶⁸ E.n.v., r. 99-102

⁶⁹ E.n.v., r. 49, 50, 53 u 56

⁷⁰ E.n.v., r. 133

⁷¹ E.n.v., r. 69, 70

Aldatmaz, Nadire Güntaş, “Kırmanccada (Zazacada) Modern Öykü”, *The Journal of Mesopotamian Studies, Special Issue on Zazakî and Zazas*, cilt: 5, Serr: 2020, r. 136-153.

Alver, Köksal, “Edebiyat, Sanat ve Toplum”, *İstanbul Üniversitesi Açık ve Uzaktan Eğitim Fakültesi*, İstanbul 2016.

Astare, Kemal, *Cer Hard Cor Asmên*, Weşanxaneyê Doz, İstanbul 1994.

Barthes, Roland, *Anlatuların Yapısal Çözümlemesine Giriş*, Gerçek Yayınları, İstanbul 1988.

Çetkin Muhammed & Dağılma İbrahim, “MODERN ZAZA EDEBİYATINDA ŞİİR, HİKÂYE VE ROMAN TÜRLERİNE DAİR TESPİT VE TAHLİLLER”, *Bingöl Araştırmalar Dergisi*, cilt: 6, humar; 2, serr: 2020, r. 7-41

Tikmi Piruşênê, “Dilimiz Kırmançiki Nasıl Yazılır. Kırmançikinın Alfabetesi” (Dersim Zazacası), *Desmala Sure*, humar: 11/1 Mart 94 u humar: 12/2 Haziran 94.

Salihpaşaoğlu, Yaşar, “TÜRKİYE’NİN DİL POLİTİKALARI ve TRT 6”, *Ankara Hacı Bayram Veli Üniversitesi Hukuk Fakültesi Dergisi*, Serr: 2007, cilt: 11/1, r. 1033-1048



MEKAN DI ROMANÊN KURDÎ YÊN SOVYETÊ DE: MÎNAKÊN *FINCANA FERFÛRÎ* Û *XATÊ XANIM*

Bahar ENÇ*

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi/Research Article

Makale Geliş Tarihi/Received: 10.06.2022

Kabul Tarihi/Accepted/: 01.07.2022

Atıf: Enç, B. (2022),

“Mekan di Romanên Kurdî yê Sovyetê de: Mînakên *Fincana Ferfûrî* û *Xatê Xanim*”,
Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 15, 40-53.

DOI: 10.56491/buydd.1128684

KURTE

Wek hêmaneke bingehîn a romanê, mekan ji bo honandina romanê rolek mezin dilîze. Di romanê de mekan ne tenê ew cih e ku bûyer lê diqewime. Ji bilî vê, fonksiyonên din yê mekanê hene. Wisa ku mekan bandoreke mezin li ser leheng û bûyerên romanê çêdike û di derbarê civak, aborî û takekesîya lehengan de xwîneran agahdar dike. Bi vî awayî xwîner dikare şîroveyan li ser romanê bike û bi teswîra meknan dikare bikeve nava jiyana lehengan. Li gorî cureya romanê, mekanên hatine hilbijartin jî di romanên de diguherin.

Ji bo destpêka romana kurdî Edebîyata Kurdî ya Sovyetê xwedî cihekî pêledar e. Lewre romana ewil li vir derdikeve û ew romanên li wir afirîne xwe dispêrin jîyana rastî. Bi vî awayî di wan romanên de mekan mekanên rastî ne û di derbarê wan meknan de nivîskar gelek agahîyan didin. Ji ber vê yekê di vê xebatê de em ê li ser du romanên Kurdî yê ewra Kavkazê rawestin. Em ê van her du romanên ji aliyê bikaranîna hêmana mekanê ve binirxînin û em ê ji aliyê bikaranîna hêmana mekanê ve berawirdîya her du romanên bikin. Romanên ji bo xebatê hatine hilbijartin; *Xatê Xanim* a Elîyê Evdilrehman û *Fincana Ferfûrî* ya Ezîzê Gerdenzerî ye.

Peyvên Sereke: Mekan, Roman, Romana Kurdî ya Sovyetê, Xatê Xanim, Fincana Ferfûrî

* Xwendevana Mastira Ziman û Edebîyata Kurdî, Zanîngeha Bingölê, gulbaharenc@gmail.com

orcid: 0000-0002-0029-9650

Kürt Sovyet Romanlarında Mekan; *Fincana Ferfûrî* ve *Xatê Xanim* örneği

ÖZET

Romanın temel unsurlarından biri önemli olan mekân, romanın kurgulanmasında önemli bir rol oynar. Romanda mekân, sadece olayların geçtiği yer değildir. Ayrıca, mekanın başka işlevleri de vardır. Öyle ki mekân, romanın kahramanları ve olayları üzerinde büyük bir etkiye sahiptir ve okuyuculara toplum, ekonomi ve kahramanların kişilikleri hakkında bilgi verir. Bu sayede okuyucu roman hakkında yorum yapabilmekte ve onlar kahramanların hayatlarına mekan betimlemeleri sayesinde girebilmektedir. Romanların türüne göre romanlarda seçilen mekânlar da değişmektedir.

Kürt romanının doğuşunda Kürt Sovyet edebiyatı önemli bir yere sahiptir. Çünkü ilk Kürtçe roman orada çıkar ve orada yazılan romanlar gerçek hayattan esinlenmişlerdir. Böylece o romanlardaki mekânlar gerçek hayatta var olan mekânlardır ve yazarlar bu mekânlar hakkında pek çok bilgi verirler. Bu nedenle bu çalışmada Kavkaz dönemine ait iki Kürt romanı üzerinde duracağız. Bu iki romanı mekânsal unsurun kullanımını açısından değerlendireceğiz ve iki romanı mekânsal unsurun kullanımını açısından karşılaştıracacağız. Bu çalışma için seçilen romanlar; Elîyê Evdilrehman'ın *Xatê Xanim* adlı romanı ve Ezîzê Gerdenzerî'nin *Fincana Ferfûrî* adlı romanıdır.

Anahtar Kelimeler: Mekan, Roman, Kürt Sovyet Romanı, *Xatê Xanim*, *Fincana Ferfûrî*

ABSTRACT

Space, which is one of the basic elements of the novel, has a great role for the fiction of the novel. In novels, the place is not just the place where things happen. Apart from this, the space has different functions. such that the place has a great influence on the event and the heroes. In addition, the place gives information to the reader about the society, economy and personalities of the characters in the novel. so that the reader can make comments on the novel and enter the lives of the characters with the descriptions in the novel. The choice of venue may also vary depending on the genre of the novel.

Kurdish Soviet literature has an important place for the beginning of the Kurdish novel. because the first novel in Kurdish is published there and the novels there are based on real life. The places in the novels in Soviet literature are real and the author gives a lot of information about the places in the novel. Therefore, we will work on two novels from Kurdish Soviet literature.

We will evaluate the places used in these two novels and compare the places used in the novels. We examine two novels for this study; Elîyê Evdilrehman's *Xatê Xanim* and Ezîzê Gerdenzerî's *Fincana Ferfûrî*.

Keywords: Places, Novel, Soviet Kurdish Novel, *Xatê Xanim*, *Fincana Ferfûrî*.

DESTPÊK

Roman cureyeke edebîyatê ye ku di dewra modern de derketîye meydanê. Wekî her cureyên edebîyatê roman jî xwedî taybetmeydîyên cuda ne û ji alîyê avahîsazîya xwe ve xwedî mantiqek cuda ye. Ji bo îzaha romanê gelek tişt hatine gotin û pênasayên cuda hatine kirin.

Tekin (2019:11) di pirtûka xwe ya bi navê *Roman Sanatî* de derbarê romanê de wiha dibêje; “Roman ji ber ku şîroveya jîyanê dike, dibe roman. Ango roman behsa jîyanê nake, jîyanê ji nû ve şîrove dike.” Bi vî awayî em dikarin bêjin roman herçiqas di bin sîwana jîyanê de be jî ji aliyê nivîskar ve hatîye çêkirin. Ji ber vê jî di romanê de ziman, cih, dem ji jîyana rastî cudatir in. Lê divê bê gotin ku hin roman di bin tesîra jîyana rasteqîn de dimînin. Bi gotineke din roman tiştan ji jîyanê distîne, li gorî mantiqa xwe saz dike û disêwirîne. Her wiha gelek cureyên romanên bi dûmahîya demê re afirîne û li gor dewra xwe şikl girtine. Weke ku Qabdolov (2007: 293) derdibire; “berhemeke edebî neynika rastîya civaka wê dewrê ye.” Dema em bala xwe didin romanên kurdî yên Sovyetê bûyerên di romanên wir de hatine hilbijartin ew bûyer in ku an tiştên di jîyanê de qewimîne an jî ew bûyer in ku qewimîna wan di jîyanê de pêkan e. Jixwe nivîskarên edebîyata kurdî ya Sovyetê berhemên xwe bi rêbaza Realîzma Sosyalîst dinivîsandin û ev rêbaz di wê armancê de bû ku jîyana rastî bikeve nava romanên wê dewrê.

Tekin romanê wek avahîyekê dibîne û li gorî wî; ji bo ku ew avahî saz bibe divê hin hêman hebin. Ji bo romanê ew hemû hêman pêwîst in û roman ji wan hêmanan pêk tên. Mekan jî hêmanek ji wan e ku bi hebûna xwe, derfetek mezin dide xwîneran da ku teswîrê bikin û bi di hişê xwe de mekanê bisêwirînin. Ji ber vê jî di romanên de hêmana mekanê di erka stûna romanê de ye. Aktaş (1991: 141) di derbarê mekanê de wiha dibêje; “ji bo bûyereke biqewime teqez cihek lazim e, lewre cih sehnaya bûyeran e.” Hê jî mekan ne tenê sehneya bûyeran e, di heman demê de mekan ji bo sazkirina bûyer û lehengan roleke mezin dilîze. Wisa ku mekan derbarê dem, çand û derdorê de jî agahîyan dide. Bi vî awayî em dikarin bêjin mekan dibin şahidê gelek tiştan.

Em ê di vê xebatê de du romanên kurdî yên Sovyetê ji aliyê bikaranîna mekanê ve lêbikolin û em ê bipeyîtî ku ka çawa mekan hatine bikaranîn. Ji ber ku lêhûrbûna li ser hemû romanên Sovyetê ne pêkan e, em ê tenê li ser du romanên rawestî ku romanên me ji bo xebatê hilbijartine *Fîncana Ferfûrî* ya Ezîzê Gerdenezî û *Xatê Xanim* a Elîyê Evdîrehman e. Armanca vê xebatê jî tesbîta mekanên herdu romana ye û pê re jî ji aliyê mekanê ve berawirdkirinek e.

Roman û Mekan

Wek avahîsazîyekê roman ji çend hêmanan pêk tê. Ji wan hêmanan mekan romanê vedike û wê derfetê dide romanê ku xwîner di wî romanê de asê nemîne. Ango bi teswîra mekanê roman zelaltir dibe. Wisa ku ji bo qewimîna bûyerên romanê cih lazim in. Ew cih carna eşkere ne carna jî ne eşkere ne. Lê çî nuxamtî û çî vekirî, di romanên de herdem hêmana mekanê heye. Lewre “mekan di cureyê wek romanê de ji tîrsa wendabûnê derdikeve. Mekan di

romanê de cihê wisa ye ku nivîskar ji pêvajoya demê ditirse û dixwaze ji wê tirsê bi saya mekanê xwe biparêze” (Korkmaz, 2017:11). Herwisa Şengül (2010: 529) di romanê de mekanê wek listîkvanekê dihesibîne û dibêje; “mekan di romanê de carna şahidê romanê bixwe ye û carna jî sînore derûnîya lehengan derdixe.” Jê cuda “Mekan, di berhemeke edebî de tenê ji aliyê binyadî, cih û dîmenî ve agahîyan nade. Herwiha statûya ew karakterên ku li wê mekanê dijîn radixe li ber çavan û di derbarê çanda wan de agahîyan dide” (Doğru, 2020: 331). Bi vî awayî em dikarin bêjin mekan wê derfetê dide nivîskar ku nivîskar zelaltir behsa derdora civakê û çandê bike û derûnîya lehengan şîrove bike. Derbarê mekanê de Yaşar (2012: 38) wiha derdibire; “Di her romanekê de bûyer bi mekanê ve tê girêdan û bi vî awayî bûyer di gel mekanê tê teswîrkirin.” Herwisa xwîner seyra bûyerê bi saya mekanê dişopîne. Ji ber vê jî mekan ji bo sêwirandina romanê rolek mezin dilîze. Tevî van Tekin (2019:65) mekanê wiha terîf dike; “Di romanên de ji bo ku bûyer şênber bibê mekan xwedî roleke mezin e. Nivîskar dema behsa mekana dike xwîner hêsantir fêhm dike. Wisa ku mekan ne tenê li ser bûyerê, di heman demê de li ser hêmanên romanê yên din jî bandorê çêdike.”

Divê bê gotin ku mekan di romanên de li gorî cureyên romanê jî diguherin. Di hin romanên de mekan çiqas mekanên rast bin jî nivîskar bi awayekî cuda wan dirêse. Bi gotineke din, “Mekanên ku di berhemên edebî de tînan afirandin nimûneyeke ji dinyayê ne ku bi fersenda ziman hatine sêwirandin” (Tepebaşılı, 2012: 70). Di hin romanên de jî nivîskar wan mekanan bi xwe diafirîne û ew mekanên hatine behskirin li ser rûye dinyayê tunene. “Ji ber vê yekê di berhemên edebî de hêmana mekanî jî wek hêmanên din li gorî daxwaza nivîskar şikil digire” (Kaynar, 2020: 27). Herwiha afirandina mekanan him hesta rastîbûnê dide berhemê him jî dikare rastî û xeyalê di nav hev de vehîne. Ji ber vê jî xwîner dema romanê dixwîne dizane ku ew qesr, koşk û odayên ku tînan vegotin di rastiyê de tunene. Hê jî “vebêjer gelek caran xwîneran bi wê tiştê dide bawerkirin ku mekan ji rastîya xwe ya fizîkî dûr ketiye” (Zambak, 2007: 1).

Derbarê mekanê de wek encam em dikarin bibêjin “mekan rih dide bûyerên romanê û hê jî mirov dikare bêje mekan axa berhemên edebî ye. Lewre roman jî mîna jîyanê nikare ji mekanê veqete. Herwisa mekan di romanê de wek nasnameya rewşa civakî ya lehengan e” (Kanoglu, 2017: 1). Di heman demê de mekan di romanê de ew cih e ku leheng tê de dijîn, xwe tê de dibînin û saya mekanan xwe bi xwîneran didin nasîn. Narlı (2002: 98) jî vê yekê wiha piştrast dike û dibêje; “Di romanê de bi rêya mekanê nivîskar lehengan dide nasîn û mekan hêmana bingeîn a bûyerê ye. Herwiha mekan tesîrê li ser derdora lehengan çêdike û psîkolojîya lehengan bi rêya mekana bi xwîneran dide ferqkirin.” Tekin (2017:137) armanca

bikaranîna meknan di romanan de bi çar xalan dide ku ew; Ji bo danasîna derdora ku bûyer lê pêk tê, ji bo xêzkirina lehengên romanê, ji bo nîşandayîna civakê û ji bo çêkirina atmosferê ne.

Mekan di Romana Kurdî ya Sovyetê de

Yekem romana kurdî di nav sînore Sovyetê de derdikeve meydanê. Ew roman romana Erebe Şemo ya bi navê *Şivanê Kurmanc* e. Ji pey damezrandina qeydê Sovyetê re, çawa seva hemû gel û neteweyên wî welatî, wisa jî ji bo kurdan mecal û îmkanê pêşdaçûyîne çêbûn.” (Boyîk, 2012: 9). Ji ber vê yekê Sovyet ji bo edebîyata kurdan bûye navendek edebî. Lewre nivîskarên Sovyetê li ku çî jîyabin di romanên xwe de ew tişt sêwirandine. Wek mînak “Romanoka *Şivanê Kurd* serhatya jîyana nivîskar e, çîroka zarotî û xortanya wî ye” (Boyîk, 2004: 31). Ango nivîskarên Sovyetê di bin tesîra jîyana resteqîn de mane û di romanên xwe bi wî awayî honandine. Li vira rola mekanê derdikeve pêş ku mekan bi awayek piralî derfeta naskirina civakan dide me. Lewra roman di pêvajoya çêbûna neteweyan de wek amûreke ragihandinê tê bikaranîn. Em dikarin bibêjin ku di romanan de şîrovekirina her hêmanê fikreke cuda dide me û bi hêmana mekanê jî em bi hêsani dikarin gelek şîroveyan bikin. Lewre mekan him rewşa serdemê him jî rewşa civakî a wê demê nîşan dide û bi vî awayî em dikarin şîroveya rewşa serdemê û rewşa civakî şîrove bikin. Herwisa bi mekanê nivîskar bala xwîneran zêdetir dikêşe ser jîyana rasteqîn. Di romanên kurdî yê Sovyetê de mekan derbarê kurdên Sovyetê de xwîneran ji gelek alîyan ve agahdar dike.

Romanên Kurdî yê Sovyetê nûnerê bizava realîzma civakî ne ku ew roman wek romanên ewil tînin hesabandin. Herwisa ew romanên ewil li ser pîrsgirêkên civakî bi zimanekî herikbar hatine nivîsîn û bi bandora sosyalîzmê, îdealên civakî û şoreşî jî wek mijar di romanên destpêkê de tînin dîtin. Di romanên Sovyetê de ji aliyê bikaranîna hêmanên romanê ve hevbeşiyek heye. Herwisa “mekanên di romanan de tînin dîtin jî di berhemên edebiyata kurdî ya Sovyetê de hevbeş in. Cihên ku di van berhemên de tînin behskirin çavkaniya xwe ji jiyana rasteqîn ya kurdên Sovyetê û rêbaza realîzma sosyalîst werdigirin û derencama rastiya wan a civakî û îdeolojîk in. Ji ber vê cihên ku di van berhemên de derbas dibin bi giştî gund in û piraniya rûdanan li gundan diqewimin û jîyana gundewarî tê îdealîzekirin” (Ergün, 2018: 141). Di romanên Sovyetê de wek mekan carna bajarên wek; Erîvan, Tiflîs, Moskova derbas dibe lê gelemperî leheng ji bo karekê diçe û dîsa vedigere gundê xwe. Ji bilî çend îstîsnayên wek romana *Fîncana Ferfûrî* ev bajar nabin navenda qewimîna rûdanan. Di romanên Sovyetê de wek mekan gundên hatine hilbijartin carna ew gund in ku berîya Şoreşa Bolşevîkê di bin hikumdariya axa û began de bûn ku leheng ji ber zulma wan ber bi Rûsyayê koç dibin û dîsa

diçin li gundan dijîn. “Berî Şoreşa Bolşevîk gund wek cihên zordariya sîstema feodal û zordestiya Romê tên nîşandan û di encamê de jî tên kavilkirin. Berevajî vê, gundên piştî Şoreşa Bolşevîk laboratuwarên bicihkirina bernameya damezirandinê ya sosyalîst in û navendên wekhevî, pêşketin û modernkirinê ne” (Ergün, 2018: 141). Di romanên de lehengên koç dikin gelemperî wek mekan gundan ji bo xwe hidibijêrin. Xwe ji bajaran zêdetir di gundan de dimînin. Lê di romanên de gundên Sovyetê gundên pêşketî ne. Wisa ku di wan gundan de Kolxoz tên avakirin, sêwîxane û xwendîgeh tên vekirin, kesên ji bo xwendinê diçin derveyî gund jî dema xwendina xwe xilas dikin dîsa vedigerin gundên xwe û ji bo pêşdeçûna civaka xwe dixebitin. Bi gotineke din romanên Sovyetê de gundên piştî Şoreşa Bolşevîkê kurd tê dijîn tên îdealîzekirin û wek mekan ew gund tên hilbijartin. Bi wî awayî em bi wan mekanan derbarê kurdên Sovyetê de agahîyan bi dest dixin.

Mekan di Xatê Xanimê de

Xatê Xanim novela Eliyê Evdilrehman e ku Eliyê Evdilrehman “yek ji wan nivîskarên pêşketir û sereke yê kurdên Kavkazê ye” (Döger, 2020:83). Herwisa romannûs, çîroknûs û helbestkar e. Mijara novela wî ya bi navê *Xatê Xanim* çîroka jineke netirs a Kurd e. Herwisa “Xatê Xanim (1959) li gor tarîxa weşanê wek romana yekem a dîrokî dikare bê binavkirin” (Adsay, 2013: 7).

Serlehengê romanê *Xatê Xanim*, mêrê wê Têmûr û kurê wê Sultan in. Têmûr heta dawîya emrê xwe rêbertiya eşîra xwe dike û hertim dijî zordariya feodalîzmê û romê bûye. Piştî mirina Têmûrê serok, Xatê Xanim dixwaze kurê wê bikeve şûna bavê xwe. Di romanê de Sultan ji bo gundîyan gelek caran rastî mirinê tê lê Xatê Xanim di romanê de di wê hewildanê de ye ku Sultanê kurê xwe ji nava lepên mirinê derxe. Xatê Xanim ji ber mijara xerc û xeracên dewleteke dagirker û girtina Sultanê kurê xwe serî li hemberî hêzên dagirker hildide, lê ev jin çî dike çî nake, bi zanayî û sîyaseta xwe ya ku– bi helwesta xwe ya nêzîkî aqilan – nahêle şer dest pê bike, lê digihîje merema xwe û kurê xwe ji mirinê rizgar dike. Di romanê de tişteke din ya balkêş ew e ku Xatê Xanim nahêle ku di navbera eşîrên kurd û hêzên dewletê de şerek mezin pêk were. Bi vê yekê tifaq û yekitiya kurdan jî tê îspatkirin. Herwisa kesayeta Xatê Xanimê de rola jina kurd di warê birêvebirina civakê de ye. Roman bi sadetiya honaka xwe, bi kurdiya xwe ya edetî ya xurt û bi mekanên di romanê de derbas dibe xwîneran dibe şahidî wan rojan dike.

Mekanên di romanê de hatine bikaranîn romanê xurttir dike û roman bi teswîrkirina wan mekanan watedartir dibe. Bi wan mekanan bûyer zêdetir balê dikişînin ser xwe. Wisa ku di

romana bi navê Xatê Xanim de çîya pir giring in û îmkana çêbûna yekîtiya Kurdan de rola serekî ya çiyayan e. Di romanê de çîya cihê şoreş û serhildanê ye. Civîn gelek caran li wan deran çêdibin û biryar li wan deran tên dayîn. Ji bo gundîyan çîya taybet in û ji bo wan çîya ew rê ne ku cihekê bi cihekê din ve girê didin. Di romanê de derbarê çiyayan pragrafek wiha rastî me tê;

Silsîleyên çiyayên Mêzakertê, Nazimiyê, Plumerê, Ovacixê, Kemaxê, Êgînê mîna zincîrên kotanê bi mircankî hatine hûnan. Tê bibêjî tebîetê qestane ew zincîr qetandîye û bi tenê li çend cihan îmkanê dide rêwiyan, ku ji qezayê mayîn bêne wê qezayê. (r.10)

Di romanê de mekan gelemperî Qezaya Dêrsimê ye. Nivîskar destpêka romanê de behsa hereme Kurdistanê, herêma Dêrsimê dike û wir wekî dîmenekê tîne ber çavan ku roman bi xwe wiha dest pê dike;

Qezaya Dêrsimê di Kurdistanê de qezayêke mezin e. (r.10)

Nivîskar pişt re behsa ji hezarî zêdetir gundên kurdên Dêrsimê û Çiyayên Dêrsimê dike. Nivîskar giringîyek mezin dide Dêrsimê. Di romanê de wihsa behsa Dêrsimê dibe;

Wexta ku bihar Li Kurdistanê Dêrsimê vedibe; çîya, meşe, gelî, rast û berpâl kirasên hêşîn î mexmerî li xwe dikin û dikimkimin. (r.11)

Bi van hevokan nivîskar xweşikîya Kurdistanê tîne ziman. Herwisa di romanê de herçiqas zêdetir herêma Dêrsimê derbikeve pêş jî nivîskar li ser vê herêmê, temamê erdnîgarîya Kurdistanê tîne ziman.

Xatê Xanim ji ber ku romaneke dîrokî ye, mekan jî ew mekan in ku di ser rûyê cîhanê hene û mekanên rastî ne. Bi saya wan mekanaan xwîner dikare xwe bigihîne gelek agahîyan û dikare şîroveya li ser bûyera romanê bike. Wek delîla vê yekê di romanê de em rastî wan gotinan hatin;

Tarîxa Dêrsîma Kurdistanê ya pirr qirnan heye, ku ferih dide kifşê şerkarîya mîletê Kurdan bo xweyîkirina wetenê xwe. (r.12)

Ji van cudatir di romanê de mekanên wek; Ezirgan, Çiyayê Êgînê, Gundê Sîncanê derbas dibin, ku bûyer li gundê Sîncanê diqewime.

Em ji Ezirganê tên û em ê herine gundê Sîncanê, mala Têmûr. (r.27)

Di romanê de mekanên hatine hilbijartin li gor nivîskar Kurdistan e û Kurdistan ji bo nivîskar mekana sereke ye. Nivîskar carna sînoren Kurdistanê bi xwîneran dide nasîn. Wisa ku di romanê de nivîskar bê rêya lehengekê wiha dibêje;

Hema hûn ghiştine Çiyayê Êgînê ew êdî Kurdistane qet metirsin. (r.27)

Di romanê de wek tevahî ev mekanane derbas dibin; Dêrsîm (gund û çiyayên wê), Ezîngan, Gundê Sîncanê, Çiyayê Êgînê, Çiyayê Girîdaxê, Çiyayên Mûnzûrê û Mîrcanê (wek nav), hin çîya û gundên din, qeymeqemtîya Dêrsîmê, qeymeqamtîya Ezîrganê, meydana gund, deşt, xanî, ode.

Di romana bi navê Xatê Xanim de mekan wê diyardeyê dide me ku bûyer berîya Şoreşa Bolşevîkê qewimîye. Lewre ew mekanên di romanê de derbas dibin di bin kontrola romê de ne û gundî di bin zilma romê de ne. Herwiha em bi wan mekanên di romanê de derbas dibin lehengan nas dikin. Li gor ku di romanê de derbas dibe li Ezînganê Ermen hene û li Dêrsîmê jî Kurd hene. Herwiha li gor romanê têkilîya kurd û ermenîyan heye. Lewre çûyîn û hatina wan ya bal hev tê nîşandan û di romanê de çiyayên di navbera gundên kurd û ermenan de wek mekanên baş tê nîşandan. Ew çiyayên ji bo romanê wek mekan hatine hilbijartin wek rêya di navbera kurd û ermenan de ne. Bi vî awayî mekan derfetek mezin dide xwîneran ku xwîner rewşa civakî ya serdemekê bizanibe û derbarê wê civakê de şîroveyan bike.

Mekan di *Fincana Ferfûrî* de

Di romanên kurdî yên Kavkazyeyê de ji aliyê bikaranîna ziman, mijar, mekan û şexsan ve gelemperî hevbeşîyek heye. Nemaze di romanên nivîskarên di heman serdemê de jîyane ev hevbeşî heye. Lewre “romana kurdî ya êwra Kavkazê di bi sîwana welatekî din de, bi ramana realîzma sosyalîst ve hatiye xemilandin û li derveyî axa welatê xwe bişkivîye” (Yavuzer, 2020: 213). Vê yekê jî li ser romanên wan tesîr çekirîye ku romanên xwe bi wî awayî bihûnin. Lê nivîskarên wek Ezîzê Gerdenezî ji ber ku nişeke cuda ne, guherîna ziman û mijaran di nav romanên wan de mimkun e. Di romana wî ya bi navê *Fincana Ferfûrî* de ev tişt li berçav e û “roman romanek romantîk e” (Yavuzer, 2020:71).

Serlehengê romana *Fincana Ferfûrî*, Têmûr û Meyrê ne ku bûyer zêdetir li ser wan tevdigere. Roman çîroka wan herdu evîndaran vedibêje. Herdu serleheng ji kurdên Kavkazê ne. Di romanê de Têmûr karakterek xwendî û welatparêz tê nîşandan. Meyrê jî keça kesek rewşenbîr e. Di nava romanê de tiştên gelêrî û kurdewarî tê dîtin. Wisa ku roman bi straneke gelêrî dest pê dike û gelek caran behsa *Mem û Zîn* a Ehmedê Xanê tê kirin. jixwe mirov di

honak û mijara romanê de şopgerîya *Mem û Zînê* dibîne. Têmur Meyrê di pîrozkirina Newrozê de dibîne, dilê têtûr dikeve Meyrê lê dawîyê de ji ber têsîra edet û toreyên kevneşopîyan nagihêjin hevdu. Kurtasî em dikarin bêjin ku di romanê de jîyan û evîna du ciwanên kurd li Sovyetê tê behskirin. Herwisa roman bi giştî li ser nakokîyên kesayetîyan, şaşîyên kevneşopîya kurdan radiweste û gelek caran jî ew kevneşopî têt rexnekirin.

Di romanê de beravajî ya romanên din ên Kavkazê mekanên sereke ne gund, herwiha bajar in. Leheng ji ber hin sedeman diçin gundan lê dîsa vedigerin bajaran. Di romana *Fîncana Ferfûrî* de mekana sereke Yêrîvan e. Yêrîvan bajerek mezin e ku tê de zanîngeh hene û lehengên wê romanê ji ber xwendinê çûne wir û li wir dîjîn.

Tarî wekî derxwîna hikiyatî, derxwîna efsanevî, a beser û bêbin, xwast zikak û kolanên Yêrêvanê binixêve. (r.11)

Nivîskar dema bi van gotinan behsa Yêrêvanê dike wê derfetê dide xwîneran ku xwîner teswîra wê mekanê bike. Di heman demê de bi wan mekanaan û bûyeran em tê digihîjin ku wext piştî Şoreja Bolşevîkê ye. Ev jî dibe delîla vê yekê ku bi saya mekanaan xwîner dikare hînî wextê bûyera romanê jî bibe.

Mekanên di romanê de ew mekan in ku li ser rûyê cîhanê hene. Ango mekanên hatine tercîhkirin gelemperî mekanên rastî ne. Bi wan mekana xwîner wan cihan nas dikin û bi teswîrkirina wan mekanaan xwîner dikare bi hişê xwe li wan cihan bigerin. Di romanê de mekanên ji aliyê nivîskar ve hatiye afirandin jî têt dîtin lê nivîskar bi zimanek zelal wan mekanaan teswîr dike û xwîner bi hêsanî dikare wan mekanaan di hişê xwe de jîndar bike. Wek mînak di romanê de wiha derbas dibe;

Mala bavê Miraz li bajereke deştê bû. Avayîya wan wekî qesreke qedîm, bilind û bedew bû. Li dor avayîya dar û rez, bexçe û bostan bûn; darên cil û bergên keskîn li wan û kulîlkên xemilrengîn wekî qîz û bûkan, li ber ba serê xwe bi kaw dihejandin. (r.129)

Di romanê de bûyer gelemperî li Yêrêvanê diqewimin. Li gorî bûyera romanê mekanên ji bilî bajarê Yêrêvanê mekanên wek Tbilîs, Moskov, Qazakistan, Bakûya Azerbeycanê jî têt dîtin. Di romanê de derbarê wan mekanaan de em rastî van gotinan têt;

Di pê hatina ji Qazaxîstanê re, çend rojan ez li gund bûm. (r.70).

Bi dîtina min ev kom û degbêj ji Tbilîsê ne. (104)

Bi vê hevoka dawî de qasî nivîskar bixwe jî şîrove dike bi mekanê em lehengan nas dikin. Ango mekan gelek caran şexsa bi xwîneran dide naskirin.

Meyrê pir ji bajarê Bakûyê hez dikir. Bakû jî wekî Yêrêvanê bajareke qedîm û bedew bû. Taxên herdû bajêran ên nû, wekî hevalcêwîyên hev du bûn. Ev pêcî şêst sal bû, hem Bakû, hem jî Yêrêvan hêlînên biratîya gelan bûn; tu kesî ji ên din pirs nedikir: tu ji çi melatî an çi dînî, an çi qebîle yî. Xem û xeyala bingehvanên her du bajarên, ew şênkirina jîngeha xwe bû.(r.58).

Nivîskar di fikrên xwe yê li ser herdu bajarên wiha şîrove dike. Wisa ku ne bi rêya lehengan, bixwe fikrên xwe vedibêje û di derbarê sînor û pêwendîya du bajarên de agahîyan dide xwîneran. Xwîner bi derbirînên nivîskar pê derdixe ku Bakû û Yêrêvan du bajarên mezin û nêzî hev in. Herwisa çûyîn û hatina di navbera her du bajarên hêsan e. Di heman demê de nivîskar bi xwîneran dide hîskirin ku mekan bandorê li ser karakteran jî dike.

Fîncana Ferfûrî ji alîyê mekana ve romanek dewlemend e. Ango mekan zêde ne û li gor qewimîna bûyera romanê bala xwîneran diguherîne. Xwîner bi mekanaan xwe di rêwîtiyekê de dibînin. Di romanê de tevahî ev mekan tên dîtîn; Yêrêvan, Bakû, Qazaxîstan, Moskov, Tbilîs, gundê Têmûr, gundê Miraz, Mala bavê Meyrê, mala bavê Miraz, Zanko, Înstîtû, Fakulte, Sivdera Zankoyê, Razanxane, balafirgeha Bakûyê, restoran, nexweşxane, Gola Qubeqaza, îstasyona trêne. Ev hemû mekane di romanê de bi awayek vekirî hatine teswîrkirin û bi saya wan mekanaan derbarê leheng, rewşa civaka serdemê û pêwendîya kesên li wê civakê de agahî tên bidestxistin.

Cudabûna Mekanên di Romana Fîncana Ferfûrî û Xatê Xanimê de

Elîyê Evildrehman û Ezîzê Gerdenzerî du nivîskarên êwra Kavkazê de ku ji bo edebîyata kurdî xebatên wan berbiçav in. Elîyê Evdîlrehman wek nifşê ewilîn yê êwra Kavkazê ye lê Ezîzê Gerdenzerî endamê nifşeke piştî Elîyê Evdîlrehman e. Ev cudabûna bêguman di berhemê wan de jî derdikevin pêş.

Di edebîyata kurdî Kavkazê de, piştî romana *Şivanê Kurmanca*, romana *Xatê Xanim* tê nivîsîn (Yavuzer, 2020: 61), ku ew roman wekî me li jorê jî gotibû yekem romana dîrokî ya kurdî ye. Herwiha roman behsa çîroka jineke wêrek a kurd dike û tê de şer û rizgarî tê dîtîn. *Fîncana Ferfûrî* jî romanek romantîk e ku çîroka du evîndaran têde tê neqilandin û têde nakokîyên kesayetîyan, şaşîyên kevneşopîyên kurdan hene. Her du romanên de du mijarên cuda hatine bikaranîn. Lê di her du romanên de jî pirsîgîrîyên civata kurd hatine bilêvkirin. Di her du

romanen de tiştê hevpar vêgêran e ku di her du yan de jî vêgêran vegerana îlahî ye. Ango di her du romanen de jî nivîskar hakimê hertiştî ye. Yek ji hevparbûna herdu romanen rastîya civakî ye ku xwîner di romanen de realîteyekê dibîne.

Lê di romanen de wext, qedroya şexsa û mekan cuda ne. Di *Xatê Xanimê* de bûyer berîya Şoreşa Bolşevîkê ye lê di *Fincana Ferfûrî* de bûyer piştî Şoreja Bolşevîkê ye. Di *Xatê Xanimê* karakter kêr in û gelemperî karakter gundî, serokê eşîrê, rîspî ne. Lê di *Fincana Ferfûrî* de leheng; xortên xwendî, rewşenbîr û dixtor in. Di her du romanen de jî mekan mekanên rastî bin jî ji hev cuda ne. Lewre *Xatê Xanim* romanek realîst e ku di romanên realîst de “girîngîya derûdor û fîzîkî zêde ye” (Karaca, 2006: 74). Lê romana *Fincana Ferfûrî* jî romanek romantîk e ku nivîskar di romana xwe de mijareke evînîyê hîlbijartîye.

Nêrîna Romantîk mekanê îdealîze dike. Di berhemên wan de mekan wek cihekî ku tenê lê tê jiyîn wêdetir wek cihekî ku taybet hatiye çêkirin tê dîtin (Kaynar, 2020: 40). *Fincana Ferfûrî* de ev hevoka “*Meyrê pir ji bajarê Bakûyê hez dikir. Bakû jî wekî Yêrêvanê bajareke qedîm û bedew bû*” (r.58) vê yekê îspat dike. Herwisa Miraz Meyrê ji bo ku li bajar bijî direvîne. Bajar di vê romanê de hatîye îdealîze kirin.

Di *Xatê Xanimê* de behsa teswîra gundekê wiha tê kirin;

Navê wî gundî Sincan bû, ku bi bax û rezan ve mîna bûka Kurdan a bi xelî hatibû xemilandin. (r.12)

Di navbera romanên dîrokî û yê ku mijara xwe ji serdemên modern digirin, ji aliyê bikaranîna mekanê ve cudahî hene. Lewre “di romanen de hîlbijartina mekanan li gorî dewr û rêbazan ji hevdu cuda dibin” (Karaca, 2006: 71). Wisa ku romana *Xatê Xanim* romanek dîrokî ye û *Fincana Ferfûrî* jî mijara xwe ji serdema modern girtîye. Nivîskarê romana dîrokî mekanên ku nedîtiye û çavdêriya wan nekiriye, mekanên ku di rabirdûyê de mane an jî yê ku ji rabirdûyê heta îro hatine û di xeyalê xwe de çêkiriye dixwaze li gorî dema îro fehm bike (Kaynar, 2020: 40). Ji ber vê yekê em dikarin bêjin romana *Xatê Xanim* di wê hewlê de ye ku bi mekanê resen û bi atmosfera serdema ku tê behskirin bi xwîneran bide hesîn. Herwisa bi romanên dîrokî di navbera mekan û erdnîgarîyê de xwîner agahîyan bidest dixin. Di heman demê de hemanên erdnîgarîyê yê wek çiya û deşt an, carna di asta lehengan de carna jî wek şahidê bûyeran tên teswîrkirin. Di romana *Xatê Xanim* de di vê hevokê de mekan dikare bibe şahidê bûyeran.

Ez hatime ser wê fikrê ku bila îro êvarê çar sed pênc sed siwarên me herin nave meşeyên Çiyayê Egîne, yê ku dikeve rojhilata Ezirganê (r.30).

Di romana Fîncana Ferfûrî de ji romana Xatê Xanim cudatir bandora mekanî ya li ser derûniya mirovan heye. Lehengên romanê bi hin mekanan xemgîn, bi mekan jî şa dibin. Wek mînak;

Wextekî, me her duyan jî, li ser vê kursiyê, xwe bextewar û dilşad didît. Hingê di wê demê de, min ew wekî horî û perî hesab dikir. A niha hertişt hatîye hatîye guhastin. (r.179).

Ev hevokên ku di romanê de derbas dibin nîşanê me didin ku di Fincana Ferfûrî de leheng di bin tesîra mekanan de dimînin. Ango roleke mekanê heye li ser derûniya lehengan.

Ji ber cudabûna rêbazên herdu romanên, mekanên hatine hilbijartin ji hevdu cuda ne. Wisa ku mekanên romana Xatê Xanim; gund û çîya ne. Lê di Fincana Ferfûrî de mekanên wek; Bajar, deşt û kolan hatine hilbijartin. Di her du romanên de jî mekan jîyanê nîşan didin û bi saya teswîran ew jîyan di hişê xwîneran de tînin xêzkirin.

ENCAM

Mekan ji bo kîpûna romanên hêmaneke sereke ye ku bi hebûna xwe ji hêmanên romanên ên wekî leheng, bûyer, dem û hwd re jî dibe palpişt. Di edebiyata kurdî ya Sovyetê de jî romannûsên li wir li gor rêbaza Realîzma Sosyalîst romanên xwe dinivîsandin û zêdetir mekanên rastî û şênber bi kar dianîn. Herwiha romanên Kavkazê ji bo ku bi vê rêbazê hatine nivîsîn, ji xwîneran re agahiyên dîrokî didin û nûnertîya leheng û civakê dikin.

Ji bo vê xebatê re bibe mînak me du romanên Kavkazê hilbijart û me ji aliyê mekanê ve herdu roman lêkola û da ber hevdu. Weke ku me tespît kir, me ji romana Xatê Xanim pê derxist ku nivîskar wek mekan gund û çîyayan tercîh kirîye. Herwisa ji ber ku ev roman romaneke dîrokî ye û bi terza realîzmê hatîye nivîsîn, mekan ew mekan in ku li ser rûye cîhanê hene. Bi vî awayî roman bi mekanan xwîneran dike şahidê wan bûyeran û bi saya wan mekanan mirov wan cihan nas dike. Divê xebatê de piştî romana Xatê Xanim, di derbarê mekanên Fincana Ferfûrî de jî agahî hatin dayîn. Di romana Fincana Ferfûrî de hat dîtin ku wek mekan beravajî romana Xatê Xanim, ji bo mekanên romanê bajar hatine tercîhkirin. Lehengên romanê li bajaran dijîn, diçin gunda lê dîsa vedigerin bajaran. Di dawî xebatê de ji aliyê bikaranîna mekanê ve her du roman hatin berawirdkirin. Ji aliyê bikaranîna her du romana de em gihiştin van encaman;

-Xatê Xanim romanek bi terza Realîzmê hatîye nivîsîn. Ji ber vê jî di wê romanê de mekan mekanên sekan in û di mekanan de aîdiyeteke heye. Lê di romana Fincana Ferfûrî de

şopên romantîzmê tên dîtin. Ji ber vê jî di romana Fincana Ferfûrî de mekan tên îdealîze kirin. Li gorî romanê xweştirîn mekan ew mekan in ku leheng lê dijîn. Dema Lehengên romanê ji wê mekana xwe dûr dikevin xerîbîya wê dikişînin.

- Xatê Xanim romanek dîrokî ye. Ji ber vê jî romana Xatê Xanim di wê hewlê de ye ku bûyerên rabûrdûyê bi rêya mekanaan bi xwîneran bide fêmkirin. Fincana Ferfûrî mijara xwe ji serdema modern girtîye. Mina Xatê Xanim ne dîrokî ye. Mekanên Fincana Ferfûrî tesîrek mezin li ser derûnîya lehengan çêdikin.

Di Xatê Xanimde mekan gund û çîya ne lê di *Fincana Ferfûrî* de mekan bajar û kolan in. Lê her du roman jî bi teswîran, mekanaan bi xwîneran didin nasîn û di derbarê serdem û civakê de jî agahîyan didin. Wisa ku em bi mekanên romana *Xatê Xanim* ferq dikin bûyer berîya Şoreşa Bolşevîkê qewimîye. Mekanên romana *Fincana Ferfûrî* jî bi me dide zanîn ku bûyer piştî Şoreja Bolşevîkê qewimîye.

ÇAVKANÎ

AKTAŞ, Ş. (1991), *Roman Sanatı ve Roman İncelemesine Giriş*, Akçağ, Ankara.

BOYİK, E. (2012), *Çanda Kurdên Sovyetê*, Deng, Istanbul.

BOYİK, E. (2004), *Nûra Elegezê, Çend dîdem ji edebyeta Kurdên Ermenistanê*, Dengê Êzîdîyan, Oldenburg.

DOĞRU, M.S. (2020), Zaman ve Mekân Bağlamında Bir Zamanlar Anadolu'da Filmini Bahtin'in "Kronotop" Kavramıyla Okumak, *International Journal of Cultural and Social Studies*, h.6.

DÖĞER, D.(2020), *Destpêka Romana Kurdî*. Romana Gundê Mêrxasan û Teknik û Şeweya Elîyê Evdîlrehman a Afîrandina Tîp û Karakteran, Peywend, Van.

ERGÜN, Z. (2018) Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê, Mukaddime, Mardin.

EVDILREHMAN, E.(2012), *Xatê Xanim*, Lîs, Dîyarbakir.

ADSAY, F.(2013), *Romana Kurdî (Kurmancî) Ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname (Teza Mastirê ya Neçapbûyî)*, Mardin.

GERDENZERÎ, E.(2015), *Fincana Ferfûrî*, Lîs Diyarbakir.

KANOĞLU, B.(2017), *Hasan Ali Toptaş'ın Hikâye ve Romanlarında Mekân Algısı*, (Teza Mastirê ya Neçapbûyî), İstanbul.

KAYNAR, C. (2020), *Hêmana Mekanê di Romana Kurdî de: Mînakên Mijabad, Labîrenta Cinan û Gerîneka Guernîcayê*, (Teza Mastirê ya Neçapbûyî), Muş

KORKMAZ, R. (2017). *Romanda Mekânın Poetiği, Romanda Mekân*, Akçağ Yayınları, Ankara.

NARLI, M (2002) Romanda Zaman ve Mekan Kavramları, Balıkesir Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, C.5, H.7, Balıkesir.

ŞENGÜL, B. (2010), Romanda Mekân Kavramı, Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi(The Journal of International Social Research), 3/11 Spring.

TEKİN, M. (2019). *Roman Sanatı 1- Roman Unsurları*. Ötüken Yayınları, İstanbul.

TEPEBAŞLI, F. (2012). *Roman İncelemesine Giriş*. Çizgi Kitabevi Yayınları, Konya.

YAŞAR, H. (2012), Ahmet Ümit'in Beyoğlu Rapsodisi'nde Mekân Olarak "Beyoğlu", Çukurova Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, C.21, H.2, Adana.

YAVUZER, M.(2020). *Destpêka Romana Kurdî*. Panaromaya Nasnameya Neyeweyî di Romana Êwra Kavkazê de, Peywend, Van.

ZAMBAK, F.(2007), Türk Romanın da Mekan (Teza Mastirê ya Neçapbûyî), Muğla.



ÇOLİG Dİ KULTURÊ ZEWAC U VEYVEYİ

Abdulkerim BOR*

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi/Research Article

Makale Geliş Tarihi/Received: 10.06.2022

Kabul Tarihi/Accepted/: 30.06.2022

Atıf: Bor, A. (2022).

“Çolig Dı Kulturê Zewac U Veyveyi”,

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 15, 54-72.

DOI: 10.56491/buydd.1128709

Xulasa

Yew kultur ki bêwahar mend, hedi hedi bediliyeno u çend wext dima riyê ‘erdan ra dariyen we. Ina xebat dı armancê ma Çolig dı ‘edetane zewac u veyveyê Zazayan sêni benu u kamcı yo seramonıyan ra viyerenu, ma waşt biyar çıman ver. Rıdê qedexeyanê tewıran, problemanê elifbaya standart u derheqê Zazaki dı kemiye musnayışê formali ra, ino zıwan u kultur dı eseri nuştekiyi yew mertebeyo zerrwaz dı nêyi. Pey tesirê globalizasyon zi orf u ‘edetê Zazayan ameyi virkerdış u neqıkerdışê ina sermayeya kulturi zi benu çetin.

Xebat dı, hevêr çerçewayê des hebi persan dı ma gêyrayi kulturê zewac u veyveyi Çolig, şıma ri bıdı sınaşnayış. Tiya dı derheqê wext zewac, zerrkotış, qal guretış, keyna remnayış, keyna waştış, qalın bırnayış, nişun runayış, ciyez êrnayış, şewa heneyi, marı bırnayış, rojê veyveyi ser melumat diyenu.

Dıma pêy qısmêk terminolojiyê zewac u veyveyi ma ra çend nımunêyi yew bı yew ameyi izehkerdış. Ino qısmı dı çend hebi terimê zewac u veyveyi, çend hebi zi ritueli veyveyi muhim ameyi nuştış. İni ritueli veyveyi ma, çendêk ca ra ca bediliyayi zi hema cuyê dew u bajaran dı dewom kenı. Peyni dı zi ferhengekê merdımati ra behs biyu. Çunki yew zewac dima benateyê hetê keynek u hetê lacêk dı merdımati peyda bena. Tiya dı ma waşt biyayışê ina merdımati dı kam benu çıtayê kam, ma ino terminoloji bımus.

Çekuyi Muhimi: Çolig, zewac, veyve, kultur, ‘usul

* Talebeyê Doktora, Qısimê Zıwan u Edebiyatê Zazaki, Üniversiteya Bingoli, kerim_liva_12@hotmail.com, **orcid:** 0000-0002-9518-7546

Bingöl'de Evlilik ve Düğün Kültürü

Özet

İhmal edilen kültürler yavaş yavaş değişir ve bir süre sonra ortadan kalkar. Bu çalışmada Bingöl'de yaşayan Zazaların evlilik ve düğün adet/geleneği nasıl olmakta ve hangi aşamalardan geçmektedir, bunu gözler önüne sermek amaçlanmıştır. Çeşitli kısıtlama, standart alfabe sorunu ve Zazaca'nın okullarda formal bir öğretiminin olmayışı gibi nedenlerle; bu dil ve kültüre ait yazılı eserlerin mevcudu arzulanan düzeyde değildir. Küreselleşmenin de etkisiyle Zazaların gelenek ve görenekleri unutulmakta ve yeni nesillere bu kültürel sermaye aktarılamamaktadır.

Çalışmada öncelikle on soru çerçevesinde Bingöl'deki evlilik ve düğün kültürü tanıtılmaya çalışılmıştır. Evlilik zamanı, âşık olma, söz alma, kız kaçırma, kız isteme, başlık parası, nişan, çeyiz, kına gecesi, nikâh kıyma ve düğün gecesi gibi konular hakkında açıklayıcı bilgiler verilmiştir.

Daha sonra evlilik ve düğün terminolojisiyle ilgili bazı sözcükler açıklanarak izah edilmeye çalışılmıştır. Evlilik kültürüyle ilgili bazı önemli terimler ve düğün esnasında yepilâgelen bazı ritüeller açıklanmıştır. Bu âdetler yer yer değişse de halen köy ve kent yaşamında varlığını sürdürmektedir. Son olarak ise akrabalık sözlüğü/terminolojisi listelenmiştir. Çünkü evlilik sonrası kız tarafı ve erkek tarafı arasında bir akrabalık ilişkisi oluşmaktadır. Burada amaç oluşan bu akrabalık ilişkisiyle meydana gelen terminolojiyi kavramaktır.

Anahtar Sözcükler: Bingöl, evlilik, düğün, kültür, gelenek

Marriage and Wedding Culture in Bingöl

Abstract

Neglected cultures gradually change and disappear after a while. In this study, it is aimed to reveal how the marriage and wedding customs/traditions of Zazas living in Bingöl are and what stages they go through. Due to various restrictions, the standard alphabet problem and the lack of formal teaching of Zazaki in schools; The availability of written works belonging to this language and culture is not at the desired level. With the effect of globalization, the traditions and customs of the Zazas are forgotten and this cultural capital cannot be transferred to the new generations.

In the study, first of all, marriage and wedding culture in Bingöl was tried to be introduced within the framework of ten questions. Explanatory information was given on subjects such as marriage time, falling in love, taking the promise, kidnap the girl, want a girl, bride price, engagement, dowry, henna night, wedding ceremony and wedding night

Later, some words related to marriage and wedding terminology were explained and tried to be explained. Some important terms related to marriage culture and some rituals that are practiced during the wedding are explained. Although these customs have changed from place to place, they still exist in rural and urban life. Finally, kinship terminology has been mentioned. Because after marriage, there is a kinship relationship between the girl's side and the boy's side. The aim here is to grasp the terminology that occurs with this kinship relationship.

Keywords: Bingöl, marriage, wedding, culture, custom

DESTPÊK

Tayê ‘edet, tore u ‘usuli ma esti, biyayış ra hettani inkê ca ra ca bediliyayi u xu hewılneyi hettani mı roj. Ini ‘edeti pirikan u pilani ma ra mēndi u amēy hettani eyro. Mıletê Zazayan/Dımıliyan miyan dı cayê ‘edet u toreyan zaf muhim o. Her çiqas bajar ra bajar bediliyayi zi, tesirê yını inkê zi dewom kenu. Tiya dı zi ma waşt zewac u veyveyanê Zazayan ê Çoligi bide sınaşnayış. Feqet Çolig dı ‘edete veyve u zewac seri tesirê din u şeri‘at zi zaf giran o. Weharê veyveyi egleb goreyê usulanê dini hereket keni. Helbet veyvı ra veyvı zi ferq estu.

Tayi merdımın gueri İslamiyet dı musiki heram o, ayê ra mı merdımı veyvê xu dı def u zel nêcenêni. Tayi merdımın zi gueri cini u camiyêrd namehremi, o rıde ra cini nêamêni cayê govendê camerdan u yew binan dı govend nêkerdêni, destê yew binan nêkotêni. Cayê ciniyan u camerdan ciya ciya bêni.

Ziya Gökalp yew eserê xu dı vano “Zazayi hetê Edebiyatê Şari ra feqir i, Kurmancan miyan de zi Edebiyatê Şari zaf zengin o”.¹ Gökalp ina rez dı fikr xu vato, feqet mı fikr dı neheqi esta. Çunki Zazayi orf, ‘edet, kultur u edebiyat dı goreyê xu yew mıletta dewlemend a. Ma eşkêni vajı Edebiyatê Şari Zazayan hetê vıstanikan, kılaman-lawıkan, meselan, vateyê verinan dı dewlemend o. Feqet mıletê Zazayan dı ridê coğrafı, tarixi u siyasi sebeban ra nuştış çini bı ayê ra mı letê edebiyat zi fek ra fek ame, xu rasnê hettani mı roj. Inê ra ma eşkêni vajı Edebiyatê Fekki (sözlü edebiyat) dı hefizyê mıletê ma zaf qayım o. Pa inanı wa roman u helbest dı waziyetê edebiyatê Zazayan şednayı niyu. Labele mı serranê peyinan dı helbest u romanın zi ser gelêk xebat u kitab zi amey nuştış. Kurmanc, hetê nıfus ra zêd i u edebiyatê Kurmancki dı wexto verin ra gelêk eseri nuştıyê mendi. Ini sebeban ra edebiyatê Kurmancan, edebiyatê Zazayan gueri qısmêk dewlemend o u aver şıyo.

Ma helagi derheqê lawıkan/deyiran Zazayan ser qısey bıkerı, gereka ma zewac u veyveyê yını ra zi behs bıkerı. Çunki lawık, kılam u deyirê zıwanê Zazaki, ziyedi ra nişan u veyve dı yeni vatış. Hunermendi mı rojan dı lawıkani xu vani, cini u comiyêrd, meymanê veyveyi pêy mı lawıkan govend kaykeni. Yan zi merdimê ki deyiran u lawıkan weş zoneni, piyorê meymanan ra vêr vateni u govendger i binan zi fekê yın ra guretin, dıma dıla/tekrar kerdini. Inı qeydı der u ciran, dor u nêr bêni şa u veyvı ra zewq/keyf gurêtin.

Çerçewayê çend persan dı ma ‘edet u toreyê zewac Zazayan-Kırdan bıdı sınaşnayış;

1. Goreyê ‘edet u toreyê Zazayan wextê zewac keyna u lacekan kêyi yo?
2. Keynek vinayış u qal guretiş sêni benu?
3. Remnayışê keyna (cini) dı mesele sêni bena weşi?

¹Ziya Gökalp, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınlar, İstanbul, 1992, s. 27

- 4.Cini (keyna) sêni yena waştış?
- 5.Qalın bınayış (heqê şit) çmê yo?
- 6.Nişumı dı çıta niyenu ru?
- 7.Ciyez (cêz) êrnayış u ciyez ravıstış sêni benu?
- 8.Şewê heni dı se kêni?
- 9.Roj veyveyi (dawet) sêni viyerenu?
- 10.Terminolojiyê zewac-veyveyi ma dı çı çeku esti?

1. Kulturê Zazayan Dı Wexti Zewac

Zazayan miyan dı keye (aile) zaf muhim o. Inê ra wext keynek u lacekan ame zewaci; babi u dadi mi qıjan, qayili xortani xu bızewicn, wazifê xu biyar ca u muradê qıjani xu bıvini. Vatê pilan, pirikanê ma guerı wextê zewaci xortan çaryes-puncyes (14-15) o. Lacek yan zi keynek biamên 14-15 serrı, wurıstış u runıstışê yın bedıliyêni, gureyê keyi kerdên, xel -xereketê qıjti caverdên. Yani lacek bini xortê zewac, keynek zi bini keyneyê zewac. Feqet ma nêşkeni vajı wextê zewac illa çaryes yan zi puncyes o. Guerê waziyetê lacek u keynek, zewaci yın rêy rêy ro, rêy rêy zi erêy bini. Mesela dadi u babi keynek bımerdêni se dor u ner ê yê gêreni keynek ro bızewicn, yê bêwahari ra bıxelisn u waharê yew keye kerı. Xortıg dadiyê yı bımerdên yan zi yew nêweşıya giran bıguretên zewacê lacêk kowtin verni u lacek ro zewicnêni. Çunki ciniyê lacêki (veyv) hem mıqatê vısturiyê xu beni hem zi kar u gurê keyi kerdeni. Tayi lacekan rıdê leşkeri/eskerayi ra zewacê xu eştin peyni u badi leşkeri zewicyêni. Xortı ki leşkeri dıma zewicyeni qert hesibyêni, keyna zi bıbên vist serrı kıyedmendı hesibyêna. Ma eşkêni vacı Çolig dı serrê zewaci normal, ho benatê 14 u 20 serran dı.

“İna mıntıqa dı keynêk vaci ma qayil bızewij u in vatê xu biyari fek, şar het dı qetiyyen hol nêsen u ‘eyb hesibyen. Derheqê zewac dı heqê qerar dayış keynan dı qısmen estu. Keynêk nêşkêni vaci ma qayil filan lacêk dı bızewij. Feqet yew lacek tı ra vaj ez qayila tu dı bızewij, mı wext dı keyna eşkena qewil bıkir niyuz qewil nêkir. İni heqê keynek estu. Yew keyna vacı ez qayila bızewij, şari yê şeqıznen u pêy kay kenu. Feqet tayê dewan dı keynêk berran pita racınêni, pêy mı xerekêt xu vani, wext zewacê mı ameyo. Hun cı piyorê dewan dı keynêk waştış zewacê xu pêy fek tıver nêdani. İni usul piyorê dewan dı inawu...Yew xortıg biyer wextê zewac u bıgêr in niyêti xu biyar dadi-babi xu vir, çend metodan şuxulnenu. İni metodan ra en vilanayı (yaygın) ino ki dadi-babi xu ra timo tim behsê şiyayış ğurbêti kenu. Ta ye cayan dı bıneına xereketi xususi kuweni ma çım. Çankırı dı xort qunderê dadiyê xu verniyê berr dı mıx kenu, geyrenu ameyış wexti zewaci xu biyar dadiyê xu vir. Wext verin dı inı ‘edêti ina mıntıqa dı şuxulyêni feqet inkê zaf nêseni.”²

²Y. Cemalettin Çopuroğlu, “Fırat Havzası Evlilik Kültürü I: Düğün Öncesi” Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Cilt: 10, sayı: 2, Elazığ, 2000, s. 167-168

Xortiq zewicya benu sermunê keyi, miyan cem'at dı hurmet vinenu. Çend serrı benu wa bıwu hini qij nêhesibyenu, qıymet genu. Ciniya zewıcnayı zi hini bena waharê keyi u vatê camiyêrdi xu kena.

Serranê verinan dı keynek u lacêk bıamên wextê zewac, dadi u babi waştin ym bızewicn u tornani xu biyer xu vırar. Feqet inı serranı peyinan dı ridê faqtorê iqtisadi u sosyalan ra lacêk u keynêki binêna erêy serran dı zewicyêni.

1.1. Zêrr Kotış u Keynek Vinayış

Keynek u lacek amêy wexti zewac se, geyrêni xu ri yew waştı vini u xu yını çım finı. Vatış awo ki xortan hewayê zewac waştışê xu deyni tever. Çolig dı wexto lacek bıamen çaxê zewaci dadiyê xu inı waziyet ra xeberdar kerdni. Helbet lacek zêr bıkotên dedkêyna yan zi xalkêyna yê xu gurêyı zaf rihet bêni. Yani lacek u keynek merdımê, ciranê yewbinan bıbêni se, yan zi yega, keber u bostanê ym yewbinan ra nızdi bıbêni, keynek u lacêk yewbinan hol sınaşnêyn, nımtiki ra pêy qasudu yew binan rı xeber şawıtın u bajyê zi qerarê xu deyni.

Yew yew keynek u lacek zi nişan- veyvê merdımânê xu dı yewbinan vineyni u zêrr kotin cı. Rojê veyvan dı xortan xu xemılne, gijiki xu şoni kerdini u kincani rından deyni xu ra, govend kerdini yan zi nat a wet a şini amêni geyrêni xu ri yew waştı vini. Dıma pêy xu ri yew waştı dı u zêrr kot cı se derheqê yewbinan dı melumat deyni ariye. Tayın zi şeniki ra yew binan sınaşneyni.

Wırdi hemın qalê xu yew bıkerdên u qerar bıdên zewac se, lacêk babi u dadiyê xu ra inı mewzu kerdini a u ym ra vatin ez keynê fılankeşi wazena. O wext lazım kerdêni dadi, way yan zi yew qasudê lacêk bışini keynek bıdini. Keyi lacêk keynek bışınaşnêyn, o wext lızum nêkerdên şiyêr keynek vini. Wextog keyi yan zi merdımânê lacêk, keynek u kêyi keynek nêşınaşnêyn gon yew qasud bışawıtên keyi keynek. Qasud yew çi ma'ney kerdin u şini keyi keynek, keynek nezdi ra dini u derheqê yê dı (wırıştış, runıştış, qal kerdış, kar-gurı kerdış yê ra bıgiri hettani çi ser) melumat deyni ariye. Inı melumat dıma dadi u babi lacêk, derheqê keynek dı qerarê xu deyni.

Yew qeydeyo binı dı lacek yew rojı munasib dı xeber deynı waştıyê xu u ardeni keyi wayê xu yan zi merdımânê xu, dadi u merdımânê lacêk, keyna pêy çımanê xu vinêni u tedı qıssê kerdini, yê nızdi ra sınaşnêyni.

1.2. Qal Guretış

Dadi u babi lacêk zi keynek begon u qewıl bıkerdêni piyorê tedarikê xu dini, o yew qasud şawıtın keyê keynek. Bêxeber ço nêşini vêri beri cini. Eg yew binan bışınaşnêyn, bışên u bıamên keyi yewbinan o wext gurêyi ym bıneña rehet bı. Qasud şini keyê keynek ra vatin: Ma wazêni şıma dı merdımati bıker. Uca dı niyetê qasud beni eşkıra. Zewna zi qasud derheqê keyi, kar u gureyê laceki ser melumat deyni yını. Hetê keyna wextog qasud reyı kerdini, tı ra vatin: Dê ma merdımânê xu dı zi qıssê bıkerı, ma xeber dani şıma. Qasud zonayı u aqıl inı qalkerdiş ra pêy niyetê keyi keynek feğm kerdini. Çend rojan dıma qasud honêy şini keyê keynek. Pılanê keyê

keynek eg bîwaştên keynê xu bîdî, tî ra vatin: “- Ê, eg Huma vaj ê ma zi qayili şıma dî merdımati bikerî” u yew cewabo weş deyni qasud. Derheqê lacêk dî çi ko mereq kerdını qasud ra çend su‘al perseni. Inı qerar ra qasud zaf bêni şa. Babi u dadi keynek, eg nêwaştini keynê xu bîdî o wext yew çi me‘nı kerdini u vatin:

-keynê ma hema qıja, yan zi

-keynê ma zewac nêwazena, niyuz

-way u birayê yê pili esti, hema ‘ezew e yan zi

-çew çiniyo kar u gureyê keyê ma bikerî, keynê ma destegirê ma wa.

Sêy inan yan zi zewna yew çi vatini. Heti keynek wexto ki keynê xu nedêni zi qasud zaf nêşikıtın, qedr u qıymet dêyni cı.

Feqet rêy rêy zi keynek zaf zêrr bıkwotên lacêk u dadi-babi keynek, yê waştıyê yê nêdeyni se keynek u lacek, benatê xu dî qerar deyni u yewbinan dî remêni.

1.3. Keyna (Cini) Remnayış

Eg lacek u keynek zêrr bıkotên yewbinan u yewbinan bîwazi, feqet hetî keyê keynek lacek qewıl mêkiri u keynê xu, yı medi, o wext lacêk zi keyna remnêni. “*Kurdan mîyan de cini remnayış ‘eyb niyo, lakim gerek riza keyneke bibo, bêriza aye nêbeno. Eger laj u keyna yewbin biwazê, may u piyê keyneke aye nêdê laceki, ay waxt lajek keyneke remneno.*”³ Zazayan miyan dî cini remnayış sêy yew ‘edet yenu qebulkerdış u çew yını ra pers, vani: “ını ‘edet pêxemberan ra ma ri mendu”. Inı rıdî ra kulturi ma dî yew lacek yew keynek biremi, miyan milletê ma dî inı gurı ‘eyb nêhesıbyenu.

“*Tayî cayan dî remnayış keyna ser ‘edeti tewirêk esti. Babi lacêk kê gı keyna mewaz, lacek gêren derheqê waştış keyna dî zuwar bîdî babi xu u yı iqna bikerî. Hem zi hetê keyi keyna zi tengoni dî verd. Lacekiğ nêşka keyna biremn, herındê keyna dî çit yan zi desmalê yê remneni. Inı ‘edet gueri; lacek çit-desmalê keyna biremn, asıg keyna remnawa. Benatî dî yew ferq çiniyu. Babi lacêk teng dî munenu u şını keyna wazenu. Welhasıl lacek nêşka keyna biremn zêwna çarı cırı nêmonenu, şını desmalê yê, çitê yê remneno. Bajyê zi pili-extiyari dew kuwêni bête, qalın birnêni u keyna wazêni...Herındê keyna dî çit-desmal remnayış bacarê Hekari dî yenu çımanı ver.*”⁴

Kêy gı lacek keyna (cini) biremnên, berdini keyi yew merdımê xu namdar u qale yı perikerdı. Wahari a keyi lacek u keyna pawêni, hettanê ki ina dawa biyer safikerdış. Çunki tore u aristokrasiyê Zazayan-Kırdan dî yew merdım xu bîştên pêy beri yew zat, gerika o zat, a merdımı bıpaw u dawa çı bena bıwo zey dawê xu qebl keno, geyreno benatê dî hetan dî mesla helbıkır, wird hetan zi biyar piya, aştı vıraz. Halkerdışê a dawa zêy namus u şeref muhim a.

³Mela Mehmudê Bazidi, *Adet u Rusumatnameyê Ekradiye*, Weşanxaneyê Lis, Diyarbekir, Tirmeh 2010, r.54

⁴Çopuroğlu, e.n.v, r.171

Bajyê wahari a keyi; babi, xal yan zi apê lacêk u yew mela niyuz şêx amên piyaser, benatê xu dı mişori, istişari kerdini u şini keyi keynek, mesla bestin weşi ser.

1.4. Keyna (Cini) Waştış u Qalın Bırnayış

Hetê keynek bıwaştên hetê lacek dı merdımati bıkerı, o wext yew niyuz dı heftê dıma babi lacêk pêy çend merdımânê xu u yew zi mela yan zi şêx xu dı tedı berdini, şini cini waştin. Merdım ki şını cini wazeno, şari miyan dı amên sınaşnayış u miyan cema‘at dı qalê yın zi perı kêrdini. Hetê cini zi vendeyni çend merdımânê xu u per bini dı zi tedarikê xu vineyni, keyı xu kerdini pak.

Hetê lacêk şini keyê keynek u yewbinan persêni, dıma nat-wet ra qal-qısê kerdini. Hetê keynek zonêni ehnı merdımı çı semedı ra amey keyi yını; feqet xu deyni nêzuni. Çend wext dıma babi lacêk yan zi şêx u mela kowtin qal, vatin: “- Ma wazeni şıma dı merdımati bıkerı. Eg şıma zi rıza bıdı se, pêy emir Homay u pêy qewlê Resulullay ma wazêni keynê şıma laci xu ri bıwaz.” Guerê ‘edet u eşnawitan, zafın ra feki hetê lacek ra inı rêz ameni vatış, feqet ma nêşkêni vacı illa mı qeydı benu.

Hetê keynek ra cewab zi pirık (kalık) niyuz babi keynek deyni. Eg pirıki keynek ho goni, zafın ra qerar yı deyni; çunki toreyê ma dı pirık (kalık) ho goni se qerar ho yı destı dı, babi keynek qal nêkerdini. Eg hetê keynek zi bıwaştên keynê xu bıdı, o wext vatin: “- Madem şıma ehend koti zehmet u amêy seri cılê ma, ma zi wazêni şıma dı merdımati bıkerı u Homa vaj “e” ma keynê xu dani şıma.” Ina sot dıma cem‘at Fatiha wendini.

Cini waştış ra pêy, cem‘ati hetê lacêk qal ardini qalın waştış ser u vatin: “- Şıma ma ra çıta wazêni? Ma barê xu bızoni.” Zazayan miyan dı qalın waştış u dayış, sêy yew ‘edet ameyo qebulkerdiş. Miqtarê qalın belukerdiş zaf çetın bı. Dıma hetê keynek çıqas qalın bıwaştên miqtarê yı vatin. Çı semed ra mı qalın wazêni, a zi izeh kerdini. Eg dadiyê keynek bıwaştên keynê xu ri zaf ciyez bıkir yan zi hetê keynek feqir bıdı u nêşkêni idarê keyi xu bıkeri, o wext qalın bıwazêni zaf waştini. Keynek yew keye wo pil ra bıamên niyuz idarê keyi yın hol bıbêni o wext qalın bıwazêni kêm waştin. Babi keyna hetı lacêk ra zaf qalın bıwaştên, hetı lacêk zi waştını miqtarê qalın bıwazêni kêm bıkerı. Rêy rêy zi cem‘at ra xatırê yew merdim ser miqtarê qalın ardın war. Rêy rêy zi dadi u babi keynek nêwaştını zomay xu bıdı tenguni, ayê ra ya qalın nêgurêtin yan zi çı ko sembolik guretin.

Eg lacek u keynek merdimê yewbinanê nızdı bıbên (xalza-xalkeyna/ deza-dedkeyna) hetê keynek zaf dehwêy qalın nêkerdın u yew çıko şenık miqtar dı qalın waştin. Quwwetê lacêk bıbêni, şew gı qalın bıryenu a şew qalınê xu deyni; feqet quwwetê lacêk çınye bı, o wext şini yega, dıwar, malê xu ruetını yan zi yew merdımı xu ra miqtarê qalın deyn kerdin u qalın xu dêyni. Rêy rêy zi hetê keynek qebul bıkerdên herındê peran dı bız, ga, monga, yega, keber, tıfing usi. niyuz zewna çı deyni cı.⁵

⁵ Qısêkerdiş: Gürcü Bayar, dewê Çolig Şirnan (Sudüğünü/Sancak) ra wa, ciniyê keyi ya, wendiş-nuştış nêzona, serrê yê: 55

Kulturê ma dı zewacê deza-dedkeyna, xalza-xalkeyna zaf êseni. Inı ‘usul zewna ‘eşiretan dı zi esto. “...Benatê Malatya u Sewas tı cuyayi macir ‘eşiretê Dirican ser vıraştı yew cıgêrayış gueri, hettanı deza nêwazı dedkeyna nêşkena yew gërib dı bızewiji.”⁶

Yew eserê Kaşgarlı Mahmud dı zi çekuyê qalın inı qeydı viyerenu:

“kalınğ berse kız alır,

kerek bolsa kız alır:

çehiz veren kız alır,

gerekli olan bahalı alır,

bir adam çehiz verirse

gelini kız oğlan kız alır”⁷

Meslê qalın safi bîbêni, wird hetan bênatê xu dı roji nişuni belu kerdini, gurê xu ardin weşi ser u şirinê qalınbırnayış werdini, qehwe niyuz şerbetê xu şimitin, dıma pey zi bîni vıla.

1.5. Nişun Runayış

Meseleyê nişuni hina asan bîbi. Çunki nişan ageyrayni keyeyê laceki. A wext yew nişano normal ya panc hebi zerdê wirdêki (altunê yuzligi), yan zi dı-hirê hebi zerdê xışni (altunê binligi) bi. İnan ra teber yew helqa (helqaya gişti), yew cıtey goşaran u yew ingiştiri zi, nişanı miyan dı bî. Hini nişanı ser o yew seremoniya xususi nêvıraştini.⁸

Ini serran peyinan dı ‘edetê nişuni bînyê bediliyêyi. İnkêy yew nişanı normal dı ekseriyeten çahar-punc hebi bazın (her yew hiris yan zi çowras grem) u yew set (goşarê, giştuni/helqa, qolye) zomay ra yenu waştış. Quwwetê zoma ho ca dı u eşkeni idarê xu bıkerı, rêy rêy tı ra heşt-new hebi bazın zi yeni waştış. Wextê verinan dı hetê keynek zoma ri giştuni (helqa) nêrineyn, feqet inkê keynek zoma rı, zoma zı keynek rı giştuni ernenu.

Wextog hetê keyi keynek nişanı eşt, hetê laceki ra çita ki gureto, gerıka pêyser bıdı cı. Feqet hetê keyi lacêk wexto ki nişanı eşt, çiko ki semedê veyv gureto pêyser nêwazêni.⁹ Orf u toreyê ma dı inı waziyet kowtış hol nêhesibyeno.

1.6. Cıyez (cêz) Êrnayış u Cıyez Ravıstış

Çi kı semêdi veyv (cini) yenu êrnayış u hedrı kerdış, ma tı ra vani cıyez. Cıyez hedrı kerdış barê hetê keynek dı bî. Cıyêzi keyna zafın ra qalın gı zoma ra ameni guretış, pêy a qalın amêni êrnayış. Yew armancê qalın guretış zı inı bî. Wexto vêrin, Çolig dı yew keyna biamên 10-12 serran, hını hêdi hêdi hedre cıyez xu kerdini. (Inı dem/derax dı dewanê bajarê ma dı wendişxanê

⁶ Ali Güler, “Cumhuriyet Öncesinde Aşiret Aileleri” *Sosyo-Kültürel Değişim Sürecinde Türk Ailesi*, C. I, Ankara, 1992, s. 167.

⁷ Kaşgarlı Mahmut, *Divanü Lügat-it Türk* (Haz. B. Atalay), C. III., s. 371

⁸ J.İhsan Espar, Tani estaniki u deyrê ma, *Weşanxaneyê Vateyi*, Payiz, İstanbul 2004, r.22

⁹ <http://www.angelfire.com/country/cemisgezek/culture/tradition/marriage.html>

zaf çini bi u milletê ma ra zaf kesi, qayil nêbi keynan xu bîşawi wendîşxanan). Dadiyê keynan zi, keynanê xu musnêni, teşwiq kerdini tentenî u neqîş viraştîş. Keynan ciyêz xu ri papîk, çit, luaçik, lif, secde, puç, murêy usi. çî viraştin, neqîşnên u xemilnên. Keyna ki nêşkêni neqîş bikerî embazan xu ra luemî kerdini.

Hacetê bini zi suk (çarşı) ra amêni êrnayîş. Keyna şini purt guretin u pêy lehêf, balîşna, doşek usi. kerdin de. Qêy piraguretiş xu ri, fistun u çarşef guretin.

Semêdi luzumiyê keyi perde, şımık/terlig, saplik, mêsın, sabun, sini, tebax, çetal, koçik, şuşê çay/awk, xali, yolluğ usi. qep-qecax zı suk dı amêni êrnayîş. Keynek bîraran yan zi wayan zoma ri zi işlig, fondoli, şalvar-şapık, fistun, puç niyuz zewna çî guretin.¹⁰

Inkêy lazımat ciyêz bediliyêyi, feqet keynê ki esti, hema ra zi qêy ciyêz xu ri tentenî u neqîş vırazêni.

Çıqas ciyêz keyna gı hedrı biyu, semedê vinayîş merdımın u ciranan zomay, seri ‘erd dı ra vısnêni (teşhir kênî). Ma in ‘edet ra vani ciyez ravıstîş. Feqet in ‘edet zi bediliyeyo. Inkêy hetê zoma zı semêd vıakerdiş der u ciranê xu ciyez kenu hedrı.

1.7. Şewê Heni

Rojê peymê veyveyi, yani yew şewa verê hewilnayîşê veyveke, xwendî şonê destanê veyveke hene kenê u eyni şew qismêk zi destê zamayi hene kenê. Şewa ke veyvek u zama hena beno, ay şewe ra vanê *şewa heni*. Şewa ke veyveke hene kenê, xelate zi pa bena. Wextê henekerdişî, tayê deyiri xas ê ay şewe, zama u veyveke sero vajyenê.¹¹

“Şewa heni zi keyê keyneki dı beno. Merdimanê veyeki verê veyeki zaf weş xemilnayni, cilê ya yê tewr weşi pira dayni, hene elawitini u des-duyes gudiki viraştini. Ehendey zi mumi gudikandê heni ro cenayni u hergu gudika henide kerdini yew nalmiki. Wexto ki cenî pêru ameyni pêser, veyeki ardini wertedê wedi dı yew kursi ser o roşanayni. Mumê xwi pa nayni, çend cenıyan nalmikiyê ki mumi te de bi, girewtini u nor u dorey veyeki ro şini-ameyni. Deyiri kerdini u govendi girewtini. Cenıyanê binan zi hetani ki mumi biveşayni u bıqedıyayni govendi girewtini. Ay beyntar dı çend cenıyan dest u lingê veyeki hene kerdini.”¹²

Wextê henekerdişî dı tayê lawik u deyiri gı derheqê şewê heni ser amêyi vatîş, zoma u veyv sero vajiyêni. ‘Usulê ca ardîşê ‘edetê şewê heni dormalê Çolig, Piran u Xarpêt dı monêni yew binan.

1.8. Marı (Mare) Bırnayîş

Marı bırnayîş ‘edet u toreyê zewacê Zazayan dı çî ko zaf muhim o. Hetta ma eşkêni vacı en muhim o. Çolig dı zoma u veyv verniye yew mela u dı şahadun dı, ina qaideyê şeri‘at nêari ca, zewac nêbenu.

¹⁰ Qısêkerdiş: Saime Bor, dewê Çolig Wısfun (Aşağı Akpınar) ra wa, cinıyê keyi ya, wendîş-nuştiş nêzona, serrê yê: 60

¹¹ Seid Veroj, [Terminolojiya Waştîşê Cini u Veyve](http://www.kovarabir.com/tag/kird/), Kovarabir, (<http://www.kovarabir.com/tag/kird/>)

¹² Espar, e.n.v, r. 27

Tore u ‘edeti ma Zazayan dı marê veyv u zomay muheqeq vêri şewê zifaf yenu bîrnayış. Inı wecibê şeri‘at gerekê verniyê şewê zifaf dı biyer ca. Zuma u veyv verniyê yew mela u dı şahadun dı, wırdi destani xu keyni a u gıştê destê xu ya raşt (gışta qalın) keyni derg u ani piya. Dıma pêy hirı gering sund wuneni. Zoma sund xu dı hirı gering vanu: verniyê Homay u ini şahadun dı, mı ma keynek (namê yê vanı) guret marê xu u mı xu ri cini qewıl kerd”.

Keynek zi inı qeydı u ‘usul dı sund wunena. Marı, nişunê keynek ser yenu bîrnayış. Çi kî sera marı yenu bîrnayış malê keynek o, çew nêşken o biye rızê yê tıra biyerı.

Zaf reyan dı zoma u veyv ma seramoni dı niyêni yew ca. Herındê xu dı yew wekil tayin kênı u o wekil herındê yını dı marı bîrnenu. ‘Edeton ma dı veyv zafın ra wekiltiyê xu dana babi, ap/ded, xal yan zi yew merdimê xu yo nızdi.

1.9. Rojê Veyveyi (Dawet)

Kultur, musiki u sosyolojiyê ma dı herındê veyve, zaf muhim o. Lawık, deyiri yan zi kılâmê ma, inı roj dı fek ra fek yeni vatış u viri ma dı moneni. Inı ‘usul ser deyiri u lawiki ma, xu rasnêyi hettani inı roj.

*“Eger yew halêko zaf nêbîyaye çini bo, veyveyê Kırdan bêveng u bêmuzik nêbenê; muheqeq yew deyirbaz u dengbêj, saz u tembur, niqre u zirna yan zi luli u erbane esti.”*¹³ Sanatkar, deyirbaz yan zi dengbêji ma; roji veyveyi dı lawikani (deyir) xu en weşan Zazaki niyuz Kurmanci vani u pêy govend kay keni.

Hetê zomay u veyv rojê veyveyi ser (veyve kamı roj kênı) amêni piyaser u qerarê xu deyni. Feqet rojê tarixê veyve ser guerê tedarikê xu, qala peyin hetê zomay vatini. Nızdiyê tarixê roj veyveyi dı yew merdimê zomay yan zi veyv bimerdên, yew qeza bikerdên niyuz yew nıweşiya girun bıguretên, veyve nêniyeni ru u roj veyveyi tepı eştin. Çolig dı ‘edetanê ma gueri eg yew merdım bimerdên, cınazê yı dıma gerika çoras roj bıviyertêni. Badê inı çoras rojan dıma veyvi niyeni ru. Rêy rêy zi rojê veyveyi dı o mıntıqadı taziye yew der u ciran bıbêni, wahari veyveyi yew xesasiyet nêyni ru, veyve dı def u zel nêcenêyni.

Hetê zomay u veyv, verê rojê veyveyi vendêni merdımın u ciranane xu u yın da‘wet keni veyve. Pa inê wa merdım u ciran yını gı hêy bajaran binan dı cuyêni u uca dı xebitiyêni, xeber dani yın zi u da‘wet keni veyve. Yani hesabê merdımın xu yê tebêr zi kerdini. Inı rıdı ra Çolig dı veyve zafın ra rojê şemi yan zi rojê kiri dı niyeni ru.

Rojê veyveyi peyin dı babi zomay (wahari veyveyi) hevêr guerê kultur u ‘edetani ma vendêni merdımın u ciranani xu, badê nimroj yew molid (mewlud) danı wendiş. Molidan yew mela yan zi şêx vengweş wunenu. Wahari veyveyi badê molid dıma wer danu meymanani u merdımıni

¹³Seid Verroj, e.n.v

xu. Inı wer, sêy yew ziyafetêk o u bereketê veyveyi mojnenu ra. Tewranê weran dı qıbê/mitfaxê ma hira ya. Kulturê ma dı ini weri yeni potış; sorina pelın, sorinê adir, mastıwa, kufte, pilaw, dolmey, xulyerik, eşkeni, qılç, luel (lol), qavurma, şılkin, şıwarbê mercu, nehê, faslê awin, şıwarbê germ, kelli uab. Vıraştış u hedrikerdışê ini weran dı cini gelêk zehmet vinêni. Ini weri pêy çita vırazyêni ma çend heban bı dı sınaşnayış:

sorina pelın: pêy nunê toq, mast, sir, ron dıwar vırazyena

sorinê adir: pêy nun patile (benu wırdı), mast, sir, ron dıwar vırazyena

mastıwa: pêy rız, mast, ron dıwar vırazyena

Şılkin: Pêy nani toq (benu wırdı), aqıt, ron dıwar vırazyenu

kuftê: pêy ardu, birğul, qıyma, pıyanz, beharat, salçe, ron vırazyêni

xulyerik: pêy mir, mast, sir, birğul, ron vırazyêni

eşkeni: pêy nani wışk, pıyanz, salçı, ron, qıyma, beharat vırazyenu

qılç: pêy turaq, pıyanz, ron, meydanoz (seri tendur yan zi toq dı vırazyêni)

luel (lol): pêy turaq, pıyanz, ron, meydanoz zerê soba dı vırazyena

qawurma: pêy goşt, ron dıwar, pıyanz vırazyena.¹⁴

Inı molid hem sêy yew weci bê din o, hem zi meqset meymani yeni veyve, wa weri xu bıweri u veyşan nêmoni. Yew merdım gı veyşan bışiyên keye xu, miyan cemat dı bêni qal qısawet. Waharê veyveyi zi inı weziyet ra bêrehet beno. Veyveyan dıma molid dayış, toreyanê ma miyan dı yew ‘usul o verin o u molid, nızdê piyorê veyveyanê ma dı yenu wendiş.

Wextê verinan dı (misal 25 serr cuwaver) wahari veyveyi baxçe xu dı yan zi miyanê mehla dı yew cêko duz dı veyve nêyni ru. Cayê veyveyi kerdini duz, awk şêyni purı, qêy runıştışê meymanan, tayi kursi-sendalê zi dormalê cayê veyveyi dı nêyni ru. Semedê tari biyayışê hewayi, çend hebi çıla zi bestini yew qablo u kaş kerdini miyanê veyveyi. Inı ‘edet bajar ma dı hema ra zi dewom kenu. Feqet inı serrani peyinan dı zafı merdımı qayili eywonê veyveyi dı (dügün salonu) veyveyê xu bıkeri. Labelê ma eşkêni vacı veyve ra veyve ferq estu, yew standartizasyon çiniyu.

Veyveyê ma kamca benu wa bıwu (ha baxçe, ha mehla ha zi eywonê veyveyi) def kotış u zel cenayış gurê aşıkan o. Waharê veyveyi, yew-dı roj vêri veyveyi xeber danı aşıkan u anı veyve. Aşiki kê gı def u zel bicêni, cayê veyveyi hêdi hêdi benu qelabalıx u şarê veyveyi dest pêyken o govend. Govend dı, govendgeran ser çendi perê biyeri eştış niyuz fekanayış, barê aşıkan bi u yımı deyni ariye. Aşikanê Çolig, lawıkanê Zazaki zoneyni, veyveyan dı goreyê ritm u aheng inı lawıkan pey def u zel vatini.

¹⁴ Qısêkerdış: Gürcü Bayar, b.d

Wexto ki aşikan def u zel cenêyn; şarê veyveyi zi govend, delilo, girani, yewling, diling uab. key kerdini. Inı dor dı deyirbaz destpêykerdini deyiranê govend u govendger (govendgrewtox) zi pêy mi deyiran govend nêyni ru, cayê veyveyi bini şa. Ma veyveyan dı zafin ra lawıkan-deyiran zıwanê xu dı (Zazaki) vani, feqet Zazaki dıma deyirê Kurmanci zi vajiyêni.

A merdım ki deyiran (lawıkan/kılaman) vanu, inan ra vani deyirbaz. A merdım ki govend gêni, inan ra zi vani govendger niyuz govendgrewtox. A merdım ki serê govend dı kay kenu, inan ra zi vani sergovend.

Rêy rêy zi şarê veyveyi def u zel teriknêyn. Deyirbaz, dengbêj yan zi merdım gı deyiranê weşan zoni, piyori ra veri destpêyk vatış kerdini, a binan zı, yı dıma dıla kerdini. Inı qeydı veyve binêna bini weş. Zoma zı bıkotên miyan govend, vengê govendgeran bini berz, qiri u nali kotin şarê veyveyi ser. Zaf gering in wext dı şarê veyveyi coş benu u xeyli tıfing, demaçı teqnêni. Cer ra cuwar, her ca ra vengê tıfingan yenu eşnavıtış.

“Veyvan ma dı cayê ciniyan u camerdan ciya bı. Camerd nêşini cayê govendê ciniyan, cini zi nêamên cayê govendê camerdan...Ma Dımiliyan miyan dı, hetê cini u camêrdi nêkewtên pê dest u piya kay kaynêkenê.”¹⁵ Cini u camerd yewbinan dest nêkotin, wırdi piya govend nêkerdin. Ciniyan bênatê xu dı, camerdan bênatê xu dı govend nêyni ru. Feqet ciniyan miyan dı hetê merdımati ra kamı zoma ra nızdi bibi; mesela wayê zomay, pırıkê zomay, ‘em u xalê yı, dadiyê yı, niyâjê yı yan zi xalciniyê yı rêy rêy ameni miyanê camerdan u yını dı govend girowtini. Veyve dı piyorê merdımanê zoma u piyorê merdımanê veyv cayê xu gurêtin. Nızde 40-50 serr cuwaver dı rojê veyveyi yew fistun niyuz çarşefa rengin dêyni veyv ra, çend hebi zerdi kerdini yê mıl, xemılneñi u pêy yew çit-luaçika rengin zi riy veyv retivnêyni. Wextog xemılneyişê veyv bıqedyêni, merdımanê zoma; cini, camerd, qij pa yew astor yan zi bergira xemılneyişê şini veri beri veyv. Eg zımıstan bı, vor bıvareni astor nêşuxulyêni, herındê astor dı veyv pêy tawıkan ardini.

*“Eger veyvi cayê do duri ra biyarê vanê, bı estor, bergir u qatırana şırê biyarê. Eger miyandê dewda xo ra, yan ji sukda xo ra biyarê bı lingana şınê anê. Eger sukê ra biyarê sukna, veri a veyva xo bı qamyon, texsi yan ji bı otoboza anê a sukda xo dı key sınaşnayande ey dı, yan ji key merdımandê xo bı ca kenê u bahdo bı şêliga (şêligdê veyveyiya) şınê çiyê cı yê veyveyi danê pıra, surika cı ancenê cı ser, cı rê veyve kenê u anê.”*¹⁶

Zoma bışêni verê keyi veyv; bıra, way niyuz yew merdımanê veyv, veyv kerdini pey beri, zomay ra “xelê pey bêri” waştini. Kam veyv kerda pey bêri se zoma ra vatên: “hetan tı xelê mı nêdi, ez veyv nêdumı tu.” Merdımanê hetê veyv çita go bıwaştên, zoma gerika bıdêyni cı.

Zoma, wexto gı veyv bıardêni veri bêri keyi xu, dadi yan zi wayê zoma yew xılê awk (kuzik awk-dieza), yan zi yew şuşê awk keyeyi babi veyv ra ardini, verê linganê yê dı nêni ru, veyv zi payê xu deyni pırı u şıkitin. Wexto verin dı zi yew koçık a darin ardini verê linganê veyv dı nêyni ru. Veyv zi payê xu dêyni koçık rı. Eg koçık bışıktên, şari vatên ma veyv hol a, cihat a;

¹⁵ Koyo Berz, Vinayeni, Waştena Keynekı Veyvi u Veyve, Kormışkan (Zıwan u kulturê Zazayan), Amor:2, Stockholm, 1995, r. 39

¹⁶Koyo Berz, Kormışkan, b.d, r. 40

eg koçık nêşıkîten, o wext zi vatên ina veyv xıraw a, hol niya. Dıma pêy yew merdımê zoma zi şeker, eskij niyuz liblibê eştini sarê veyv ser, qijan zi dêyni ariye.¹⁷

“Sewreg dı zi in ‘edeti ma şuxulyên. Uca dı zi helag veyv beni zeri sêr bon ra şeker, liblibê, guaz, eskij, fındıq, fıstıq erzeni sêr yê. Veyv yew kuzik awk duna ‘erd rı şıkna. Zewna zi yew henar duni veyv dest u veyv a ya henar vêr ber dı duna ‘erd rı, henar bena vıla. Dıma pê du ‘a keni veyv beni zeri.”¹⁸

Bajyê cini u keyneki, veyv bêni miyan yew wadı, seri yew sandalı dı nışnêni ru, dormalê yê dı binêna govend kay keni. Dıma pêy hemı meymanê veyveyi, zewacê veyv u zoma bımbarık keni, keye ra vejani teber, beni vıla. Verê veyv dı yew cini, verê zoma dı zi yew embaz/heval monenu. Ina cini u embaz gerika zewıcnayî bibêni. Çunki ini wird heman zi derheqê “şewê zifaf” (şewa pey perdi) ser veyv u zoma yı şıret kerdini, ‘usul ina şew ser melumat deyni yını. Ayê ra rolê ina cini u embaz gelêk muhim bi. Bajyê zoma u veyv têyna mendini, ina şew piya viyarnêni.

Veyv, nızdê yew hefte zeri dı mendini, teber nêameni. Wexto ki hırı-çahar roj bıviyertêni niyuz yew heftê veyv bıqediyêni, merdımânê veyv amêni ziyaretê yê. Çend rojana dıma zi, veyv şini keyeyê dadi u babi xu, lew nêyni yını destan. Ma ını ziyaret vêrin ra vani “zêyî” yan zi “rı”.

Inkêy, ini serranê peyinan dı (2000 ra nat) veyveyê ma zafın ra eywonê veyveyi (dügün salonu) dı niyêni ru. Ayê ra kultur, ‘edet u toreyê ma yi zewac zaf bedıliyêyi yan zi wertı ra dariyeyi we.

1.10. Rı (Zeyî)

Rojê zifaf ser ra çend roj bıviyêri, dadi-babi yê veyv ameni ziyaretê yê. Dadiyê veyv; pêy ronê dıwar, helaw potini u xu dı tê berdini. Dıma pêy zi veyv, nızdê yew hefte zeri dı mendini. Ini roj bıqediyêyni ‘edet u ‘usul gueri, yew-dı hefteyêk niyuz nızdê yew aşm dıma zi veyv, şini vinayışê/ziyaretê dadi-babi xu. Pa veyva, zoma zi şini lew nêyni destê vıstorı u vısturiyê xu. Ini ziyareto verin ra vajyeno “rı/zeyî”.

Ini wext ra dıma, hewê ‘ewil, hetê zoma u veyv ra kam biamêni keyeyê yını, ‘edetan gueri gerika xelê veyv xu dı tedı bıyarı. Veyv zı wextog meymani ameyê keyê yê, yın ri çeyiz xu ra yew barey çi (papik, çit, loçik, secdê usi.) dêyni cı.

1.11. Cera Biyayış

Kulturê ma Zazayan dı, yew camerd rêy rêy dı-hırı ciniyan dı zi zewac kerdini. Pılan ma verinan miyan dı zaf ciniyan dı zewac normal hesibyenu. Ma Çolig dı kamo yew extiyar ra pers bıkerı; eşkenu ını qeydı, zaf ciniyan dı zewıcnayê embazan yan zi merdımın xu ra çend numuneyan

¹⁷Qısêkerdış: Gürcü Bayar, b.d

¹⁸http://www.sivereknet.com/siverekte_dugun_ve_evlilik.html

ma ri bımarı. Hema ra zi zaf dewan, bajaranê mıntıqê ma dı yew camerd eşkenu çend ciniyan dı bızewic. Yew camerd dı-hırı gering bızewic, a ciniyê camerdi beni ‘wesni’ yew binan.

Yew camerd çı sebeban ra dı-hırı ciniyan dı zewicyenu? Ma mı su‘al yew camerd ra pers bıkeru, ma ri çend sebeban umarenu. Ini sebeban ra çend hebi mı qeydeyê:

-Ya ciniyê camerd qısır a, camerd qayilu neslê xu dewam bıkeru

-Ciniyê camerdi bımerı yan zi yew nıwêşiya gıron tedı bıvêju, camerd gêrenu xu ri yew sermunê keyi bıyarı.

-Camerd dewlemend bıbêni, mal u mulkiyeti yı zaf bıbo, bıwazı keyfi ser zewicyenu

-Şeri‘at dı yew camerd eşkenu çahar gering bızewic.

‘Edetan ma dı camerd yew sebebo zaf muhim çiniye bı, ciniyê xu nêverdeno, cera nêbenu. Medeni huquqê Awrupa dı yew cini êşkera camerdê xu verd, marê xu berz. İnı ‘usul rêy rêy miyanê Tırkan dı zi şuxulyenu, ma cerıbnêni, vinêni. Yew binan dı zewıcnayi cini u camerdi helagı nêşkê yew binan dı zewac bıviyarni, şini resmi mu‘amelê xu ani war. İnı heq diyayo ciniyan zi. Feqet kulturê ma dı yew çiko muhim zi ino ki, cini nêşkera camerdê xu bıverdu, İnı qeydı yew heq, cı nêdiyo. Yew istisnayê mı xusus esto.. Eg miyerdê cini, bışêni yew welat o gêrib u tı ra nızdê heşt-des serran yew xeber nêyorı (ho goni yan zi merdo, belu niyu) marê a cini camerd ra kuweno. Camerd wextog ciniyê xu verda, tı ra cera bı, heqê cini (çita go serı dı mare bıno) peyser dano cı.

“Kırmancanê suniyan de qeydeyi unca goreyê huquqê islami yê. Kitabê inan de kese vato, yi wini kenê. Suniyan de zaf ciniyan de zewac normal o. Merdim ke biwazo reyna bizeweciyo, lazim niyo ke ciniya xo ya verêne ra cêra bıbo. Her diyine de ki zeweciya maneno. Wexto ke cêra bı ki qeydeyanê islami gore cêra benê.

Yê elewiyan de ki, yew ke biwazo cêra bo, xebere dano piri, pir yeno cemaet keno. Her di hetan goş dano. Kam heq o, kam neheq o, qerar dano cı. Yan cêra keno yan zi ano gurê. Elewiyan de cêrabıyayış zaf rehet niyo. La wexto ke luzimiye bıye ki cêrabenê.”¹⁹

2. Terminolojiyê Zewac u Veyveyi Ra Çend Numunê

Tiya dı çekuyê ki seramoniyê veyveyê Zazayan dı yeni şuxulnayış, menayê inan eşkera bıyu.

Bacınax (Hevling): Miyerdê dı wayan, yew binan rı bêni bacınax.

Balduz: Wextog yew cini u camerd bızewiji, wayê cini, camerd ri bena *balduz*

Berbu: A cini ki rojê veyveyi dı veyv dı embazti kena u veyv xemılne, ayê ra vajyeno *berbu*.

Berdel: Dı keyê benatê xu dı cini bıdı yewbinan; yanê cini bıdı u vera o keyı ra yew cini bıwazi, mı zewacı ra vajyeno *“berdel”*. A cini ki bıyi *“berdel”* ê yewbinan inan ra vajyeno *“berdeli”*.

Bexşiş: Kê gı zoma veyv geno benu keyê xu, tayi xort yan zi qiji, reyı bırnêni u zoma ra qêy akerdış reyı miqdarêk pere wazêni. Ma mı pere ra vani bexşiş.

¹⁹ Nadire Güntaş Aldatmaz, *Folklorê Kırmancan (Zazayan /Kırdan / Dımiliyan) Ser o Cıgêrayışê, Tezê Masteri, Mêrdin 2013, r. 90*

Bıracini: Wextog yew cini u camerd bızewij, bırayê camerd “veyvê” xu ra vani “biracini”.

Bırazuma: Wextog yew cini u camerd bızewij, bırayê camerd cini rı beno “*bırazuma*” yan zî “*vıstorı*”.

Cıyez Ravıstış: Cıyêz terafê keynek, semêdi vinayışê merdımanê zomayı rı yeno ravıstış (teşhir kerdiş) ma mı waziyet ra vani cıyez ravıstış.

Cıyez (cêz): Çi kî semêdi veyv (cini) yenu êrnayış u hedrı kerdiş, ma tı ra vani cıyez.

Deyirbaz/Dengbêj: Merdım ki rojê veyveyi dı deyiran, lawıkan, kılaman vanı, ma mı merdıman ra vani deyirbaz/dengbêj. Veyveyê Zazayan-Kırdan bêveng u bêmusiki nêbenu; muheqeq yew deyirbaz u dengbêj ca genu u ca yê veyveyi kenu şa,

Gorım: Wextog yew cini u camerd bızewiji, wayê camerd cini rı bena “gorım”.

Govend: Zıwanê Tırki dı tı ra vani “halay”. Rojê veyveyi dı govendgırewtox-govendger pêy lawıkan u deyiran govend kaykeni. Delilo, girani, yewling, diling uab.

Govendgırewtox/Govendger: Rojê veyveyi dı meyman ki govend gêni, inan ra vajyeno govendgırewtox yan zî *govendger*.

Heqê Şiti (Qalın): Wextog dadiyê keynek, keynê xu bîdên zomayı, guerê ‘edet u kulturê ma luzumiyê xu gueri perê niyuz herındê peran dı zewna çi keyê laceki ra waştini, ay ra vajyeno qalın yan zî heqê şiti.

Marı: Sundê zewac. Inı wecibê şeri‘at gereka verniyê şewê zıfaf dı biyer ca. huzurê yew mela yan zî şêx dı u şeri‘at gueri, verniyê dı şahadun dı mı qaide yenu ca.

Mold (mewlud-nanê veyveyi): Rojê veyveyi peyin dı, waharê veyveyi vendenu merdıman u cırananê xu yew molid (mewlud) danu wendış. Badi molid dıma wer danu meymananê xu. Inı wer sêy yew ziyafetêko, kulturê ma dı çı wer estu (sorin, mastıwa, kuftê, pilaw, qavurma uab.) yeni potış. Ma mı wer ra vani nanê veyveyi.

Numal: Keyna u lacek ki newı zewiciyê, yew keyeyo newı rafını u hedrı bıkeri şiyêri cı, inan ra vajyeno “*numal*”.

Qasud: Merdım ki şar u meymanan dawetê veyveyi kenu, ini ra vajyeno “qasud”. Yew wazifê qasud zi benatê keyê keynek u keyê lacek dı xeberan berdiş u ardiş o.

Remnayışê Keyna: Keynek u lacek yewbinan bıwaştên u zêrr bıkotên yewbinan, feqet dadi u babiyê keynek, yê lacek nêdeyni o wext lacêk keyna remnêni. Remnayış dı gereka rızê keynek bıbo.

Rı (Zeyi): Zewacê veyv Serra çend roj bıviyêru, dadi-babiyê veyv şini ziyaretê yê. Bajyê zi veyv, ‘edet u ‘usul gueri yew-dı heftayêk şına vinayışê dadi-babi xu. Inı ziyareto verin ra vajyeno rı/*zeyi*.

Şerbet u Şirini: Rojê nişuni u rojê veyvı dı meymanan ra şerbet u şirini yena ikram kerdiş.

Şewa heni: Şewa ki destê veyv u zoma heni beno, a şew ra ma vani *şewa heni*. Yew şewa verê roj veyveyi dî, destê zomay u veyv heni benu.

Şewa pey perdi: Şewa verina ki zuma u veyv piya viyarnêni, ina şew ra vajyenu şewa pey perdi. Yani Şewê zifaf, gerdek.

Şoşman: A merdım ki şewê zifafi dî rêberiyê zoma keno, ay ra vajyeno *şoşman*.

Veyv: Yew lacek u keynek bızewiji, hetê keyê laceki keynek ra vani veyv.

Vistori/Vistewri: Yew keynek u lacek bızewiji, babi keynek benu vistorê lajêk u babi lacêk zi benu vistorê keynek. Keynek, bırayanê zomay ra zi vana vistori.

Visturi/Visturi: Yew keynek u lacek bızewiji, dadiyê keynek bena vısturiyê lacêki u dadiyê lacek zi bena vısturiyê keynek.

Waşti: Yew keyna hetê yew laceki ra biyer heskerdiş yan zi zêrr kotış, eg rızê keyna zi estu a keyna bena waştıyê ay laceki.

Xelê mund gırıdayış: Wexto ki zoma şino veyv genu, keyê dadi ra vejenu, bırayê veyv mundê veyv gırıdano, feqet ını semed ra zoma ra pere wazeni. Ma ını pere ra vani “xelê mund gırıdayış”.

Xelê pey beri: Wexto ki zoma şino verê keyê veyv, veyv bıgeru; bıra, way niyuz yew merdımê veyv, veyv kenu pey beri, veyv nêdanu u zoma ra “xelê pey beri” yani pere wazenu.

Xınami: A keye ki keyna bıdı yan zi keyna bıyari, benatê wird hetan dı merdımati peyda bena; dadi-babi keyna u dadi-babi lacek (wird terefi) beni xınamiyê yewbinan u ina merdımati ra zi vajyeno xınamıtiye. Zıwanê Tırki dı xınami ra vani “dünür”.

Zoma: Yew lacek u keynek bızewiji, hetê keynek lacek ra vani zoma.

3. Zazaki Dı Ferhengêkê Merdımati (Zazaki-Tırki)

Tiya dı zi ferhengêkê zewac, veyve u merdımati ameyo hedrı kerdış.

Ap-Dat: Amca

Babi-Pi: Baba

Bıra Pil/kek: Ağabey

Bıra Qıj: Küçük Kardeş

Bıra: Erkek Kardeş

Bırarza: Yeğen (Erkek Kardeşin Oğlu)

Cêri: Elti

Cini: Kadın

Ciran: Komşu

Camerd: Erkek

Dadi-May: Anne

Dedkêna: Amca Kızı

Deza: Amca Ođlu

‘Em: Hala

‘Emkêna: Hala Kızı:

‘Emza: Hala Ođlu

‘Ezew: Bekar

Gede-Qıj-Tut-Hul: Çocuk

Gerguş: Bebek

Gorım: Görümce

Kal/kalık-Bapir-Pir: Dede

Kêna-Keyna: Kız

Keye: Aile

Lac: Erkek Çocuk

Merdım: Akraba

Merdımiye: Akrabalık

Miyerdı: Koca

Niyaj-Apcini: Amca Karısı

Pilê Keyi: Aile Büyüğü

Pirik-Dapir: Nine

Tuern-Torn: Torun

Embaz-Heval: Arkadaş

Veyv: Gelin

Vıstewrı: Kayınbirader

Vıstorı-Vıstewrı: Kayınbaba

Vısturi-Vısturi: Kayımanne

Viya: Dul

Warkena: Yeğen (Kız Kardeşin Kızı)

Warza: Yeğen (Kız Kardeşin Oğlu)

Way: Kız Kardeş

Wesni: Kuma

Waya Pil/Wakê: Abla

Xal: Dayı

Xalcini: Dayı Karısı

Xalê: Teyze

Xalekêna: Teyze Kızı

Xalkêna: Dayı Kızı

Xalza: Dayı Oğlu

Xaleza: Teyze Oğlu

Xuert-Xort: Genç

Zewac: Evlilik

Camerd zewijnayı: Evli Erkek

Ciniya zewıcnayı: Evli Kadın

Dumri: Üvey Anne

Xınami: Dünür

Zuma: Enişte-Damat

Kılmuştayı

- b.d: bonê diyar (yukarıya bakınız)
bn.: bonê (bakınız)
e.n.v: esero namê yi viyert (yukarıda adı geçen eser)
r.: rıpel (sayfa)
uab.: u ay bini (ve diğerleri)
usi.: u sêy inan (ve bunlar gibi)

T.R.: Tarixê Resayîşi (erişim tarihi)

ÇIMEYİ

Çopuroğlu, Y. Cemalettin, “Fırat Havzası Evlilik Kültürü I: Düğün Öncesi” Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Cilt: 10, sayı: 2, Elazığ, 2000

Espar, J.İhsan, *Tani estaniki u deyirê ma*, Weşanxaneyê Vateyi, Payiz, İstanbul, 2004.

Gökalp, Ziya, *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*, Sosyal Yayınlar, İstanbul, 1992.

Güler, Ali, “Cumhuriyet Öncesinde Aşiret Aileleri” *Sosyo-Kültürel Değişim Sürecinde Türk Ailesi*, C. I, Ankara, 1992.

Güntaş Aldatmaz, Nadire, *Folklorê Kırmancan (Zazayan /Kırdan / Dımiliyan) Ser o Cığêrayişê*, Tezê Masteri, Mêrdin 2013.

Kaşgarlı Mahmut, *Divanü Lügat-it Türk* (Haz. B. Atalay), C. III.

Koyo Berz, Vinayeni, Waştêna Keynekı Veyvı u Veyve, Kormışkan (Zıwan u kulturê Zazayan), Amor:2, Stockholm, 1995.

Mela Mehmudê Bazidi, *Adet u Rusumatnameyê Ekradiye*, Weşanxaneyê Lis, Diyarbekir, Tirmeh 2010.

Veroj, [Seid, Termînolojiya Waştîşê Cini u Veyve](http://www.kovarabir.com/tag/kird/), Kovarabir, (<http://www.kovarabir.com/tag/kird/>), T.R. 02/10/2013, seat:14.00

http://www.sivereknet.com/siverekte_dugun_ve_evlilik.html, T.R. 20/10/2013, seat:13.00

<http://www.angelfire.com/country/cemisgezok/culture/tradition/marriage.html>, T.R. 23/10/2013, seat:13.00

Gürcü Bayar, dewê Çolig Şirnan (Sudüğünü/Sancak) ra wa, ciniyê keyi ya, wendiş-nuştîş nêzona, serrê yê: 55, (Tarixê qısêkerdiş: 03 Tışrin verin 2013)

Saime Bor, dewê Çolig Wısfun (Aşağı Akpınar) ra wa, ciniyê keyi ya, wendiş-nuştîş nêzona, serrê yê: 60, (Tarixê qısêkerdiş: 20 Tışrin verin 2013)



نامه‌ی ۱۲۳ نفر از درویشان و منسوبان شیخ علی خالص طالبانی در شهر سنندج
به دولت عثمانی

Hemin OMAR AHMAD*

Makale Türü/Article Types: Araştırma Makalesi/Research Article

Makale Geliş Tarihi/Received: 28.04.2022

Kabul Tarihi/Accepted/: 13.06.2022

Atıf: Omar Ahmad, H. (2022).

“The Letter of 123 Figures of Dervishes and Sheikh Ali Khalis Talabani Followers from Sina to Ottoman Empire”,
Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 15, 73-78.

DOI: 10.56491/buydd.1110227

نامه‌ی 123 کس له ده‌رویش و په‌یره‌وانی شیخ علی خالصی تالابانی له شاری سنه بو ده‌وله‌تی عوسمانی

له کۆتایی سهدی نۆزده و کۆتایی حوکمی ده‌وله‌تی عوسمانی، ناوچه سنوورییه‌کانی نیوان ده‌وله‌تی ئیرانی و ده‌وله‌تی عوسمانی زۆرتین کیشه‌ی به‌خۆوه بینووه، به‌شیک له خه‌لکی بن ده‌سه‌لاتی ئیرانییه‌کان هه‌ولی ئه‌وه‌یان داوه بینه بن ده‌سه‌لاتی عوسمانییه‌کان، به‌تایبه‌تی له‌به‌ر فشاری مه‌زه‌به‌ی حوکمرانی شیعه له ئیران. شاری سنه (سه‌هنده‌ج) یه‌کێک بووه له‌و شارانه‌ی که چه‌ند بنه‌مه‌له‌یه‌کی زانستی له‌و شاره به‌ره‌و به‌غدا و ئه‌سته‌نبول کۆچیان کردووه. ئهم دۆکیۆمینته‌ی نیو ئه‌رشیقی عوسمانی که میژوووه‌که‌ی بو سالی 1911 ده‌گه‌رێته‌وه، کاریگه‌ری ته‌ریقه‌تی قادری به‌ رابه‌رایه‌تی بنه‌مه‌له‌ی شیخ عه‌بدولرحمانی تالابانی که‌رکوکێ نیشان ده‌دا که په‌یره‌وانیان له شاری سنه بوونه و داوایان له ده‌وله‌تی عوسمانی کردووه که به‌ تایبعی ده‌وله‌ته‌که‌یان قبوڵیان بکات. له نیویاندا موقتی شاره‌که و 122 کس له شیخ و ده‌رویشانی ته‌ریقه‌ته‌که‌ ده‌بیزین.

وشه‌ی کللی: ته‌ریقه‌تی قادری، شاری سنه، ده‌وله‌تی عوسمانی، ده‌وله‌تی ئیران، شیخ علی خالص

Senendenc Şhrinden Osmanlıya Şeyh Ali Halis Talabani'nin 123 Derviş ve Mensubunun Mektubu

Özet

On dokuzuncu yüzyılın sonunda ve Osmanlı egemenliğinin son günlerinde, İran devleti ile Osmanlı imparatorluğu arasındaki sınır bölgeleri şiddetli gerilimler yaşadı. İran'ın elindeki nüfusun bir kısmı, İran Şii hükümetinin baskısı nedeniyle Osmanlı otoritesi tarafından yönetilmeye çalışıldı. Sina şehri (Senendec), bazı âlim ailelerinin Bağdat ve İstanbul'a göç ettiği şehirlerden biriydi 1911 yılına dayanan bu Osmanlı arşiv belgesi, Kerkük'lü Şeyh Abdulrahman Talabani'nin ailesi tarafından yönetilen ve Sina'daki takipçilerinin Osmanlı İmparatorluğu'nun kendilerini devletin takipçisi olarak kabul etmesini gerektiren Kadri tarikatının etkisini göstermektedir. Bunlar arasında şehrin müftüsü ile tarikatın 122 Şeyh ve derviş şahsı da vardı.

Anahtar Kelimeler: Sina Şehri, İran Devleti, Osmanlı Devleti, Kadri Tarikati, Şeyh Ali Halis Kerkuki

* Dr. Öğr. Üyesi, heminahmad40@gmail.com, Orcid: 0000-0003-1985-9512

The Letter of 123 Figures of Dervishes and Sheikh Ali Khalis Talabani Followers from Sina to Ottoman Empire

Abstract

At the end of the nineteenth century and the final days of Ottoman authority, the border areas between the state of Iran and Ottoman empire experienced severe tensions. Part of the population under the power of Iran sought to be ruled by Ottoman authority due to the pressure of Iranian Shia government. The city of Sina (Sanandaj) was one of the cities from which some families of scholars had immigrated to Baghdad and Istanbul. This document of Ottoman archive which dates back to 1911 shows the effect of Qadri order led by the family of Sheikh Abdurrahman Talabani from Kirkuk whose followers in Sina required Ottoman Empire to accept them as the followers of the state. Among them, there were the Mufti of the city and 122 other figures of Sheikh and dervishes of the order.

Key Words: City of Sina, Iran State, Ottoman State, Qadri Order, Sheikh Ali Khalis Kirkuki

بدیهی است که در تاریخ مذهبی ملت کرد، خانواده‌ی شیخ عبدالرحمن خالص طالبانی یکی از خانواده های برجسته‌ی علمی و مذهبی شهر کرکوک بوده‌اند. پیرو طریقت علیّه قادری بودند. آموزه های این طریقت نه تنها در شهر کرکوک بلکه به کشور هایی از جمله ایران و ترکیه و شهر های دیگر هم رسید. یکی از شهر هایی که شعله های این طریقت آن را در بر گرفت شهر سنندج بود. در اواخر حکومت عثمانی مناطق بین عثمانی و ایران شاهد مسائل مذهبی بودند. برخی از علمای شهر سنندج در اعتراض به دولت ایران به سرزمین عثمانی هجرت کردند، مانند خانواده‌ی عبدالقادر مهاجر و خانواده‌ی مردوخی که در اواخر قرن ۱۹ میلادی به بغداد و استانبول مهاجرت کردند.

این سند از اسناد آرشیو شده‌ی دولت عثمانی است که در سال ۱۳۲۹ هجری (1911 میلادی) نوشته شده است که نشان می‌دهد ۱۲۳ نفر از مریدان و درویشان و منسوبان شیخ علی خالص طالبانی در شهر سنندج نامه‌ای برای دولت عثمانی نوشته‌اند و نشان می‌دهد که آنها از ناظم بیگ شابندر، نماینده دولت عثمانی در شهر سنندج می‌خواهند که تابع دولت عثمانی باشند. این نوشته را به وزارت امور خارجه‌ی دولت عثمانی می‌رسانند و بعد به زبان ترکی ترجمه می‌کنند. در بین مشایخ و نامداران شهر سنندج ملا عبدالله مفتی شهر، شیخ محمد قادری و چند درویش و منسوب دیگر هم هستند.

شیخ علی کرکوک‌ی طالبانی فرزند حاج شیخ عبدالرحمن طالبانی از مشایخ و عرفای طریقه قادریه و از علمای بزرگ حدیث و تفسیر بوده است که در کرکوک سال 1330

هجری پس از 70 سال زندگی وفات یافته است. شیخ علی علاوه بر قرآن مجید، حافظ احادیث صحیح بخاری نیز بوده و بیشتر اوقات به تدریس علم حدیث می پرداخته است¹.

ملا عبدالله مفتی فرزند ملا محمود دشی، سال 1273 هجری در قریه دشه از قرای هورامان متولد شده است. هشت ساله بوده که پدرش درگذشته و تا سن پانزده سالگی به علت نداشتن سرپرست، چندان به تحصیل رغبت نشان نداده است، تا اینکه شیخ محمدبهاءالدین عثمانی نقشبندی به پاس اینکه از يك طرف خود شاگرد ملا محمود و از طرف دیگر ملا محمود مرید و مجاز والد ماجدش شیخ سراج الدین بوده است، شخصا تربیت فرزند را بر عهده می گیرد و او را برای ادامه تحصیل به مسافرت وا می دارد. ملا عبدالله ابتدا در شهر سنندج و اطراف آن مدتی درس می خواند، آنگاه به آبادی (نودشه) هورامان می رود و نزد علامه شهیر آن عصر حاج ملا احمد نودشی تلمذ می کند. پس از مدتی با کسب اجازه از شیخ بهاءالدین راه اربیل را پیش می گیرد و نزد استاد حاج عمر افندی اربیلی مدتی درس می خواند و به سال 1299 به اخذ اجازه موفق می شود. پس از آن چند صباحی در قریه (گولپ) عراق به تدریس می پردازد، اما به علت گرفتاری خانوادگی از آنجا به زادگاه خود دشه برمی گردد و با کمال جدیت تدریس و تعلیم طلاب را وجهه همت خود قرار می دهد.

ملا عبدالله در سنه 1313 هجری به سنندج سفر می کند، خواص شهر که از میزان علم و دانش وی آگاه بوده اند وسایل اقامتش را در آن شهر فراهم می کنند. آن مرحوم دعوت مردم را می پذیرد و در مسجد امام زاده پیر عمر در آغاز کار به سمت تدریس منصوب می شود.

در سال 1325 هجری به تهران سفر می کند و با بسیاری از علما و رجال معروف آن عصر پایتخت آشنایی به هم می رساند و در اغلب محافل و مجالس با بیانی شیوا و منطقی مستدل ضمن مباحثه علمی و دینی، مراتب فضل و دانش خود را به همگان ثابت می کند و در همین سفر به دریافت لقب (مفتی) نایل می گردد. پس از مراجعت به سنندج در مدرسه دار الاحسان تدریس خود را از سر می گیرد. وی تا پایان حیات به نشر علوم دینی و ادبی و ترویج دین و سخنرانیهای مذهبی اهتمام ورزیده است. مرحوم ملا عبدالله مفتی در همه علوم متداول فرید عصر خود بوده است. حافظه بسیار قوی و هوش و استعداد سرشاری داشته و در طلافت بیان و قدرت استدلال کسی به

¹ تاریخ مشاهر کرد (عرفا، علما، ادبا، شعرا)، بابامردوخ روحانی، با کوشش محمد ماجد مردوخ روحانی، جلد دوم، انتشارات سروش، تهران 1382، ص 129.

پای او نرسیده است. در نهایت فروتنی و تواضع و نیک نفسی و تقوی و پرهیزکاری و مهماندوستی می زیسته و به مال دنیا چندان توجهی نداشته است، نثر و نظم را خوب می نوشته و آثار و تألیفات زیادی داشت که قسمتی از آنها در رفت و آمد شهر و روستا از بین رفته و آنچه باقی مانده از این قرار است:

1- کتابی به فارسی در فرایض و مواریث

2- کتابی در نحو به نام اکبریّه

3- رساله‌ای به عربی در اثبات نبوت حضرت خاتم با دلایل عقلی

4- رساله‌ای در علم کلام و عقاید

5- عقیده به زبان کردی هورامی

مرحوم ملا عبدالله مفتی شب سه شنبه 25 ربیع الاخر سال 1342 هجری در سندج دار فانی را وداع گفته و با تجلیل شایان بر تپه شیخ محمد صادق به خاک سپرده شده است.²

متن نامه:

این جانبان که زمره مشایخ و در ایش طریقه علیّه قادریّه مبارکه و اهل سنت و جماعت و منسوبین حضرت غوث ثانی حاجی الحرمین شیخ علی افندی کرکوکی طالبانی قدس الله سرّه العالی و ساکنین بلده سندج هستیم. با کمال طواعیت و رغبت طالب و خواهان میباشیم تبعیت دولت علیّه عثمانیه را اختیار نمائیم و از جمله دعاگویان ملت آن دولت معدود و محسوب باشیم و در این ورقه در دست جناب سعادت‌مآب احمد بیگ ناظم افندی شهبندر سنه و مستمسک باشد و فعلا از این بیرق رفیع دولت علیّه و در این فتنه که در بلده سندج حدوث به هم رسانیده و امنیت میطلبیم و حفظ و حراست جان و مال میخواستیم. امیدواریم که سلطان اسلام ابداله خلافته بفریضه خرد حمایت و وقایه تمام اسلامیان خاصه گروه اهل علم و جمله شریعت و طریقت غرار ابهم سنیه ملوکانه بجآورند. فی 12 شهر شوال المکرم سنه.³

مفتی سنه عبدالله

² تاریخ مشاهر کرد (عرفا، علما، ادبا، شعرا)، بابامردوخ روحانی، با کوشش محمد ماجد مردوخ روحانی، جلد دوم، انتشارات سروش، تهران 1382، ص 171.

³ BEO 3975 - 298113

شیخ محمد قادری

شیخ محمد حسن قادری

میرزا عبدالکریم خدمتچی

و باقی درویشان

نتیجه

این سند نشان می دهد که:

- نفوذ فرقه قادریه نه تنها در قلمرو امپراتوری عثمانی، بلکه در شهر سنندج تحت سلطه ایران نیز بوده است.

- معلوم نیست فتنه سنندج چه بوده اما به نظر می رسد درگیری مذهبی بین مراجع شیعه و مردم سنی سنندج بوده است.

- این سند و بسیاری از اسناد دیگر نشان می دهد که علما و فرقه های اسلامی تحت نظارت قلمرو قاجاری هرگاه با موانعی مواجه شده، به دولت عثمانی متوسل شده و خواهان تابعیت می شدند.

- سند نشان می دهد که پیروان نه تنها از شاگردان فرقه قادریه، بلکه ملا عبدالله، مفتی شهر نیز بوده اند.

منابع:

1- تاریخ مشاهر کرد (عرفاء، علما، ادباء، شعرا)، بابامردوخ روحانی، با کوشش محمد ماجد مردوخ روحانی، جلد دوم، انتشارات سروش، تهران 1382.

2- ارشیو دولت عثمانی

BOA. BEO 3975 – 298113

